

XWENDINGEHA NAVÎN
PIRTÛKA POLA 5.

Kurdî

KURMANCÎ

NIVÎSKAR

Gülbeddin GÛLMEZ

Hasan GÛMÛŞ

Ahmet EYER

Ramazan YAMAN

Lokman KARTAL

Abdurrahman ÖZHAN

Abdurrahman KARDAŞ



DEVLET KİTAPLARI

ÜÇÜNCÜ BASKI

....., 2019

Her hakkı saklıdır ve Millî Eğitim Bakanlığına aittir. Kitabın metin, soru ve şekilleri kısmen de olsa hiçbir surette alınıp yayımlanamaz.

Görsel Tasarım Uzmanı
İlyas DEMİRHAN

Her hakkı saklıdır ve Millî Eğitim Bakanlığına aittir.
Kitabın metni, soru ve şekilleri kısmen de olsa hiçbir surette alınıp yayımlanamaz.

ISBN 978-975-11-4477-5

Millî Eğitim Bakanlığı, Talim ve Terbiye Kurulu Başkanlığınının 16.08.2017 gün ve 12373032 sayılı yazısı ile eğitim aracı olarak kabul edilmiş, Destek Hizmetleri Genel Müdürlüğününün 28.05.2019 gün ve 10444088 sayılı yazısı ile üçüncü defa 12.580 adet basılmıştır.



İSTİKLÂL MARŞI

Korkma, sönmez bu şafaklarda yüzen al sancak;
Sönmeden yurdumun üstünde tüten en son ocak.
O benim milletimin yıldızıdır, parlayacak;
O benimdir, o benim milletimindir ancak.

Çatma, kurban olayım, çehreni ey nazlı hilâl!
Kahraman ırkıma bir gül! Ne bu şiddet, bu celâl?
Sana olmaz dökülen kanlarımız sonra helâl.
Hakkıdır Hakk'a tapan milletimin istiklâl.

Ben ezelden beridir hür yaşadım, hür yaşarım.
Hangi çılgın bana zincir vuracakmış? Şaşarım!
Kükremiş sel gibiyim, bendimi çiğner, aşarım.
Yırtarım dağları, enginlere sığmam, taşarım.

Garbın âfâkını sarmışsa çelik zırhlı duvar,
Benim iman dolu göğsüm gibi serhaddim var.
Ulusum, korkma! Nasıl böyle bir imanı boğar,
Medeniyet dediğin tek dişi kalmış canavar?

Arkadaş, yurduma alçakları uğratma sakın;
Siper et gövdeni, dursun bu hayâsızca akın.
Doğacaktır sana va'dettiği günler Hakk'ın;
Kim bilir, belki yarın, belki yarından da yakın.

Bastığın yerleri toprak diyerek geçme, tanı:
Düşün altındaki binlerce kefensiz yatanı.
Sen şehit oğlusun, incitme, yazıktır, atanı:
Verme, dünyaları alsan da bu cennet vatanı.

Kim bu cennet vatanın uğruna olmaz ki feda?
Şüheda fışkıracak toprağı sıksan, şüheda!
Cânı, cânânı, bütün varımı alsan da Huda,
Etmesin tek vatanından beni dünyada cüda.

Ruhumun senden İlahî, şudur ancak emeli:
Değmesin mabedimin göğsüne namahrem eli.
Bu ezanlar -ki şehadetleri dinin temeli-
Ebedî yurdumun üstünde benim inlemeli.

O zaman vecd ile bin secde eder -varsa- taşım,
Her cerihandan İlahî, boşanıp kanlı yaşım,
Fışkırır ruh-ı mücerret gibi yerden na'sım:
O zaman yükselerek arşa değer belki başım.

Dalgalar sen de şafaklar gibi ey şanlı hilâl!
Olsun artık dökülen kanlarımın hepsi helâl.
Ebediyyen sana yok, ırkıma yok izmihlâl;
Hakkıdır hür yaşamış bayrağımın hürriyyet;
Hakkıdır Hakk'a tapan milletimin istiklâl!

Mehmet Âkif Ersoy


GENÇLİĞE HİTABE

Ey Türk gençliği! Birinci vazifen, Türk istiklâlini, Türk Cumhuriyetini, ilelebet muhafaza ve müdafaa etmektir.

Mevcudiyetinin ve istikbalinin yegâne temeli budur. Bu temel, senin en kıymetli hazinendir. İstikbalde dahi, seni bu hazineden mahrum etmek isteyecek dâhilî ve hâricî bedhahların olacaktır. Bir gün, istiklâl ve cumhuriyeti müdafaa mecburiyetine düşersen, vazifeye atılmak için, içinde bulunacağın vaziyetin imkân ve şeraitini düşünmeyeceksin! Bu imkân ve şerait, çok namüsaît bir mahiyette tezahür edebilir. İstiklâl ve cumhuriyetine kastedecek düşmanlar, bütün dünyada emsali görülmemiş bir galibiyetin mümessili olabilirler. Cebren ve hile ile aziz vatanın bütün kaleleri zapt edilmiş, bütün tersanelerine girilmiş, bütün orduları dağıtılmış ve memleketin her köşesi bilfiil işgal edilmiş olabilir. Bütün bu şeraitten daha elîm ve daha vahim olmak üzere, memleketin dâhilinde iktidara sahip olanlar gaflet ve dalâlet ve hattâ hıyanet içinde bulunabilirler. Hattâ bu iktidar sahipleri şahsî menfaatlerini, müstevlîlerin siyasî emelleriyle tevhit edebilirler. Millet, fakr u zaruret içinde harap ve bîtap düşmüş olabilir.

Ey Türk istikbalinin evlâdı! İşte, bu ahval ve şerait içinde dahi vazifen, Türk istiklâl ve cumhuriyetini kurtarmaktır. Muhtaç olduğun kudret, damarlarındaki asil kanda mevcuttur.


Mustafa Kemal Atatürk



MUSTAFA KEMAL ATATÜRK

NAVEROK

UNÎTEYA 1.
EM ZIMANÊ
XWE NAS BIKIN
09-26



UNÎTEYA 2.
EZ Û
MALBATA XWE
27-50



UNÎTEYA 3.
XWENDINGEH
Û JÎNGEHA MIN
51-70



UNÎTEYA 4.
LAŞ Û
TENDURISTÎ
71-88



NAV EROK

UNÎTEYA 5.
XUREK Û
VEXUREKÊN ME
89-108



UNÎTEYA 6.
SALNAME Û
DEMSAL
109-128



UNÎTEYA 7.
GEŞTÛGER Û
HATÛÇÛ
129-144



UNÎTEYA 8.
LÎSTIK Û ÇÎROK
145-160



UNÎTEYA 9.
ÇALAKÎYÊN
SERBEST
161-176



LÎSTEYA ÎKONAN

Amadehiya
Unîteyê



Nêçîra
Peyvan



Çîrok



Hevpeyvîn



Zargotin



Nîrxandîn



Xoçepirs



Helbest



UNÎTEYA 1.

EM ZIMANÊ XWE NAS BIKIN



AMADEHÎYA UNÎTEYÊ

- 1) Dema hûn li van wêneyên jorîn dinêrin çî tê bîra we?
- 2) Hûn dikarin jî serî heta dawî alfabeîyê bixwînin?
- 3) Hûn dikarin heta çendan bijimêrin?

BEŞA 1. ALFABEYA ME

Tîpên Girdek

A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M N
O P Q R S Ş T U û V W X Y Z

Tîpên Hûrdek

a b c ç d e ê f g h i î j k l m n
o p q r s ş t u û v w x y z

Tîpên Dengdêr

a e ê i î o u û

Tîpên Bêdeng

b c ç d f g h j k l m n p
q r s ş t u v w x y z

Pevdeng

XW xw

Çalakiya 1.

Hûn jî li pey mamoste tîpên jorîn
dubare bikin û bixwînin.

Çalakiya 2.

Tîpên alfabeyê li valahiyên jêrîn bi rêzê binivîsin.

A.....Z

a.....z

TÎPÊN GIRDEK / Tîpên Hûrdek

A/a

AGIR / agir

B/b

BEQ / beq

C/c

CÊR / cêr

Ç/ç

ÇAV / çav

D/d

DAR / dar

E/e

ELOK / elok

Ê/ê

ÊZING / êzing

F/f

FIND / find

G/g

GORE / gore

H/h

HESP / hesp

I/i

INCAS / incas

Î/î

ÎSOT / îsot

J/j

JÎJO / jîjo

K/k

KARIK / karik

L/l

LEPIK / leplik

M/m

MIŞK / mişk

N/n

NAN / nan

O/o

OTOBÛS / otobûs

P/p

PÎVAZ / pîvaz

Q/q

QJIK / qjik

R/r

ROJ / roj

S/s

SÊV / sêv

Ş/ş

ŞEKIR / şekir

T/t

TIRÎ / tirî

U/u

GUL / gul

Û/û

ÛTÎ / ûtî

V/v

VAPÛR / vapûr

W/w

WERDEK / werdek

X/x

XANÎ / xanî

Y/y

YEK / yek

Z/z

ZEYTÛN / zeytûn

- A a:** Agir berda **kayê**, xwe da ber **bayê**.
- B b:** Berf û **baran** dibarin.
- C c:** Cêwiyên **ciwan** li **cem** dêya xwe ne.
- C ç:** Çar çûk û çar çêlek çûn dora **çem**.
- D d:** Dêya Deryayê li **dora** darê **digere**.
- E e:** Ev bar **e**, ev jî serbar **e**.
- Ê ê:** Adarê, berfê da guliyên darê, nema danê **êvarê**.
- F f:** Ferat fêkiyan difiroş.
- G g:** Gavan **ga** û golik ajotin nav **garanê**.
- H h:** Hêlin **helbesteke** **hunerî** ji ber kir.
- I i:** Min **kirî**, min **fîrot** û min **kar kir**.
- Î î:** Îro min ji fêkîfiroş **fêkî** kirin.
- J j:** Qijik **ji jêr** firîya **JORÊ**.
- K k:** Ker **kete** ser **kaya** **kadinê**.
- L l:** Bila **bilbil** li **bal** gulê **bixwîne**.
- M m:** Min **mast** li ser **maseyê** **MEYAND**.
- N n:** Navê **neviyê** **Nûrê** **Nûhat** e.
- O o:** Hoste **Osman**, **goşt** **sor** kir.
- P p:** Pelên daran **payîzan** **PIR** diweşin.
- Q q:** Qama **qulingê** ji **qama** **qazê** bilindtir e.
- R r:** Mirovê **derewîn** **carek** dixwe **fîravîn**.
- S s:** Sênîyek **sêvên** **sor** li **ser** maseyê **ye**.
- Ş ş:** Şîr û **şekir** **şîrîn** in.
- T t:** Tajdîn **tû**, **tûreşk** û **tirî** xwarin.
- U u:** **Kurm** **qurm** **qul** kir.
- Û û:** Çûkê piçûk ji ser dara **tûyê** firî **û çû**.
- V v:** Ava **vê** kaniyê **devê** mirov **diqerisîne**.
- W w:** **Wextê** te li **hewayê** **ewr** ditin **were** malê.
- X x:** **Xaniyên** **xalê** min û **xaltiya** min **xweşik** in.
- Y y:** **Kaniya** **bexçeyê** me **geş** **bûye**.
- Z z:** **Zozan** **zarokeke** **kezîzer** e.

Çalakiya 4.

Hûn jî li pey mamoste hevokên jorîn dubare bikin û bixwînin.


Nêçîra Peyvan




berf



ga



derya



qurm



baran



çiya



kezîzer



çûk



quling



ewr



gur

Çalakiya 5.

Hûn jî bi van tîpên jêrîn peyvan çêbikin.

A.....

L.....

F.....

A.....

B.....

E.....

Tîpên Nêzdeng

E-Ê

zer-zêr

der-dêr

per-pêr

I-Î

pir-pîr

jin-jîn

bir-bîr

U-Û

tu-tû

du-dû

kur-kûr

V-W

ev-ew

dev-dew

vir-wir

H-X

hêz-xêz

hal-xal

hew-xew

K-Q

kelandin-qelandin

kalik-qalik

kelem-qelem

Çalakiya 6.

Bi tîpên jêrîn peyvan çêbikin.



nîxa



rda



rgîa



sêpnû

Çalakiya 7.

Di peyvên jêrîn de li cihê vala tipên guncan binivîsin.

E / Ê



k....r



k....r

U / Û



k....r



k....r

I / Î



p....r



p....r

V / W



de.....



de.....

H / X



...êz



...êz

Q / K



...elem



...elem

Helbest



Sirûda Alfabeyê

Em bi helbest û stran
Alfabeyê nas bikin
Tîpan xweşik rêz bikin
Hîn bibin alfabeyê

Agir û av bi Ayê
Ba û baran bi Byê
Can û ceger bi Cyê
Hîn dibim alfabeyê

H wek hevîr û heval
I wek incas û jinxal
Î wek îşev û îsal
Hîn dibim alfabeyê

Bi Çyê ne çav û çem
Bi Dyê ne dev û dem
Bi Eyê ne ew û em
Hîn dibim alfabeyê

Jîjo bi tîpa Jyê
Kîso bi tîpa Kyê
Legleg bi tîpa Lyê
Hîn dibim alfabeyê

Êvar, êzing ji Êyê
Firaq, fanos ji Fyê
Gul û guldank ji Gyê
Hîn dibim alfabeyê

Masî va hat bi Myê
Nêrî va hat bi Nyê
Olan va hat bi Oyê
Hîn dibim alfabeyê



Di penîr de **P** heye
 Di qijik de **Q** heye
 Di rovî de **R** heye
 Hîn dibim alfabeyê

Wisa, wilo û wanî
 Xezal, xeyal û xanî
 Yek, yarî û yaranî
 Hîn dibim alfabeyê

Ji Syê ne **s**ir û **s**ar
 Ji Şyê ne **ş**ir û **ş**ar
 Ji Tyê ne **t**ir û **t**ar
 Hîn dibim alfabeyê

Zengil çêbû bi Zyê
 Zergul çêbû bi Zyê
 Ziman çêbû bi Zyê
 Hîn dibim alfabeyê

Kur û gur bi Uyê ne
 Kûr û dûr bi Ūyê ne
 Vî û vê bi Vyê ne
 Hîn di!

Min jimartin yek bi yek
 Bi tevahî sih û yek
 Heşt dengdêr, ên din bêdeng
 ılfabeyê

(Komîsyon)



Nêçîra Peyvan




tîp



êzing



incas



rovî

Hevpeyvîn



HEVNASÎN

Zeyneb: Merheba.

Hêlîn: Merheba.

Zeyneb: Navê min Zeyneb e. Navê te çi ye?

Hêlîn: Navê min Hêlîn e.

Zeyneb: Tu çawa yî Hêlîn?

Hêlîn: Ez baş im. Spas dikim. Tu çawa yî Zeyneb?

Zeyneb: Ez jî baş im. Gelek spas.

Hêlîn: Tu diçî kîjan xwendingehê?

Zeyneb: Ez diçim Xwendingeha Navîn a Feqîyê Teyran. Tu?

Hêlîn: Ez jî diçim wê xwendingehê.

Zeyneb: Baş e. Naxwe em bi hev re biçin?

Hêlîn: Dibe. De ka em biçin.

Çalakiya 8. Valahiyên hevpeyvîna jêrîn dagirin.

Fatîme: Bihar, te dersa kurdi baş guhdarî kir?

Bihar: Erê Fatîme, min baş guhdarî kir.

Fatîme: Ez çend pirsan ji te bipirsim?

Bihar: Dibe. Ez amade me.

Fatîme: Di alfabeya me de çend tîp hene?

Bihar:

Fatîme: Ji van tîpan çend dengdêr û çend bédeng in?

Bihar: dengdêr in û bédeng in.

Fatîme: Pevdenga kurdi kîjan e?

Bihar:ye.

Fatîme: Tu dikarî pevdenga me di nav çend peyvan de bi kar bîni?

Bihar: Belê.

**Çalakiya 9.**

Hûn jî hevpeyvîneke wekî ya jorîn bi hevaleke/ hevalekî xwe re çêbikin.

BEŞA 2. HEJMAR



0

sifir

1

yek

2

du

3

sê

4

çar

5

pênc

6

şeş

7

heft

8

heşt

9

neh

10

deh

11

yazdeh

12

duwazdeh

13

sêzdeh

14

çardeh

15

pazdeh

16

şazdeh

17

hevdeh

18

hejdeh

19

nozdeh

20

bîst

21

bîst û yek

22

bîst û du

23

bîst û sê

24

bîst û çar

25

bîst û pênc

30

sîh

40

çil

50

pêncî

60

şêst

70

heftê

80

heştê

90

nod

100

sed

Çalakiya 1. Navên hejmarên jêrîn bibêjin û binivîsin.

6: 12: 5: 16:
 8: 18: 9: 11:
 13: 15: 7: 17:
 3: 14: 4: 19:
 0: 1: 20: 10:
 2:

Çalakiya 2. Ji 0ê heta 100î bijimêrin û navên hejmarên jêrîn jî hevalên xwe bipirsin.

21, 27, 34, 33, 47, 44, 52, 58,
 61, 65, 72, 70, 80, 88, 95, 96

Çalakiya 3. Hejmarên jêrîn bi reqeman binivîsin.

nozdeh: heft: pazdeh: heşt:
 duwazdeh: bîst: şeş: hejdeh:
 şazdeh: sê: çardeh: pênc:
 sêzdeh: çar: yazdeh: deh:
 du: neh: hevdeh: yek:

Çalakiya 4. Hejmarên jêrîn di nav hevokan de bi kar binin.

sê / heft / yazdeh / çardeh / bîst

1. Ez **yazdeh** salî me.
2.
3.
4.
5.

BEŞA 3. ZARGOTIN



1. Mamik


Wek şivanê berxika(n)
 Dinêre li zaroka(n)
 Fêr dike hêdika
 Zanîn û tiştika(n).
Ev çi ye?

Li mam heye,
 li xal tune,
 li mal heye,
 li bal tune.
Ev çi ye?

Tûj e weke şûr,
 xweş e weke bilûr.
Ev çi ye?

2. Pêkenoka 1.

LI PEY AYÊ KÎJAN TÎP TÊ?



Mamoste li dibistanê ji Lezgîn dipirse:

- Lezgîn, tu hemû tîpên alfabeyê dizanî?
- Belê mamoste, dizanim.
- Ê de ka bibêje li pey Ayê kîjan tîp tê?
- Li pey tîpa Ayê hemû tîp tên mamoste!

3. Pêkenoka 2.



FERMO TU BIXWÎNE

Zemanê berê qazî nameyek ji gundiyeke re şandibû. Zilam yekî nexwende bû. Di gund de jî tu kes peyda nekir ku karibe vê nameyê bixwîne. Radibe diçe cem melayê gund. Dibêje:

-Seyda, ka bi xêra xwe tu ji min re vê nameyê bixwîne.

Ji ber ku nivîs tevlihev bû nikaribû bixwîne û dibêje:

-Bibore, ez nikarim bixwînim.

Zilam jî dibêje:

-Tu çawa nizanî bixwîni? Ma tu ji şaşika xwe jî şerm nakî?

Mela lê vedigerîne:

-Ma bi şaşikê ye! Naxwe ha ji te re şaşik û fermo tu bixwîne.

Nêçîra Peyvan



name



qazî



şaşik

BEŞA 4. XAÇEPIRS



1




2



3



4



9



5



6



7



10

BEŞA 5. NIRXANDIN



A) Pirsên jêrîn bibersivînin.

1. Di alfabeya me de tîpên dengdêr kîjan in?

.....

2. Di alfabeya me de çend tîpên bêdeng hene?

.....

3. Bi her tîpeke jêrîn peyveke nû binivîsin.

W..... X..... Ê..... Q.....

4. Navê hejmarên jêrîn li hemberê wan binivîsin.

17: 23: 47:

8: 100: 60:

5. Bi tîpên jêrîn peyvan çêbikin.

irgdek: yevp: îtp:

rêddeg: îkrdu: êşr:

B) Li hemberê hevokên jêrîn nişaneyên “R” (rast) an “Ç”yê (çewt) daynin.

1. Alfabeya me ji 33 tîpan pêk tê. ()

2. Di alfabeya me de tîpên Ê, Î, Û, X, Q, W hene. ()

3. Di alfabeya me de tîpên Â, Û, Î, Õ, Ğ tune ne. ()

4. Di alfabeya me de b, c, ç, d, f, g, h.... tîpên dengdêr in. ()

5. E-Ê, I-Î, U-Û, V-W tîpên nêzdegn in. ()

C) Valahîyên jêrîn dagirin.

1. Pevdenga me..... ye.
2. Alfabeya me ji..... tîpan pêk tê.
3. “BIRIN” û “KIRÎN” bi tîpên hûrdek wekî..... û tên nivîsîn.
4. Tîpên a,E,ê,I,î,O,u,Û wekî tîpên tên binavkirin.
5. Di peyva “xwendingeh”ê de sê tîpên dengdêr û tîpên bêdeng hene.

D) Di pirsên jêrîn de vebijêrka rast nîşan bikin.**1. Kîjan tîpa jêrîn dengdêr e?**

- a) k b) x c) w d) û

2. Kîjan tîpa jêrîn bêdeng e?

- a) e b) q c) ê d) î

3. Di kîjan peyvê de pevdengek heye?

- a) xebat b) xanî c) xwê d) xort

4. Navê kîjan hejmarê çewt e?

- a) 18: hejdeh b) 16: şazdeh c) 8: heşt d) 17: heft

5. Kîjan tîpên jêrîn di alfabeya me de tune ne?

- a) ğ,ü,ö b) ê,î,q c) a,e,o d) b,c,d

6. Nivîsandina kîjan hejmarê çewt e?

- a) sifir b) sê c) yazdeh d) hevt

7. Kîjan peyv bi tîpên girdek hatiye nivîsandin?

- a) ziman b) PEYV c) tîp d) alfabe

UNÎTEYA 2. EZ Û MALBATA XWE




AMADEHÎYA UNÎTEYÊ

- 1) Hûn dikarin hinekî xwe bidin nasîn?
- 2) Hûn dikarin malbata xwe bidin nasîn?
- 3) Derheqê hevalên xwe de hûn dikarin çi bibêjin?
- 4) Pişeyên kesên li derdora we çi ne?

BEŞA 1. EZ XWE DIDIM NASÎN

Hevpeyvîn



EM HEV NAS BIKIN

Rihan: Beyanî baş.

Zozan: Beyanî baş.

Rihan: Navê min Rihan e. Navê te çi ye?

Zozan: Navê min Zozan e.

Rihan: Tu çawa yî Zozan?

Zozan: Ez baş im, gelek spas. Tu çawa yî?

Rihan: Ez jî baş im. Spas dikim.

Zozan: Tu çend salî yî?

Rihan: Ez yazdeh salî me. Tu çend salî yî?

Zozan: Ez jî yazdeh salî me?

Rihan: Tu ji ku yî?

Zozan: Ez ji Batmanê me. Tu ji ku yî?

Rihan: Ez ji Erzurumê me.

Zozan: Ez bi nasîna te kêfxweş bûm.

Rihan: Ez jî kêfxweş bûm.

Çalakiya 1. Valahiyên jêrîn li gor hevpeyvînê dagirin.**1. Navê min Zozan e.**

Ez ji me.

Ez salî me.

2. Navê min Rihan e.

Ez ji me.

Ez salî me.

Çalakiya 2. Pirsên jêrîn li gor xwe bibersivinin.**1. Navê te çi ye?**

.....

.....

2. Tu çawa yî?

.....

.....

3. Tu çend salî yî?

.....

.....

4. Tu ji ku yî?

.....

.....





EZ XWE DIDIM NASÎN

Navê min Zerya ye.
Çavên min şîn in.
Ez bejindirêj im.
Ez diçim pola pêncem.



Navê min Fatma ye.
Çavên min kesk in.
Porê min zer e.
Ez keçeke lawaz im.



Navê min Mistefa ye.
Ez yazdeh salî me.
Çavên min hingivî ne.
Porê min reş e.
Bejina min kurt e.



Navê min Ristem e.
Çavên min reş in.
Porê min qehweyî ye.
Ez hinekî qelew im.

Çalakiya 3.

Li hemberê hevokên jêrîn nişaneyê "R" (rast) an "Ç"yê (çewt) daynin.

1. Çavên Ristem reş in. ()
2. Bejîna Mistefa kurt e. ()
3. Porê Fatmayê reş e. ()
4. Zerya bejindirêj e. ()
5. Mistefa deh salî ye. ()
6. Ristem lawaz e. ()
7. Çavên Fatmayê kesk in. ()

Çalakiya 4.

Hûn jî hin taybetiyên xwe jî hevalên pola xwe re bibêjin û li jêr binivîsin.

.....

.....

.....

.....

Çalakiya 5.

Li gor mînakê jêrîn hûn jî agahiyên xwe li ser karta endamtiya pirtûkxaneyê binivîsin.

**KARTA
ENDAMTÎYA
PIRTÛKXANEYÊ**

Nav: Sara
Paşnav: Çiçek
Rojbûn: 02.05.2006
Pol: 5/C
Xwendîngeh: Xwendîngeha
Navîn a Ehmedê Xanî



**KARTA
ENDAMTÎYA
PIRTÛKXANEYÊ**

Nav:
Paşnav:
Rojbûn:
Pol:
Xwendîngeh:



BEŞA 2. MALBATA MIN



MALBAT

Malbat ji dê û bav û zarokan pêk tê. Di hin malbatan de bapîr û dapîr jî bi wan re dimînin. Di malbatê de peywîrên her kesî hene. Eger endamên malbatê peywîrên xwe bi cih binin û alîkarîya hev bikin jiyana wan hêsantir û xweştir dibe.

Dê û bav pêdivîyên zarokên xwe finin cih û jî bo jiyana wan xweştir bikin dixebitin. Dê û bav jî bo perwerdehiya zarokên xwe jî hewl didin. Zarok jî di malê de alîkarîya dê û bavê xwe dikin û li dersên xwe baş dixebitin.

Kesên malbatê rûmetê didin bapîr û dapîrên xwe û qîmeta wan digirin.


Çalakiya 1.

Hevokên jêrîn bi peyvên guncan dagirin.

alîkarîya / rûmetê / zarokan / peywîrên / bapîr û dapîr / pêdivîyên


1. Malbat ji dê û bav û pêk tê.
2. Di hin malbatan de jî bi wan re dimînin.
3. Dê û bav zarokên xwe finin cih.
4. Divê kesên malbatê bidin hev.
5. Divê di malbatê de herkes xwe pêk bîne.
6. Di malbatê de zarok dê û bavê xwe dikin.

ENDAMÊN MALBATÊ



Çalakiya 2.

Valahiyên tabloya jêrîn li gor malbata xwe dagirin.



Çalakiya 3.

Cihên vala bi peyvên jêrîn dagirin.

- | | | |
|--------------------|---------|-------|
| 1. Birayê dêya min | (xal) | ap |
| 2. Bavê dêya min | (.....) | xal |
| 3. Birayê bavê min | (.....) | xaltî |
| 4. Dêya bavê min | (.....) | met |
| 5. Xwişka dêya min | (.....) | bapîr |
| 6. Xwişka bavê min | (.....) | dapîr |

EYŞAN MALBATA XWE DIDE NASÎN

Merheba, navê min Eyşan e. Ez yazdeh salî me. Diçim pola pêncem.
Ez ji malbata xwe pir hez dikim û dixwazim wan bidim nasîn.

4 Ev dēya min e. Navê wê Gulîzer e. Ew sih û pênc salî ye û hemşîre ye. Paste û kuliçeyên wê gelekî xweş in.

1 Ev dapîra min e. Navê wê Nûrê ye. Ew şêst û pênc salî ye û gelekî zana ye.

2 Ev bapîrê min e. Navê wî Salîh e. Ew şêst û neh salî ye û dengbêjêkî jêhatî ye.



5 Ev birayê min e. Navê wî Ronî ye. Ew sê salî ye û delaliyê malê ye.

6 Ev xwişka min e. Navê wê Delal e. Delal heft salî ye û gelekî xwişîrîn e.

3 Ev bavê min e. Navê wî Hesen e. Ew sih û heşt salî ye û mamosteyekî jêhatî ye.

Çalakiya 4.

Valahiye jêrîn li gor taybetiyên kesên malbata
Eyşanê dagirin.

(Birayê/ Dapîra/ Xwişka/ Bapîrê/ Dêya/ Bavê)

- Dapîra Eyşanê zana ye.
 Eyşanê dengbêj e.
 Eyşanê mamosteyekî jêhatî ye.
 Eyşanê paste û kuliçeyan çêdike.
 Eyşanê delaliyê malê ye.
 Eyşanê xwişîrîm e.

Çalakiya 5.

Bî peyvên jêrîn hevokan saz bikin.

1. birayê / Ronî ye / Navê / min **Navê birayê min Ronî ye.**
 2. dapîra / Nûrê ye / Navê / min
 3. jêhatî ye / Ew / dengbêjekî
 4. dêya / Gulîzer e / Navê / min
 5. xwişîrîm e / Delal / gelekî

Çalakiya 6.

Hûn jî hin taybetiyên endamên malbata xwe yê
wekî nav, temen, pişe, rengê çav û porê jî hevalên
pola xwe re bibêjin û li jêr binivîsin.

.....

.....

.....

.....

.....

.....

.....

Helbest



MALBATA MIN

Dengê te wek ava zelal
 Rûyê te wek heyva delal
 Çawa heqê te ez bidim
 Dayika min a çavxezal

Ji bo min her dem piştgir î
 Tu derdên min hildigirî
 Çawa ez pesnê te bidim
 Bavo şîrîn î, şekir î

Xwişk û birayên min şîrîn
 Bi kêfxweşî û bi kenîn
 Hiç şahîya we kêm nebe
 Neçike kaniya zêrîn

(Komîsyon)

Çalakiya 7.

Hest û ramanên ku bi vê helbestê bi we re
 çêbûn bi pola xwe re parve bikin.

BEŞA 3. HEVALÊN MIN

HEVALÊN TAXÊ

Yûsuf: Roj baş Merwan.

Merwan: Roj baş Yûsuf.

Yûsuf: Tu çawa yî?

Merwan: Ez baş im, spas dikim. Tu çawa yî?

Yûsuf: Ez jî baş im, gelek spas dikim.

Merwan: Ev hevalê min e. Navê wî Mîrza ye.

Yûsuf: Merheba Mîrza, tu çawa yî?

Yûsuf: Ez jî baş im. Gelek spas.

Mîrza: Tu diçî kîjan xwendingehê?

Yûsuf: Ez diçim Xwendingeha Navîn a Xelil

Xeyalî. Tu diçî kîjan xwendingehê?

Mîrza: Ez jî diçim Xwendingeha Navîn a Mem û Zîn.

Yûsuf: Ez bi nasîna te kêfxweş bûm.

Mîrza: Ez jî kêfxweş bûm.



Çalakîya 1.

Lî gor hevpeyvîna jorîn gotinan û navên li hemberê wan hevpek bikin.

- | | |
|---|---------------|
| 1. Ez diçim Xwendingeha Navîn a Xelil Xeyalî. | Yûsuf |
| 2. Ez bi nasîna te kêfxweş bûm. | |
| 3. Ez jî diçim Xwendingeha Navîn a Mem û Zîn. | Mîrza |
| 4. Ev hevalê min e. Navê wî Mîrza ye. | |
| 5. Ez jî kêfxweş bûm. | Merwan |

Çalakîya 2.

Pirsên jêrîn li gor xwe bibersivînin.

1. Tu çawa yî?

.....

2. Tu diçî kîjan xwendingehê?

.....

BERFÎN HEVALÊN XWE DIDE NASÎN



Ev hevalê min Hiseyn e.
Ew duwazdeh salî ye û
diçe Xwendîngeha
Navîn a Feqîyê Teyran.
Ew ji werzişê pir hez dike.

Navê min Berfîn e.
Ez diçim Xwendîngeha
Navîn a Melayê Cizîrî.
Ez dixwazim hevalên xwe
bi we bidim nasîn.



Ev hevalê min Selim e.
Ew deh salî ye û diçe
Xwendîngeha Navîn a
Malabadê.
Ew ji xwendina
pirtûkan pir hez dike.



Ev hevala min Gulê ye.
Ew yazdeh salî ye.
Em diçin heman
xwendîgehê.
Ew ji avjeniyê hez dike.



Ev hevala min Şîlan e.
Ew yazdeh salî ye û diçe
Xwendîngeha Navîn a
Selahedîne Eyûbî.
Ew ji geştûgerê hez dike.

Nêçîra Peyvan



avjenî



werziş



geştûger

Çalakiya 3. Li gor agahiyan jorin pirsên jêrin bibersivînin.**1. Kî ji xwendina pirtûkan pir hez dike?**

- a) Gulê b) Şilan
c) Hiseyn d) Selîm

2. Kî diçe Xwendingeha Navîn a Selahedînê Eyûbî?

- a) Gulê b) Şilan
c) Hiseyn d) Selîm

3. Kî duwazdeh salî ye?

- a) Gulê b) Şilan
c) Hiseyn d) Selîm

4. Gulê diçe kîjan xwendingehê?

- a) Xwendingeha Navîn a Malabadê
b) Xwendingeha Navîn a Melayê Cizîrî
c) Xwendingeha Navîn a Feqîyê Teyran
d) Xwendingeha Navîn a Selahedînê Eyûbî

5. Kîjan ne taybetîyeke Şîlanê ye?

- a) Ew diçe Xwendingeha Navîn a Selahedînê Eyûbî.
b) Ew yazdeh salî ye.
c) Ew ji avjeniyê hez dike.
d) Ew ji geştûgerê hez dike.

Çalakiya 4.

Hûn jî hin taybetiyên hin hevalên xwe ji hevalên pola xwe re bibêjin û li jêr binivîsin.

.....

.....

.....

.....

.....

BEŞA 4. PÎŞE

EM PÎŞEYAN HÎN DIBIN


Mirov ji bo debara
xwe bikin dixebitin.

Her yek ji wan
xwedî pişeyên cuda
ne. Ev pişe jiyana me
hêsan dikin. Werin
em van pişeyan hîn
bibin!



Mamoste

Mamoste me, hîsker im
Fêrkerê zarokan im
Belav dikim zanîne
Ronî dikim jîyanê



Cotkar

Rez û zevî, dehl û deşt
Bi destên min bûn bihişt
Beyarên hişk û ziwa
Bûn wekî bûk û zava


Dikandar

Navê min e Hayedar
Hayedarê dikandar
Bi kirîn û firotin
Her û her dikim debar



Karmend

Em xebatkarên karmend in
Karê fermî dimeşînin
Bi dildarî dixebitin
Em di kar de qet nawestin



Bijîşk

Bi tenduristiya mirovan
Mijûl dibim bi şev û rojan
Bi destsivikî û dilsozî
Nexweşan zû dikim derman



Karker

Em karker û xebatkar in
Ji bo debarê kar dikin
Geh tenê geh bi hevalan
Kar dikin bi keda destan



Endezyar

Endezyar bi hûrgulî
Avahîyan saz dike
Bi xebatên hunerî
Derdorê xweşik dike



Mêwefiroş

Werin teze ne mêwe
Fêkiyê min bedew e
Mêweyan bifiroşim we
Yên erzan ez bidim we

Nêçîra Peyvan



deşt



zevî



beyar



dehl



nexweş



endezyar

Çalakiya 1. Peyvên jêrîn di hevokan de bi cih bikin.

Endezyar / Mêwefiroş / Karmend / Mamoste / Bijîşk

1. fêrkerê zarokan e.
2. karê fermî dimeşîne.
3. nexweşan derman dike.
4. avahiyan saz dike.
5. mêweyan difiroşe.

BEŞA 5. ZARGOTIN



1. Gotinên Pêşîyan

Dinya gulek e, bêhn bike û bide hevalên xwe.

Bav dixwaze law jê çêtir be, seyda dixwaze şagirt jê jîtir be.

Zarok kezeba dê û bavên xwe ne.

Pêşî ji hevalê xwe re bixwaze, piştî ji xwe re.

Mal dibistan e, dê û bav mamoste ne.



2. Lêhatinok

Endilko bavê Beko
Nîvî min nîvî keko
Ê keko kete çalê
Ê min ma heya salê
Sala mala me li wê bû
Serî li ser çokê bû
Keçik delaliya dê bû.

Heval hevaloşkê
Nan û penîroşkê
Hevalê min şivan e
Gopalê wî pan e
Ji bo guran derman e.

3. Pêkenok

CAMÊR CAMÊRAN NAS DIKIN

Li gundekî mezin û xweş du heval hebûn. Navên wan Emer û Rênas bûn. Emer duwazdeh salî ye û Rênas bi salekê ji Emer piçûktir e. Rojekê her du heval ji bo bêhna xwe vedin derdikevin derveyê gund. Bi hev re dimeşin heta ku digihêjin ser girekî û li ser kevirekî pan rûdinin. Li wir li kar û xebatên gundîyan temaşe dikin. Piştî dest bi axaftinê dikin.

Emer:

-Rênas, di vî gundî de du camêr hene.

Rênas:

-Gelo ew kî ne?

Emer:

-Yek ji wan tu yî, lê ez ê din nabêjim.

Rênas:

-Weleh ê din jî tu yî.

Her du heval bi ken dibêjin:

-Ê bavo, camêr camêran nas dikin.



Çalakiya 1.

Li gor agahiyên jorîn li hemberê hevokên jêrîn nişaneya "R" (rast) an "Ç"yê (çewt) daynin.

- | | |
|--|-------|
| 1. Ji bo bêhna xwe vedin diçin derveyê gund. | (R) |
| 2. Rênas yazdeh salî ye. | () |
| 3. Gundê wan mezin û xweş e. | () |
| 4. Navê yekî Rênas, navê yê din Bawer e. | () |
| 5. Bi meşê çûn serê gir. | () |
| 6. Emer ji Rênas piçûktir e. | () |
| 7. Bi hesp diçin derveyê gund. | () |
| 8. Emer neh salî ye. | () |

Çalakiya 2.

Hûn jî derbarê hevaltiye de pêkenokekê bibêjin.

Çalakiya 3.

Çiroka jêrîn carekê ji mamosteyê xwe guhdarî bikin piştre hûn bixwînin. Binê pirsên ku di çirokê de derbas dibin xêz bikin.

4. Çirok



ŞENGÊ Û PENGÊ

Hebû tunebû, bizinek û du karikên wê hebûn. Rojekê bizin ji karikên xwe re dibêje:

-Ez dê herim derve biçêrim. Bila şîr têkeve guhanên min û hûn jî karibin têr guhanên min bimijin. Lê heta ku ez werim derî ji kesî re venekin. Dema ku ez vegerim ez dê ji we re vê stranê bibêjim:

“Şenga min Penga min
Dêya we çûye zozanan
Xwarine pelên kizwanan
Şîr ketiye guhanan

Zû kin, lez kin werin danan!” Piştî ku min ev stran ji we re got, wê demê hûn dê derî vekin. Baş e?

-Baş e dayê!

Û bizin diçe. Gurekî jî bi dizî guhdariya wan dikir. Gur tê û li derî dixê. Şengê û Pengê dibêjin:

-Ew kî ye?

Gur dibêje:

-Ez im ez, dêya we me!

-Na! Tu ne dêya me yî. Dengê dêya me ne wiha ye. Jixwe tu strana dêya me jî nizanî!

Roja din gur baş guhdariya wan dixe. Piştî ku bizin diçe çêreyê, gur tê li derî dixê.

Şengê û Pengê:

-Ew kî ye?

Gur dengê xwe zirav dixe û dest bi stranê dixe:

-Şenga min Penga min

Dêya we çûye zozanan

Xwarine pelên kizwanan

Şîr ketiye guhanan

Zû kin, lez kin werin danan!

Şengê û Pengê bawer dikin ku ew dêya wan e. Derî vedikin ku weeyyy, ev çi ye!

-Ev gur e!

Gur wan dibê û diçe. Dibe êvar. Bizin jî çêreyê tê malê ku çi bibîne?

Mala wê gişt tevlihev bûye û Şengê û Pengê jî xuya nakin. Bizin digirî û dibêje:

-Şenga min Penga min, hûn li ku ne?

Lê tu deng jî derekê nayê. Bizin difikire û dibêje:

-Hebe nebe ev karê gur e.

Bizin yekser diçe ser xaniyê gur û teperepê dixe.

Gur dibêje:

-Ew kî ye li ser xaniyê min teperepê dixe!

Firaq û kevçiyên min tije toz dixe

Jina min hevîr dixe!

Bizin dibêje:

-Ez im ez, bizina zêrîn

Kê biriye Şenga min,

Kê biriye Penga min?



Were qal û cenga min

Gur dibêje:

-Min biriye Şenga te

Min biriye Penga te,

Ez tēm qal û cenga te

Gur û bizin li rasta mala gur dest bi şer dikin.

Êrişî hev dikin. Bizin bi ser dikeve. Dawî bizin diçe

Şengê û Pengê ji destê gur rizgar dike. Şengê û Pengê diçin hambêza dêya xwe. Bizin wan maçî dike û bi hev re diçin mala xwe.

Çiroka min çû diwaran

Rehmet li dê û bavê guhdaran.



Nêçîra Peyvan



karik



bizin



kizwan



çêre

Çalakiya 4.

Li wênayên çirokê binêrin. Kijan ê rojê ye, kijan ê şevê ye li binê wan binivîsin.



Çalakiya 5.

Li gor çiroka jorîn bersiva pirsên jêrîn bidin.

1. Şengê û Pengê cara pêşî çima derî li gur venekirin? Bibêjin.
2. Şengê û Pengê cara duyem çima derî li gur vekirin? Bibêjin.
3. Kî Şengê û Pengê direvîne? Bibêjin.

BEŞA 6. XAÇEPIRS




1



2



3



9



10



5



6



7



8

BEŞA 7. NIRXANDIN



A) Li gor bersivên jêrîn pirsan çêbikin.

1.
Ez baş im. Spas dikim.
2.
Ez ji Muşê me.
3.
Navê min Bêrivan e.
4.
Ez yazdeh salî me.
5.
Ez mamoste me.

B) Li hemberê hevokên jêrîn nîşaneyên “R” (rast) an “Ç”yê (çewt) daynin.

1. Cotkar bi tenduristîya mirovan mijûl dibe. ()
2. Endezyar avahîyan saz dike. ()
3. Karmend karên fermî dimeşînin. ()
4. Karker ji bo debara xwe dixebitin. ()
5. Nanpêj mēweyan difiroşe. ()

C) Valahîyên jêrîn li gor xwe dagirin.

1. Navê min
2. Çavên min
3. Ezsalî
4. Porê min
5. Ez di pola de me.

D) Di pirsên jêrîn de vebijêrka rast nîşan bikin?

1. Ji komika ku ji dê, bav û zarokan pêk tê re çi tê gotin?

- a) heval b) cîran c) malbat d) civak

2. Pênasa kîjan peyvê çewt e?

- a) xal: Birayê dêya me ye. b) met: Xwişka bavê me ye.
c) dapîr: Bavê dêya me ye. d) ap: Birayê bavê me ye.

3. Xwişka bavê min dibe çi yê min?

- a) met b) xwişk c) xal d) xaltî

4. Yek heye, ji zarokên dê û bavê te ye. Lê ne xwişk û birayê te ye. Ev kî ye?

- a) Xalê min e. b) Ez im.
c) Apê min e. d) Biraziyê min e.

5. Derbarê hevaltîyê de kîjan vebijêrk nevînî ye?

- a) hezkirin b) parvekirin
c) piştgirî d) xapandin

6. “Avahîyan saz dîke û derdorê xweşik dîke” Li jor behsa kîjan pîşeyî tê kirin?

- a) Bijîşki b) Karkerî c) Endezyarî d) Mêwefiroşî



UNÎTEYA 3. XWENDINGEH Û JÎNGEHA MIN



AMADEHÎYA UNÎTEYÊ

- 1) Hûn dikarin hinekî behsa xwendingeha xwe bikin?
- 2) Hûn di xwendingehê de kîjan dersan dixwînin?
- 3) Hûn dikarin hinekî behsa xaniyê xwe bikin?

BEŞA 1. JÎYANA MALÊ

BEŞ Û AMÛRÊN XANÎ

1 Jûra Rûniştinê

Ev jûra rûniştinê ye.
Em bi malbatî li vir rûdinin.
Di jûra rûniştinê de **paldank**,
sêpê û televîzyon hene.



2 Jûra Razanê

Ev jûra razanê ye.
Dema dibe şev em li vir radizin.
Di jûra razanê de **nivîn**,
balgeh û lihêf hene.



3 Jûra Zarokan

Ev jûra zarokan e. Zarok li vê
derê dimînin. Di jûra zarokan
de **pêlistok**, **refa pirtûkan** û
kompîtur hene.



4 Pêjgeh

Ev pêjgeh e. Em xwarina xwe
li vir çêdikin û dixwin.
Di pêjgehê de **sarinc**, **firaqso** û
firin hene.



5

Destşok

Ev destşok e. Em li vir dest û rûyê xwe dişon. Di destşokê de **neynik, pêjgir, firçeya diranan** û **macûna diranan** hene.



6

Serşok

Ev serşok e. Em tê de serê xwe dişon. Di serşokê de **çilşok, şampuan, lûfik** û **şimik** hene.



7

Daşir

Ev daşir e. Em pêdiviya xwe ya tuwaletê li vir finin çih. Piştî derketina ji daşirê em destên xwe dişon. Di daşirê de **sîfon** û **kaxeza daşirê** hene.



8

Şaneşîn

Ev şaneşîn e. Dema hewa hênik be em li vir rûdinin, li derdora xwe temaşe dikin. Di şaneşînê de **guldank, bixêrî** û **rûniştekan** hene.



Çalakiya 1. Li gor agahiyan jorîn hevok û peyvên hevok bikin.

- | | |
|---|---------------------|
| 1. Zarok li vê jûrê dimînin. | Jûra rûniştinê |
| 2. Em bi malbatî li vir rûdinin. | Şaneşîn |
| 3. Dema hewa hênik be em li vir rûdinin. | Daşir |
| 4. Dema dibe şev em li vir radizin. | Jûra zarokan |
| 5. Em li vir dest û rûyê xwe dişon. | Jûra razanê |
| 6. Em pêdivîya xwe ya tuwaletê li vir bi cih tînin. | Destşok |

Çalakiya 2. Li gor agahiyan jorîn pirsên jêrîn bibersivînin.

- Kîjan amûr li jûra zarokan heye?

a) lûfik	b) firaqşo	c) pêlistok	d) guldank
----------	------------	-------------	------------
- Kîjan amûr li pêjgehê tune ye?

a) neynik	b) sarinc	c) firaqşo	d) firin
-----------	-----------	------------	----------
- Nivîn, lihêf û balgeh li ku derê ne?

a) şaneşîn	b) daşir	c) serşok	d) jûra razanê
------------	----------	-----------	----------------
- Em li ku derê xwarina xwe çêdikin û dixwin?

a) pêjgeh	b) jûra zarokan	c) destşok	d) jûra razanê
-----------	-----------------	------------	----------------
- Em serê xwe li ku derê dişon?

a) şaneşîn	b) serşok	c) cilşok	d) firaqşo
------------	-----------	-----------	------------

Çalakiya 3. Mala xwe û jûra xwe bi pola xwe bidin nasîn.**Çalakiya 4.** Derbarê amûrên maseya xwe ya xebatê de agahiyan bidin hevalên xwe.**Çalakiya 5.** Derbarê mala xwe û derdora wê de çend hevokan binivîsin.

.....

.....

.....

Hevpeyvîn



NAVNIŞANA MALÊ

A) Roja Pêncşemê

Rûken: Meryem, roja şemiyê rojbûna min e. Ez dixwazim tu jî bêyî mala me.

Meryem: Baş e. Ser çavan. Mala we li ku ye?

Rûken: Tu Parka Şin a ku li hemberê Mizgefta Mezin e nas dikî?

Meryem: Erê, baş dizanim.

Rûken: Mala me jî parkê pir ne dûr e.

Meryem: Naxwe, ez dê bi dêya xwe re roja şemiyê saet li 11.00an werim ber parkê. Tu jî were pêşiya me.

B) Roja Şemiyê

Rûken: Ez pir memnûn bûm ku tu îro hati mala me.

Meryem: Ez jî bi ditina te gelekî kêfxweş bûm. Ev derfeteke baş bû ku min xaniyê we dit. Bexçeyê we pir mezin û xweş e.

Rûken: Tu dikarî hinekî behsa xaniyê xwe biki?

Meryem: Belê. Mala me li pişt xwendingeha me, li kêleka dermanxaneyê ye. Xaniyê me duqatî ye, rengê wî zer e. Pênc jûrên wî hene. Bexçeyê me piçûk e. Çend darên fêkiyan û çend darên çaman lê hene. Diwarê bexçeyê me qehweyî ye.



Çalakiya 6.

Hûn jî wekî hevpeyvîna jorîn taybetiyên xaniyê xwe û derdora wî binivîsin.

.....

.....

BEŞA 2. JÎYANA XWENDINGEHÊ

Hevpeyvîn



XWENDINGEHA MIN

Cemîle: Silav Dilêr. Tu diçî ku?

Dilêr: Silav Cemîle. Ez diçim xwendingeha xwe.

Cemîle: Xwendingeha te kîjan e?

Dilêr: Xwendingeha Navîn a Zembîlfiroş e.

Cemîle: Xwendingeha te li ku derê ye?

Dilêr: Li Taxa Tenduristiyê li kêleka Parka Gulfiroş e. Tu diçî kîjan xwendingehê?

Cemîle: Ez jî diçim Xwendingeha Navîn a Mewlana. Tu di kîjan polê de yî?

Dilêr: Ez di pola 5/Ayê de me. Tu di kîjan polê de yî?

Cemîle: Ez jî di pola 5/Byê de me.

Dilêr: Tu dikarî hinekî behsa xwendingeha xwe bikî?

Cemîle: Belê. Xwendingeha min mezin e. Bexçeyê wê gelekî fireh e. Di bexçe de darên mēweyan û cihên listikên cûrbicûr hene. Xwendingeha te çawa ye?

Dilêr: Xwendingeha min pir ne mezin e. Lê bexçeyê wê mîna yê we ye.

Cemîle: Derdora xwendingeha we çawa ye?

Dilêr: Derdora wê tev şinahî ye û pir paqij e. Em çopên xwe her tim diavêjin çopdankê.

Cemîle: Xwendingeha me jî pir xweş e. Ez jî xwendingeha xwe gelekî hez dikim.

Dilêr: Ez jî ji xwendingeha xwe pir hez dikim.



Çalakîya 1. Valahîyên jêrîn li gor hevpeyvînê dagirin.

1. Dilêr diçe Xwendingeha Navîn a
2. Cemîle di polayê de ye.
3. Bexçeyê xwendingeha Cemîleyê gelekî e.
4. Ez ji xwendingeha xwe gelekî
5. Em çopên xwe her tim diavêjin

Çalakîya 2. Li hemberê hevokên jêrîn nişaneyên "R" (rast) an "Ç"yê (çewt) daynin.

1. Dilêr di pola 5/Ayê de ye. ()
2. Cemîle diçe Xwendingeha Navîn a Mewlana. ()
3. Xwendingeha Cemîleyê piçûk e. ()
4. Dêrdora xwendingeha Dilêr tev şînahî ye û pir paqij e. ()
5. Xwendingeha Cemîleyê li Taxa Tenduristiyê li kêleka Parka Gulfiroş e. ()

Çalakîya 3. Hûn jî ji hevalên xwe yên polê re behsa xwendingeha xwe bikin.**Çalakîya 4.** Valahîyên jêrîn li gor xwe dagirin.

1. Tu diçî kîjan xwendingehê?

.....

2. Tu di kîjan polê de yî?

.....

3. Xwendingeha te li ku derê ye?

.....

Helbest



DERSÊN ME

Dersên me çiqas xweş in
Em ji tevan hez dikin
Ka ji we re bibêjim
Li min guhdarî bikin



YES

Hînbûna **ingîlîzî**
Li me nabe giranî
Derseke gelek xweş e
Ev zimanê biyanî

EVET



Heçî dersa **tirkî** ye
Derseke pir spehî ye
Hînbûna vî zimanî
Ji te re dilgeşî ye



Heçî dersa **bîrkarî**
Ji bo hesaban bikî
Ji me re pir pêwîst e
Pir dike alikarî



Agahîyên civakî
Pê cihanê nas dikî
Em tev tê de hîn dibin
Tîştên erd û deryayî



Di dersa **wêneyan** de
Em wêneyan xêz dikin
Tiştên di xeyalan de
Bi rengan dixemilinin



Dersa **dînî** pir xweş e
Mirov her tim pê geş e
Mijarên dîn û exlaq
Kî hîn dibe dilgeş e



Dersa cenabê nebi
Tu tu car jê têr nabî
Jiyana pêxember e
Divê tu baş zanibî



Heye derseke dîn jî
Xweş e heta bibêjî
Ji bo ilm û zanîne
Ev **fen û teknoloji**



Heçî dersa **werzişê**
Bi tevger û listik e
Ji bo tenduristiyê
Feydeyên wê pir hene



Navê ya din **muzîk** e
Derseke pir rindik e
Kilam, stran, dengbêji
Tevan hînî te dike



Dersa zimanê **kurdî**
Çiqas xweş û şîrîn e
Em tiştên xweş hîn dibin
Bi zimanê zikmakî

Çalakiya 5.

Li gor helbesta jorîn ders û agahiyan hevpek bikin.

1. Tiştên erd û deryayî

2. Hesabkirin

3. Tenduristî

4. Mijarên dinî û exlaqî

5. Kilam, stran, dengbêji

a. Dîn

b. Muzîk

c. Bîrkarî

d. Agahiyên civakî

e. Werziş

Çalakiya 6.

Li gor helbesta jorîn li hemberê hevokên jêrîn nişaneya "R" (rast) an "Ç"yê (çewt) daynin.

1. Em di dersa kurdî de hînî hesaban dibin.

()

2. Em di dersa agahiyên civakî de hînî tiştên erd û deryayî dibin.

()

3. Em di dersa fen û teknolojiyê de hînî mijarên zanistî dibin.

()

4. Em di dersa werzişê de hînî tevger û listikan dibin.

()

5. Em di dersa bîrkariyê de stranan dibêjin.

()

KELÛPELÊN XWENDINGEHÊ

1 Pênûs



Em bi pênûsê dinivîsin.

2 Lênûsk



Em li lënûskê dinivîsin.

3 Jêbir



Em şaşiyên xwe bi jêbirê jê dibin.

4 Çente

Tiştên ku di dersan de bi kêrî me tînin, em di çenteyê xwe de dibin xwendingehê.



5 Ferheng



Em wateya peyvan ji ferhengê hîn dibin.

6 Pirtûk



Em ji pirtûkan gelek tiştan dixwînin û hîn dibin.

7 Dep



Mamoste di dersan de nivîsan li ser dep dinivîse.

8 Nexşe



Em bi saya nexşeyê cihên bajar û dewletan hîn dibin.

9 Pênûstraş



Em serê pênûsa xwe bi pênûstraşê tîj dikin.

10 Pênûsdank



Em pênûs û jêbirên xwe dixin hundirê pênûsdankê.


11 Mase

Em nivîs, xwendin û dersên xwe li ser maseyê çêdikin.



12 Rûnişte

Ji bo rûniştinê em rûnişteke bi kar tînin.



13 Rastkêş



Em bi rastkêşê xêzan rast dikişînin.

14 Çopdank

Em çopên xwe diavêjin çopdankê.



KOMÊN XWENDINGEHÊ

1 Koma Nivîskariyê

Xwendekar di koma nivîskariyê de helbest û nivîsan dinivîsin.



4 Koma Kîşîkê

Xwendekar di koma kîşîkê de bi kîşîkê dilîzin û bi hev re dikevin pêşbazîyê.



2 Koma Futbolê

Ji koma futbolê tîm tên sazîrin. Carinan ev tîm bi tîmên xwendîngêhên din re dilîzin.



5 Koma Muzîkê

Xwendekar di koma muzîkê de gelek stranên dibêjin û hîni bikaranîna amûrên muzîkê dibin.



3 Koma Şanoyê

Di koma şanoyê de xwendekar hîni listîkvanîyê dibin.



6 Koma Folklorê

Endamên koma folklorê hîni reqşên herêmî dibin û wan reqşan di şahîyan de pêşkêş dikin.



Çalakîya 7. Navên koman bi wêneyên jêrîn re hevpek bikin.

1. Koma Kişikê

2. Koma Şanoyê

3. Koma Muzîkê

4. Koma Nivîskariyê

5. Koma Folklorê

6. Koma Futbolê

**Çalakîya 8. Valahiyên jêrîn bi peyvên guncan dagirin.****nivîskariyê / futbolê / şanoyê / kişikê / muzîkê / folklorê**

1. Xwendekar di koma de dido dido bi hev re dikevin pêşbaziyê.
2. Di koma de tîm tîn sazîkirin û ev tîm bi tîmên xwendingehên din re dilîzin.
3. Xwendekar di koma de helbest û nivîsan dinivîsin.
4. Endamên koma hîni reqsên herêmi dibin û wan reqsan di şahîyan de pêşkêş dikin.
5. Xwendekar di koma de gelek stranên dibêjin.
6. Li xwendingeha me koma jî heye. Di vê komê de em hîni listikvanîyê dibin.

Çalakîya 9. Rêzikên xwendingeh û polê ji mamosteyê xwe guhdari bikin.

BEŞA 3. JÎYANA GUND Û BAJARAN

Hevpeyvîn



GUND Û BAJAR

Osman: Roja te bi xêr Tajdîn. Tu dikarî hinekî behsa gundê xwe bikî?

Tajdîn: Belê, ser çavan. Lê ez dixwazim tu jî ji min re hinekî behsa bajarê xwe bikî.

Osman: Baş e.

Tajdîn: Gundê me di nav daristanê de ye û pir xweş e.

Osman: Bajarê me jî pir xweş e. Bajarekî kevnar û binavûdeng e.

Tajdîn: Gundê me piçûk e. Li derdora wî rez û zevî hene.

Osman: Lê bajarê me pir mezin e. Gelek avahiyên bilind, park û bazargehên mezin lê hene.

Tajdîn: Gundê me piçûk e. Tê de pêncî mal hene.

Osman: Bajarê me jî gelekî qerebalix e. Bi sed hezaran mirov lê dijîn.

Tajdîn: Nêzî mala me golek heye. Em carinan diçin li wir masîyan digirin.

Osman: Nêzî mala me jî hewzê avjenîyê heye. Em tê de avjenîyê dikin.

Tajdîn: Li gundê me û derdora wî ajelên wekî ker, hesp, çêlek û berxikan hene.


Osman: Li bajarê me jî bexçeyê ajelan heye. Em carinan bi malbatî diçin wir û li ajelan temaşê dikin.

Tajdîn: Li gundê me şevbihêrk çêdibin. Em di van şevbihêrkan de li çirokbêj û dengbêjan guhdarî dikin.

Osman: Li bajarê me jî şano û sînema hene.

Tajdîn: Ez jî bo van agahiyên te pir kêfxweş bûm. Mala te ava.

Osman: Ez jî kêfxweş bûm. Mala te jî ava.



Nêçira Peyvan



daristan



rez



zevî



avahî



gol



avjenî



bexçeyê ajelan



dengbêj



şano



bazargeh

Çalakiya 1.

Li gor hevpeyvîna jorîn li hemberê hevokên jêrîn nişaneyên "R" (rast) an "Ç"yê (çewt) daynin.

1. Gundê Tajdîn gelekî mezin e. ()
2. Bajarê Osman pir xweş e. Bajarekî kevnar û binavûdeng e. ()
3. Gundê Tajdîn di nav daristanê de ye û pir xweş e. ()
4. Nêzî mala Tajdîn hewzê avjenîyê heye. ()
5. Li bajarê Osman şano û sînema hene. ()
6. Li gundê Tajdîn bexçeyê ajelan heye. ()
7. Li bajarê Osman şevbihêrk çêdibin. ()
8. Tajdîn carinan diçe golê û li wir masîyan digire. ()

Çalakiya 2.

Li gor hevpeyvîna jorîn gund û bajarên hevrû bikin. Tiştên ku li wan hene di tabloya jêrîn de bi cih bikin.

daristan, bazargehên mezin, avahîyên bilind, park, şevbihêrk, ajelên wekî ker, hesp..., rez û zevî, sînema

GUND	BAJAR

BEŞA 4. ZARGOTIN



1. Mamik

Her roj li dibistan e, lê tiştekek nizane. Ev çi ye?

Pirpel e, nivîs lê bel e, bi bend û bal e, ji te re heval e. Ev çi ye?

Şevê datên, rojê hiltên. Ev çi ne?

2. Gotinên Pêşîyan

Divê fikir rind bê fikirandin, peyv rind bê gotin, kar rind bê kirin.

Barê nezaniyê, girantir e ji derdê xizaniyê.

Nezan, dengê xwe bilind dike, zana gotina xwe...

3. Lêhatinok

Çûme gundê xalê xwe
Xal rakir gopalê xwe
Çû nava dewarê xwe
Anî goştê gayê xwe
Danî ber mêvanê xwe

4. Pêkenok



LÊNÛSKA VALA

Dilgeş ji xwendingehê tê malê. Bavê wî jê re dibêje:

-Dilgeş, ka were ez li lênûska te binêrim. We heta niha li xwendingehê çi nivîsiye?

Bavê Dilgeş li lênûska wî dinêre ku lênûsk vikûvala ye. Şaş dimîne û jê dipirse:

-Çima lênûska te wisa vala ye, qey hûn li xwendingehê tiştekî nanivîsin?

Dilgeş:

-Belê bavo em gelek tiştan dinivîsin.

-Naxwe çima lênûska te vala ye?

Dilgeş:

-Dema mamosteyê me tiştên ku li dep nivîsandine jê dibe ez jî ji deftera xwe dibim.

BEŞA 5. XAÇEPIRS



4 Cihê ku tê de ibadet tê kirin.




2 Lîstikeke stratejîk a ku li ser dep tê listin.



3 Cûreyeke kulilkê ya ku biharê vedibe.



1 Karê hînbûn û hînkirinê.



5 Çêliya mîyê.



6 Cihê ku nexweş tê de tîr dermankirin.



7 Rêyên fireh ku wesayît tê re derbas dibin.



8 Cihê ku perwerdehî lê tê kirin.

BEŞA 6. NIRXANDIN



A) Pirsên jêrîn bibersivînin.

1. Em di kîjan dersê de tiştên bir û xeyalên xwe bi rengan dixemilînin?

.....

2. Navê çar heb kelûpelên xwendîgehê binivîsin.

.....

3. Di xaniyê we de kîjan beş hene? Binivîsin.

.....

4. Di nav komên xwendîgeha we de herî zêde kêfa we ji kîjan komê re tê?

.....

5. Li gor we cudahiyan di navbera gund û bajarên de çi ne?

.....

.....

.....

.....

B) Li hemberê hevokên jêrîn nişaneyên "R" (rast) an "Ç"yê (çewt) daynin.

1. Em ji pirtûkan gelek tiştan dixwînin û hîn dibin. (R)

2. Zimanê zikmakî di darsa fen û teknolojiyê de tê hinkirin. ()

3. Em di koma nivîskariyê de hîni listikvaniyê dibin. ()

4. Em li pêjgehê xwarina xwe çêdikin û dixwin. ()

5. Serjimara gundan ji ya bajarên pirtir e. ()

C) Valahîyên jêrîn bi peyvên guncan dagirin.

(muzîkê / pola / bajaran / jûra razanê / jêbirê)

1. Ez di pêncan de me.
2. Em di dersade kilam û stranan hîn dibin.
3. Em nivîsên xwe bi jê dibin.
4. Nivîn, libêf û balgeh line.
5. Li gelek avahîyên bilind, park û bazargehên mezin hene.

D) Di pirsên jêrîn de vebijêrka rast nişan bikin?

1. Em bi kîjanê nivîsên xwe dinivîsin?

- a) bi lénûskê b) bi pêntûsê c) bi pirtûkê d) bi nexşeyê

2. “Ez diçim Xwendingeha Navîn a Mewlana.” Pirsê vê bersivê çi ye?

- a) Tu di kîjan polê de yî? b) Tu diçî kîjan xwendingehê?
c) Li derdora xwendingeha we çi heye? d) Xwendingeha te li ku ye?

3. Di kîjan dersê de tiştên erd û deryayî tîn hînkirin?

- a) werziş b) bîrkarî c) agahîyên civakî d) kurdî

4. “Endamên koma..... hîni reqsên herêmi dibin û di şahîyan de wan pêşkêş dikin.” Valahîya hevokê divê bi kîjan peyvê bê dagirtin.

- a) folklorê b) şanoyê c) kişikê d) futbolê

5. Em wateya peyvên jî çi hîn dibin?

- a) jî lénûskê b) jî wêneyan c) jî çente d) jî ferhengê


UNÎTEYA 4. LAŞ Û TENDURISTÎ



AMADEHÎYA UNÎTEYÊ

- 1) Li gor wêneyên jorîn naveroka unîteyê dibe ku çi be?
- 2) Endamên laş çi ne? Bibêjin.
- 3) Têkilîya paqijî û nexweşiyê çi ye? Bibêjin.
- 4) Ji bo hûn nexweş nekevin divê hûn çi bikin? Bibêjin.

BEŞA 1. ENDAMÊN LAŞ



Endamên Ser


çav, guh, enî, birû, poz,
dev, çene, dêm, lêv,
ziman, kezî, mijang, bisk

Endamên**Ling û Milan**

pê, panî, gûzek, çok,
ran, tilî, dest, enîşk, mil

Endamên Gewdeyê

zik, sîng, qirik, patik


**Çalakiya 1.**

Li binê wêneyên jêrîn navên wan binivîsin.

birû / lêv / guh / pê / poz / dest / çav / por / dev / çok / tilî / mijang



1.....



2.....



3.....



4.....



5.....



6.....



7.....



8.....



9.....




10.....



11.....



12.....



Çalakiya 2.

Pirsên jêrîn bibersivînin.

1. Kîjan endamekî ser e?

- a) panî b) ran c) dêm d) tili

2. Kîjan endamekî ling û milan e?

- a) enîşk b) poz c) guh d) enî

3. Kîjan endamekî gewdeyê ye?

- a) sîng b) bisk c) dêm d) ran

4. Kîjan ne endamekî ser e?


- a) çene b) mijang c) gûzek d) dev

5. Kîjan ne endamê ling û milan e?

- a) dest b) kezî c) tili d) pê


6. Kîjan ne endamê gewdeyê ye?

- a) zik b) patik c) qirik d) birû




ENDAMÊN LAŞ DIAXIVIN

Ez guh im. Hûn bi min dangan dibihîzin. Dem ku we serê xwe şûst divê hûn min ziwa bikin û hay ji paqijiyê min hebin.




Ez poz im. Hûn bi min bêhnan dîkin, nefesê didin û distînin. Divê hûn bi desmalên hijyenîk min paqij bikin.



Em diran in. Hûn bi me xwarinê dicûn. Em sih û du heb in. Divê hûn me paqij bigirin û her roj me firçe bikin.



Ez ziman im. Hûn bi min çêja xurek û vexurekan his dîkin. Ji bo ku hûn zererê nedin min divê hûn tiştên pir germ û pir cemidî nexwin û venexwin.



Em çav in. Hûn bi me derdora xwe û dimenên xweş dibînin. Ku hûn demeke dirêj li televîzyon û kompîturê binêrin em zererê dibînin. Divê hûn hay ji me hebin û me ji toz û dûmanê biparêzin.

Çalakiya 3.

Li gor agahiyên jorîn hevok û peyvên hevokê bikin.

1. Hûn bi me xwarinê dicûn. Em sih û du heb in.
2. Hûn bi min çêja xurek û vexurekan digirin.
3. Hûn bi me derdora xwe û dimenên xweş dibînin.
4. Hûn bi min bêhnan dîkin, nefesê didin û distînin.
5. Hûn bi min dangan dibihîzin.

çav
poz
guh
ziman
diran

Helbest



ENDAMÊN LAŞÊ ME

Endamên laş kîjan in?
Em bi hev re hîn bibin
Erkên endaman çi ne?
Kîjan kar bi wan dibin?



Endamên laş va ev in
Divê hûn baş zanibin
Dêma poz, dev û zîn
Ser û sîng û pê û ran



Guhên me pir nazik in
Gelek tiştan seh dîkin
Ji bo dîmen û rengan
Çavên xwe ji bîr nekin

Du mil û du destên me
Peywirên wan zêde ne
Bisk û mijang û çene
Çok, por û zik ji hene

Tilî, pêçî û zend in
Digel wan birh û lêv in
Pani, gûzek ji hene
Ew çiqas bihuner in.

(Komîsyon)

BEŞA 2. PAQIJÎYA LAŞ



Hevpeyvîn

PAQIJÎ

Mamoste: Zarokino, mijara dersa me paqijîya laş e. Girîngiya paqijîya laş çi ye? Hûn dikarin hinekî ji me re behs bikin.

Berfîn: Paqijîya laş ji bo tenduristiyê gelekî girîng e. Eger em hay ji paqijîya xwe hebin em zû bi zû nexweş nakevin.

Mamoste: Belê, rast e. Gelo ji bo paqijîya laş hûn çi dikin?

Dildar: Ez berî xwarinê û piştî xwarinê dest û rûyê xwe dişom.

Gulsûm: Ez birêkûpêk porê xwe şeh dikim.

Mihemed: Ez herî kêrî hefteyê du caran serê xwe dişom.

Mizgîn: Ez sibeh û êvaran diranên xwe firçe dikim.

Mehmûd: Ez nahêlim neynûkên min zêde dirêj û qirêj bibin.

Gullistan: Ez şimik, pêjgir, şeh, neynûkbir, firçeya diranan û pêlava xwe bi kesî re parve nakim.

Mamoste: Tiştên ku we gotin tev jî rast in, her bijîn zarokino!



Nêçîra Peyvan



neynûkbir



pêlav



şeh



pêjgir

Çalakiya 1. Li gor hevpeyvîna jorîn kes û agahîyan hevpek bikin.

1. Ez nahêlim neynûkên min zêde dirêj û qirêj bibin.
2. Ez sibeh û êvaran diranên xwe firçe dikim.
3. Paqijîya laş ji bo tenduristiyê gelekî girîng e.
4. Ez birêkûpêk porê xwe şeh dikim.
5. Ez berî xwarinê û piştî xwarinê dest û rûyê xwe dişom.

Berfîn
Mehmûd
Dildar
Mizgîn
Gulsûm

Çalakiya 2. Bi peyvên tevlîhev ên jêrîn hevokên sererast çêbikin.



1 porê/ şeh dikim/ xwe/ Ez
Ez porê xwe şeh dikim.



2 xwe/ser û çavên/Ez/dişom



3 Ez/diranên/firçe dikim/xwe/



4 neynûkên/jê dikim/xwe/Ez

Çalakiya 3. Li gor we paqijîya laş çima girîng e?

.....

.....

.....

Çalakiya 4. Di jiyana xwe ya rojane de hûn dikarin çi bikin û çi nekin? Ji pola xwe re bibêjin.

BEŞA 3. TENDURISTÎ Û NEXWEŞÎ

TENDURISTÎ



Serhed kurekî livdar bû, di cihê xwe de nedisekîni. Serhed wê sibehê li hewşa xwendîgehê dilîst. Ket erdê û çoka wî birîndar bû. Mamoste dema dît ku Serhed ket, hat cem wî. Mamosteya wî yeke zana bû. Dît ku çoka Serhed birîndar bûye çû ji hundirê xwendîgehê çenteyê alikariya bilez anî. Di nav çenteyê alikariya bilez de pembû, meqes, banda pêçanê, çapûtê pêçanê, ava bioksîjen û çend tiştên din hebûn. Mamoste pêşî rewşa birîna wî fam kir û alikariya wî kir. Paşî telefonî ambulansê kir û piştî malbata Serhed agahdar kir.

Piştî demeke kurt ambulans hat. Di vê navberê de jî dêya Serhed hatibû. Dêya Serhed hinekî dilzîz bû lê nehişt ku Serhed pê bihise. Dêya Serhed derbarê parza

û rewşa tenduristîya Serhed de agahî dan tenduristvanan. Tenduristvanan Serhed li ambulansê siwar kir û wan ew bir nexweşxaneyê.

Li nexweşxaneyê bijîşk û xebatkarên tenduristîyê pêşwazîya Serhed kir. Hemû rûken bûn. Bijîşk yekî jêhatî bû. Piştî ku birîna wî derman kir ji Serhed re wiha got:

-Ji bo ku birîna te zû baş bibe divê tu hay ji paqijiyê hebî û birîna xwe di wextê xwe de pansûman biki.

Serhed:

-Belê, di dersê de em hîni van bûbûn. Mamosteya me derbarê tenduristîyê de hin agahî dabûn me.

Bijîşk:

-Ooo, pir baş e! Wekî din hûn hîni çî bûn?

Serhed:

-Ez dizanim ku ji bo em xwe ji nexweşîyan biparêzin divê em hay ji xwarin û vexwarina xwe ji hebin, paqijîya laşê xwe bikin û werzîşê jî piştguh nekin.

-Maşelah, tu çiqas zîrek î! Gelo te tiştek ji birî nekir?

Serhed:

-Himm, nehate bîra min apê bijîşk.

Bijîşk:

-Ji bo em laşê xwe ji nexweşîyan biparêzin divê em xwe parza bikin.

Serhed:

-Belê, niha hat bîra min. Mamosteya me ji me re gotibû.

Bijîşk:

-Herwiha ji bo tenduristîya xwe divê em çopên xwe neavêjin erdê û derdora xwe paqij bihêlin.

Serhed:

-Spas ji bo van agahîyan.

Bijîşk:

-Spasxweş Serhed can! Xwedê şifaya xêrê bide te.

(Komîsyon)



Çalakiya 1.

Hûn wateya kîjan peyvên jêrîn dizanin?
Nîşan bikin. Peyvên ku hûn wateya wan nizanin jî
texmîn bikin û binivîsin.

1. hewş ()
2. birîndar ()
3. pêşwazikirin ()
4. rûken ()
5. tenduristî ()
6. bijîşk ()

Çalakiya 2.

Li gor agahiyên jorîn pirsên jêrîn bibersivînin.

1. Çoka Serhed kengî birîndar bû?
.....
2. Berî ku mamoste telefonî ambulansê bike çi kir?
.....
3. Mamosteyê piştî ku alikariya Serhed kir kî agahdar kir?
.....
4. Serhed bi ambulansê çû ku?
.....
5. Bijîşk çi anî bira Serhed?
.....

Çalakiya 3.

Li gor agahiyên jorîn di çenteyê alikariya bilez de çi
hene? Nîşan bikin.

- | | | |
|----------------|---------------------|----------------------|
| 1. pembû (+) | 4. meqes () | 7. çapûtê pêçanê () |
| 2. lènûsk () | 5. banda pêçanê () | 8. pirtûk () |
| 3. nexşe () | 6. rastkêş () | 9. ava bioksijen () |

Çalakiya 4.

Taybetiyên kesên jêrîn li gor çîrokê hevrû bikin û
navên wan li ber taybetiya guncan binivîsin.

Serhed / bijîşk / mamoste / dêya Serhed

Taybetî	Kes	Taybetî	Kes
zana		livdar	
jêhati		dilzîz	

ALÛKARÛYA BILEZ




1

Meqes bi kêrî jêkirina
çapûtê pêçanê tê.



2

Pembû bi kêrî paqijkirina birinê tê.



3

Çapûtê birinê bi kêrî
sergirtina birinê tê.




4

Ava bioksijen bi kêrî kuştina
mîkroban tê.



5

Çapûtê pêçanê bi kêrî pêçana
birinê tê.




6

Banda pêçanê bi kêrî girêdana
çapûtê pêçanê tê.

Çalakiya 5.

Navên alavên di çenteyê alîkariya bilez de li binê wêneyên wan binivîsin.



1.....



2.....



3.....



4.....



5.....



6.....

Çalakiya 6.

Valahiyên jêrin dagirin.

Ava bioksîjen/ Pembû/ Çapûtê birînê/ Meqes/ Çapûtê pêçanê/ Banda pêçanê

1. bi kêrî girêdana çapûtê pêçanê tê.

2. bi kêrî pêçana birînê tê.

3. bi kêrî kuştina mikroban tê.

4. bi kêrî sergirtina birînê tê.

5. bi kêrî jêkirina çapûtê pêçanê tê.

6. bi kêrî paqijkirina birînê tê.

BEŞA 4. ZARGOTIN



1. Pêkenok



HER DERÊ MIN DIÊŞE

Mirovek diçe cem bijîşk û jê re dibêje:

-Ezbenî, ez gelekî nexweş im. Her derê laşê min diêşe.

Bijîşk laşê wî miayene dike. Destê xwe dide ku derê, mirovê nexweş dibêje:

-Na, ew der naêşe.

Bijîşk xwe hinekî aciz dike û jê re dibêje:

-Tu nexweşiyên te nînin!

Êdî nexweş xwe aciz dike û tiliya xwe di ser laşê xwe re digerîne û ji bijîşk re dibêje:

-Binêre, ev der diêşe, ev der jî û ev der jî!... Yanî ez destê xwe didim ku derê ew der diêşe. Tu çawa dibêji tu nexweşiyên te nînin?

Bijîşk şaş dimîne, vê carê destê wî miayene dike. Piştî dikene û jê re dibêje:

-Bira, jixwe tu destê xwe bidî ku derê dê ew der biêşe. Ji ber ku tiliya te şikestî ye.

2. Mamik

Odeyek şûştî mûştî, sih û du peya lê rûniştî. Ev çi ye?

Cêwî ne, li kêlek in; ne goşt in, lê nermik in. Ev çi ne, de fam bikin?

Du pencereyên bêderî, bi şev girtî, bi roj vekirî. Ev çi ne?

3. Gotinên Xweş

Bingeha hêz û bextewariyê tenduristî ye.

Tenduristî dayîka dilşadiyê ye.



Ev cihan yek e, hay jê hebe, qirêj meke.

4. Zûgotinok



Şok sabûn,
Du şo sabûn
Sê şo sabûn
Çar şo sabûn
Pênc şo sabûn
Şeş şo sabûn

BEŞA 5. XAÇEPIRS



BEŞA 6. NIRXANDIN



A) Pirsên jêrîn bibersivînin.

1. Navên çar endamên laş binivîsin?

.....

2. Ji bo em nexweş nekevin divê em çi bikin?

.....

3. Di çenteyê alikariya bilez de çi hene? Navên çar heban binivîsin.

.....

4. Ji bo tenduristîya laşê xwe divê em kîjan alav û amûrên xwe parve nekin?

.....

5. Gava em nexweş ketin divê em çi bikin?

.....

B) Li hemberê hevokên jêrîn nîşaneyên “R” (rast) an “Ç”yê (çewt) daynin.

1. Em bi pozê xwe tiştan bêhn dikin. ()
2. Divê em berî xwarinê û piştî xwarinê dest û rûyê xwe bişon. ()
3. Pembû bi kêrî kuştina mikroban tê. ()
4. Meqes bi kêrî jêkirina çapûtê pêçanê û bandê tê. ()
5. Em bi çavên xwe xwarinê dicûn. ()

C) Valahîyên jêrîn bi peyvên guncan dagirin.

pêçana / şeh / neynûkbirê / ziman / nexweşîyan

1. Ez porê xwe birêkûpêk dikim.
2. Ez im. Hûn bi min çêja xurek û vexurekan his dikin.
3. Çapûtê pêçanê bi kêrî birînê tê.
4. Ji bo em xwe ji biparêzin divê em hay ji xwarin û vexwarina xwe hebin.
5. Ez neynûkên xwe bi jê dikim.

D) Di pirsên jêrîn de vebijêrka rast nîşan bikin?

1. Birû, lêv, guh, pê û dest endamên çi ne?

a) laş	b) alikariya bilez
c) paqijî	d) nexweşî
2. Em dîmenên derdora xwe bi çi dibînin?

a) guh	b) ziman
c) çav	d) diran
3. Di çenteyê alikariya bilez de kîjan tune ye?

a) pembû	b) meqes
c) banda pêçanê	d) jêbir
4. Kîjan ne endamekî laş e?

a) poz	b) ava bioksijen
c) dêm	d) gûzek
5. Kîjan rasterast ne derheqê tenduristiyê de ye?

a) telefon	b) paqijî
c) parza	d) alikariya bilez

UNÎTEYA 5. XUREK Û VEXUREKÊN ME




AMADEHÎYA UNÎTEYÊ

- 1) Herî zêde kêfa we ji kîjan xwarinan re tê? Bibêjin.
- 2) Herêma we bi kîjan mêwe û sebzeyan navdar e? Bibêjin.
- 3) Dema hûn cilûbergekî distînin, bi giştî hûn kîjan rengî dibijêrin?

BEŞA 1. DANÊN XWARINÊ

Hevpeyvîn



DANÊN XWARINÊ

Îbrahîm ji bo sparteka xwe ya projeyê çêbike çû xwaringeheke ku lê xwarinên malê çêdibin. Ji ber ku sparteka wî derheqê “danên xwarinê” de bû.

Îbrahîm: Qewet be xalo!

Hoste: Sax bî, kerem bike. Tu dê çi bixwî?

Îbrahîm: Na, ez ne ji bo xwarinê hatime. Ez xwendekar im, di pola pêncan de dixwînim. Navê min Îbrahîm e. Mamosteya me spartekê da me. Eger hûn alikariya min bikin ez dê kêfxweş bibim.

Hoste: Ser çavan, ka bibêje sparteka te çi ye?

Îbrahîm: Derbarê danên xwarinê de ye. Eger destûra we hebe ez dê çend tiştan ji we bipirsim.

Hoste: Kerem bike Îbrahîm!

Îbrahîm: Hûn rojê çend caran xwarinê çêdikin?

Hoste: Em rojê sê caran xwarinê çêdikin: Danê sibehê, nîvro û êvarê.

Îbrahîm: Tu dikarî navê danên xwarinê û demên wan ji min re bibêji?

Hoste: Belê. Danê sibehê taştê, danê nîvro firavîn û danê êvarê jî şîv tê xwarin.

Îbrahîm: Di taştêyê de herî zêde çi tên xwarin?

Hoste: Tiştên wekî penîr, zeytûn, hêk, hingiv, nîvişk, dims û to tên xwarin.

Îbrahîm: Di firavînê de bi piranî çi tên xwarin?

Hoste: Cûreyên wekî goşt, fasûlî, selete, birinc, masî û kutilk tên xwarin.

Îbrahîm: Di şîvê de bi piranî çi tên xwarin?

Hoste: Tiştên wekî tirşik, savar, şorbe, mast, selete, ispenax û kartolên kelandî.

Îbrahîm: Evqas dê bes be. Biborin, min hûn mijûl kirin.

Hoste: Xem nake, canê te sax be.

Îbrahîm: Nawxe ez rabim. Ji bo van agahîyan gelek spas dikim. Bi xatirê we.

Hoste: Oxir be, bi hêvîya serkeftinê.

Çalakîya 1. Valahîyên jêrîn li gor hevpeyvîna jorîn dagirin.

agahîyan / destûra / danên xwarinê / alîkarîya / xwarinê

1. Eger hûn min bikin ez dê kêfxweş bibim.
2. Ji bo van gelek spas dikim.
3. Sparteka Îbrahîm derheqê.....de bû.
4. Em rojê sê caran çêdikin: Danê sibehê, nîvro û êvarê.
5. Eger we hebe ez dê çend tiştan ji we bipirsim.

Çalakîya 2. Li gor agahîyên jorîn li hemberê hevokên jêrîn nişaneyên "R" (rast) an "Ç"yê (çewt) daynin.

1. Îbrahîm ji bo sparteka xwe çêbike çû xwaringehê. ()
2. Hoste rojê pênc caran xwarinê çêdike. ()
3. Di taştêyê de herî zêde goşt, fasûlî, selete, birinc, masî û kutilk tên xwarin. ()
4. Îbrahîm di pola pêncan de dixwîne. ()
5. Danê sibehê taştê, danê nîvro firavîn û danê êvarê jî şîv tê xwarin. ()

BEŞA 2. DANASÎNA XUREK Û VEXUREKÊN ME

KAMPA ŞOPGERÎYÊ

Çend xwendekar di betlaneya havînê de ji bo kampa şopgerîyê çûbûn Sinopê. Di şeveke sayî de li bin stêrkan li dora agirekî gur li hev civiyabûn. Bi hev re diaxivîn û henek li hev dikirin. Sohbeteke pir germ bû.

Ronî ji hevalên xwe re got:

-Xwezî niha zebeşekî gundê me li vir bûna û me bi hev re dabûna ber gezan.

Ji ber ku zebeşên gundê me pir xweş û navdar in.

Seydixan jî wisa got:

-Li ber wî zebeşî penîrê bisîrik yê zozanên me dê çi qas xweş be.

Sadiq li ser vê axaftinê got:

-Na, na. Xwezî çend kilo zerdaliyên bajarê me hebûna. Malatya bi zerdaliyên xwe pir navdar e.

Dilgerm rabû ji pêya û teklifeke wiha li hevalên xwe kir:

-Naxwe hevalino werin her yek ji me bila navê xurek û mêweyên navdar ên bajarê xwe bibêje.

Bilal: Ez ji Erzurumê me û kebaba caxê li bajarê me navdar e.

Emîn: Ez Batmanî me û dîmsa bajarê me pir xweş û navdar e.

Bawer: Ez ji Kahramanmaraşê me. Qeşîra bajarê me pir xweş e û li her derê tê nasîn.

Serdar: Hevalino, bajarê min jî Siirt e û ev der bi parêvê navdar e. Herwiha fîstiqên wê jî pir xweş in û li her derê tên nasîn.

Ciwan: Ez jî ji Mardinê me û gilyazên Mardinê pir xweş û navdar in.

Îdrîs: Ez jî ji Hakkariyê me. Hingivê bajarê me gelekî xweş e û li her deverê tê nasîn.

(Komîsyon)



Çalakiya 1.

Peyvên ku hûn wateya wan dîzanin nîşan bikin.
Ji bo peyvên ku hûn nîzanin jî li ferhengê binêrin û
wateya wan binivîsin.

1. betlane ()
2. şopgerî ()
3. sayî ()
4. sîrik ()
5. stêrk ()
6. gur ()

Çalakiya 2.

Hûn jî wekî mînakên jerîn bi peyvan hevokan çêbikin
û ji pola xwe re bibêjin û binivîsin.

1. betlane-havin: Çend xwendekar di betlaneya havinê de çûn Sinopê.
2. kamp-şopgerî: Kampa şopgeriyê xweş derbas bû.
3. dor-agir:
4. zebeş-gundê me:
5. kebab-cax:
6. dims-bajarê me:
7. bajar-min:
8. heval-xwe:

Çalakiya 3.

Hûn jî tiştên ku li bajarê we navdar in ji pola xwe re
bibêjin û binivîsin.

.....

.....

.....

.....

.....

.....

XWARINÊN ME



Çalakiya 4.

Navên xwarinan bi wêneyên li binê wan re hevyeke bikin.

1. pelên pêçayî
()

2. kutilk
()

3. goştê biraştî
()

4. tirşik
()

5. mehîr
()



a



b



c



d




e

Çalakiya 5.

Hûn jî navên çar xwarinan binivîsin.

1.
2.
3.
4.

VEXUREKÊN ME



Çalakiya 6.

Navên vexurekan bi wêneyên li binê wan re hevyeke bikin.

1. ava sûsê
()

a

2. dew
()

b

3. avmêwe
()

c

4. şîr
()

d

5. xweşav
()


e

Çalakiya 7.

Hûn jî navên çar vexurekan binivîsin.

1.
2.
3.
4.

PÊXWARINÊN ME



Çalakîya 8.

Navên pêxwarinan bi wêneyên jêrîn re hevpek bikin.

1. nîvîşk

()

2. dims

()

3. to

()

4. hingiv

()

5. lorik

()



a



b



c



d



e

Çalakîya 9.

Hûn jî navên çar pêxwarinan binivîsin.

1.
2.
3.
4.

BEŞA 3. MÊWE Û SEBZE

MÊWE



zebeş



gilyaz



fistiq



sêv



tirî



zerdalî



behîv



bihok



xox



petix



gûz



incas



hirmî



tû



hinar



hejîr

Çalakiya 1.

Li binê wêneyên jêrîn navên wan binivîsin.



1.....



2.....



3.....



4.....



5.....



6.....



7.....



8.....



9.....



10.....



11.....



12.....

SEBZE



firingî



bacana reş



dolmîk



îsot



bexdenûs



kartol



xiyar



gêzer



pîvaz



sîr



kelem



tivir

Çalakiya 2.

Li binê wêneyên jêrîn navên wan binivîsin.



1.....



2.....



4.....



5.....



3.....



6.....

LI BAZARÊ



1

Qewet be birayê mêwefiroş,
kîloya firingîyan bi çiçasî ye?

1

Xwedê ji te razî be xwişka min.
Kîloya wan bi du lire û nîvan e.

2

Na bira, na! Pir biha ye.
Duh min bi du lireyan kiribû.

2

Ew duh bû xwişka min. Li halê
her tişt biha bûye. Firingiyên
min ji yên xelkê erzantir in.

3

Rast e, lê bazar helal e. Eger tu
bi du lireyan bidî min ez dê bibim.

3

Bila canê te sax be.
Were ji xwe re bibe.

Çalakiya 3.

Valahiyên jêrîn li gor hevpeyvîna jorîn dagirin.

lîreyan / erzantir / çiçasî / bazar / biha/ bi du lire û nîvan

1. Kîloya firingîyan bi ye?
2. Kîloya wan e.
3. Duh min bi du kiribû.
4. Li halê her tişt bûye.
5. Rast e, lê helal e.
6. Firingiyên min ji yên xelkê in.

ÇÊJ

Hingiv

Hingiv **şîrîn** e.


Xwê

Xwê **şor** e.


Îsot

Îsot **tûj** e.

Berû

Berû **tahl** e.

Tirş

Simaq **tirş** e.

Çalakiya 4.

Çêj û wêneyan hevyekek bikin.

tirş

tûj

şîrîn

tahl



dîms

dendikên
qehweyê

lîmon



pîvaz

BEŞA 4. RENG



Çalakiya 1.

Lî binê rengên jêrîn navên wan binivîsin.



1.....



2.....



3.....



4.....



5.....



6.....

Çalakiya 2.

Rengên mêwe û sebzeyên jêrîn ji pola xwe re bibêjin û binivîsin.



1.....



2.....



3.....



4.....



5.....

Helbest



RENG

Di vê cîhana me de
Her tişt bi rengê xwe ye
Tê hezkirin di dil de
Her tişt bi rengê xwe ve

Sêva sor û gula sor
Xecxecokan girte dor
Gilyaz, tûerd, firingî
Çi xweş in bi vî rengî

Tava zer û gilover
Ronî dike her dever
Limon, bihok, gulberoj
Rengezer in wekî roj

Rengê deryayê ye şîn
Jê ye gerestêrka şîn
Xweşik e şîne çavan
Wekî rengê morikan

Zebeş e, dendik reş e
Zeytûna reş çi xweş e
Dinya reş e bi şevan
Çiqas xweş e bêhnvedan

Pîvaz, îsot û xiyar
Şînayî, gîya û dar
Pelên wan ên wekî bask
Xweşik in bi rengê kesk

Spî ye, paqijî ye
Rengê şeker û xwê ye
Zivistana seqemî
Berfa spî xweş dikî

(Komîsyon)

Nêçîra Peyvan



xecxecok



tûerd



gulberoj



morik



Çalakîya 3.

Hest û ramanên ku bi vê helbestê bi we re çêbûn
ji hevaleke/hevalekî xwe re vebêjin.

Çalakîya 4.

Navên tiştên jêrîn û rengên wan hevpek bikin.

1. limon
2. xiyar
3. firingî
4. berf
5. derya
6. zeytûn

- sor
- reş
- şîn
- zer
- kesk
- spî



BEŞA 5. ZARGOTIN



1. Mamik

Xanîyekî gilover û spî, bêpace û bêderî, tê de rûniştiye bûkeke zerî.
Ev çi ye?

Goga min a sor, tê de hene heft çermên spî bi dor. Ev çi ye?

Mamikê mino, laşê wê reş e, serê wê kesk e, dilê wê spî ye. Ev çi ye?

Ji devehê bilindtir e, xwarina wê ji hingivî xweştir e, şîrê wê ji jehrê
nexweştir e, tovê wê ji kuncî hûrtir e. Ev çi ye?

Mamikê mino, ji caran carekê, ji yekê derket hezarekê. Ev çi ye?

2. Gotinên Pêşîyan

Zebeş bi dengê xwe, hinar bi rengê xwe...

Xwarin bi hevalan re xweş tê xwarin.

Mastê payîzan bidin ezizan.

Nanê êvarê bihêle sibê, şixulê êvarê nehêle sibê.

Çalakîya 1.

Devê pirtûkên xwe bigirin. Gotinên pêşîyan ên jorîn ji mamosteyê xwe guhdarî bikin û li lênûska xwe binivîsin.

3. Pêkenok



TE TIŞTEK JI MIN RE NEHIŞT

Du şivan li ser xweşbûn û tamdariya xwarinê sohbet dikin. Yek ji yê din dipirse:

-Li gor te xwarina herî xweş kijan e?

Hevalê wî wiha bersiva wî dide:

-Bi serê min û bi serê te, di dinyayê de ji pîvazê xweştir tiştekek tune ye.


Piştî vê bersivê herdu hinekî bêdeng dimînin. Paşê xwediyê bersivê ji yê din dipirse:

-Min a xwe got. De ka tu bibêje, tu ji kijan xwarinê hez dikî?

Yê din bi hêrs got:

- Malnexirab, ma te tiştekek ji min re hişt ku ez bibêjim!

BEŞA 6. XAÇEPIRS



BEŞA 7. NIRXANDIN



A) Pirsên jêrîn bibersivînin.

1. Navên danên xwarinê binivîsin.

.....

2. Navên çar mēweyan binivîsin.

.....

3. Navên çar sebzeyan binivîsin.

.....

4. Navên sê xwarinên ku li herêma we navdar in binivîsin.

.....

5. Herî zêde kêfa we ji kîjan rengan re tê? Binivîsin.

.....

B) Li hemberê hevokên jêrîn nîşaneyên “R” (rast) an “Ç”yê (çewt) daynin.

1. Zerdaliyên herî xweş li Malatyayê çêdibin.

()

2. Gilyazên Erzurumê gelekî navdar in.

()

3. Ji xwarina êvarê re firavîn tê gotin.

()

4. Şîr, dew, çay, ava sûsê û avmêwe vexurek in.

()

5. Bacana reş, dolmik, gêzer, kelem û tivir sebze ne.

()

C) Valahîyên jêrîn bi peyvên guncan dagirin.

pêxwarin / şivê / caxê / taştê / Batmanê

1. Ji xwarina sibehê re tê gotin.

2. Dimsa pir xweş û navdar e.

3. Hingiv, dims, lorik û penîrin.

4. Tiştên wekî tirşik, savar, şorbe, mast, selate, ispenax û kartolên kelandî di de tên xwarin.

5. Kebaba li Erzurumê navdar e.

D) Di pirsên jêrîn de vebijêrka rast nişan bikin.

1. Xwarina ku nivro tê xwarin kîjan e?

- a) taştê b) firavîn c) şiv d) paşiv

2. Rengê kîjanê cewt hatiye dayîn?

- a) mast- mor b) pembû-spî c) derya-şîn d) roj-zer

3. Kîjan ne pêxwarinek e?

- a) to b) nîvişk c) birinc d) mast

4. Kîjan ne mêwe ye?

- a) xox b) incas c) gûz d) fringî



5. Ji wêneyên jêrîn kîjan ê vexurekekê ye?

- a) tirî b) hêk c) dew d) zebeş



UNÎTEYA 6. SALNAME Û DEMSAL



AMADEHÎYA UNÎTEYÊ

- 1) Herî zêde kêfa we ji kîjan demsalê re tê, çima?
- 2) Hûn saet di çendan de radizin?
- 3) Cilûbergên me li gor demsala çima diguherin?

BEŞA 1. DEMSAL Û MEH

S A L E K

4 demsal e.
12 meh e.52 hefte ye.
365 roj û 6 saet e.

Demsalek 3 meh e.

BIHAR



ADAR — NÎSAN — GULAN

HAVÎN



HEZÎRAN — TÎRMEH — TEBAX

PAYÎZ

ÎLON — ÇIRIYA PÊŞÎN —
ÇIRIYA PAŞÎN

ZIVÛSTAN

KANÛNA PÊŞÎN — KANÛNA
PAŞÎN — SIBAT

1 Kanûna
2 Paşîn
3 Sibat

4 Adar
5 Nîsan
6 Gulan

7 Hezîran



7 Tîrmeh
8 Tebax
9 Îlon

10 Çiriya Pêşîn
11 Çiriya Paşîn
12 Kanûna Pêşîn

Çalakiya 1.

Devê pirtûkên xwe bigirin. Navên mehan jî mamosteyê xwe guhdarî bikin û li lênûska xwe binivîsin.



SOHBETA DEMSALAN

Bihar: Navê min bihar e. Dema ez têm, gul û giya şin dibin. Dar, kulilkên xwe vedikin. Alûtirşk û behîvterk çêdibin. Mirov cilên stûr ji xwe dikin û hêdî hêdî cilên tenik ji dolaban derdixin lê carinan sîwanan jî bi kar tînin. Hêdî hêdî sobeyan radikin û kalorîferan vedimirînin.

Havîn: Navê min havîn e. Dema ez têm hewa germ dibe. Mêwê û sebze pir zêde dibin. Mêweyên wekî zebeş, petîx, zerdalî, gilyaz û hejîran çêdibin. Mirov tenê cilên tenik li xwe dikin. Dema derdikevin ber tavê hin mirov şewqeyan didin serê xwe. Li hin deveran jî ber germê mirov li ser banan radizin. Êdî sîwanan jî bo tavê bi kar tînin.

Payîz: Navê min payîz e. Dema ez têm giya zer dibe û pelên daran diweşin. Hewa hêdî hêdî hênîk dibe. Tirî, incas û gûz çêdibin. Mirov dest bi cotkirina zevîyan û çandiniyê dikin. Hin mirov jî bo amadehiya zivistanê êzingan û komirê dikirin. Hêdî hêdî cilên stûr ji dolaban derdixin û yên tenik dihilînin.

Zivistan: Navê min zivistan e. Dema ez têm, serma zêde dibe û carinan berf dibare. Dema berf dibare zarok kalê berfê çêdikin. Sêv, pirteqal û limon çêdibin. Mirov sobeyên xwe datînin an jî kalorîferên xwe pêdixin û xwe li ber germ dikin. Tenê cilên stûr wekî sako û qazaxan li xwe dikin û botan dixin pêyên xwe. Bi kumên stûr xwe jî sermayê diparêzin.

Çalakiya 2.

Derheqê demsal û rewşên hewayê de tiştên ku hûn dizanin ji pola xwe re bibêjin. Di axaftina xwe de peyvên wekî "û, lewra, lê" jî bi kar bînin.

Çalakiya 3.

Valahiyan li gor agahiyên jorîn dagirin.

salek / biharê / **havînê** / payîzê / zivistanê

1. Di demsala **havînê** de hewa germ e.
2. 365 roj û 6 saet e.
3. Di demsala de serma zêde dibe û carinan berf dibare.
4. Di demsala de gul û gîya şîn dibin.
5. Îlon, çirîya pêşîn û çirîya paşîn mehên demsala ne.

Çalakiya 4.

Lî hemberê hevokên jêrîn nîşaneya "R" (rast) an "Ç"yê (çewt) daynin.

1. Di her demsalekê de çar meh hene. (Ç)
2. Hezîran, tîrmeh û tebax mehên payîzê ne. ()
3. Salek duwazdeh meh e. ()
4. Di demsala payîzê de gîya zer dibe û pelên daran diweşin. ()
5. Mehek 40 roj e. ()

Çalakiya 5.

Agahiyan û demsalên jêrîn hevyekek bikin.

1. Gîya zer dibe û pelên daran diweşin. **Bihar**
2. Hewa germ dibe. Mewê û sebze pir zêde dibin. **Havîn**
3. Serma zêde dibe û carinan berf dibare. **Payîz**
4. Gul û gîya şîn dibin, dar kulilkan vedikin. **Zivistan**

Çalakiya 6.

Peyvên jêrîn li gor demsalan bi cih bikin.

bot / cilên tenik / cilên stûr / kumên stûr / kalê berfê / sobe û kalorîfer / zebeş û petîx

Havîn

.....

Zivistan

.....

BEŞA 2. DEMSAL Û REWŞÊN HEWAYÊ

Helbest



ÇAR DEMSAL

Bihar hat xemilî cîhan
Belav bû bêhna kulîlkan
Va vejîn dîsa dar û ber
Şîn bûn gîyayên hişk û zer



Havîn e binavûdeng e
Sirûşt rind e cûrereng e
Bixwin zarok, jin û zîlam
Sebze û fêkiyên xweştam

Pelên zer weşîn, payîz e
Demsalek xweş e, ezîz e
Kêm nabe bahoz û teyrok
Ba û baran û bablisok

Berfedims, berfemêr, kaşûn
Hemû zarok pevte şabûn
Demsalek sar e zivistan
Çikspî dibe deşt û zozan


(Komîsyon)

REWŞÊN HEWAYÊ



Çalakiya 1. Li gor wêneyên jêrîn rewşa hewayê binivîsin.

(Hewa sayî ye. / Hewa ewrî ye. / Ba tê. /
Teyrok dibare. / Berf dibare. / Baran dibare.)



1)



2)



3)



4)



5)



6)

Çalakiya 2. Îro rewşa hewayê çawa ye? Ji hevalên xwe re bibêjin.

BEŞA 3. HEFTE

ROJÊN HEFTEYÊ



- 1 Duşem
- 2 Sêşem
- 3 Çarşem
- 4 Pêncşem
- 5 În
- 6 Şemî
- 7 Yekşem

Çalakiya 1. Rojan bi rêzê binivîsin.

1. Duşem
2.
3.
4.
5.
6.
7. Yekşem

HEFTEYEKE ROJÎNÊ



Navê min Rojîn e. Ez dixwazim behsa hefteyeke xwe ji we re bikim. Roja **duşemê** dersên me yên xwendîgehê dest pê dikin. Piştî dersan kursa me ya muzîkê dest pê dike. Me koroyek ava kiriye û em di vê koroyê de stranan dibêjin.



Li nêzi mala me hewzek heye. Ez û hevalên xwe roja **sêşemê** li wir hîni avjeniyê dibin. Roja **çarşemê** jî li dibistanê kursa me ya folklorê heye. Em tê de hîni reqsên herêmi dibin. Me bi hinek hevalan re koma xwendîne ava kiriye. Piştî ku em heman pirtûkê dixwînin em her **pêncşem** tên cem hev û derbarê vê pirtûkê de diaxivin.



Li dibistana me koma kişîkê jî heye. Ez roja **îne** diçim tevli vê komê dibim û bi hevalên xwe re bi kişîkê dilizim. Roja **şemî** û **yekşemê** betlane ye. Em carinan bi malbatî diçin seyran, şano yan jî sinemayê; carinan jî diçin serdana pismam û xizmên xwe yên din. Hîn caran jî ez bi hevalên xwe re listikên cûrbicûr dilizim.



(Komîsyon)

Çalakîya 2. Valahîyan li gor agahîyên jorîn dagirin.

folklorê / stranan / xwendinê / muzîkê / bi malbatî / hewzek

1. Roja duşemê piştî dersan kursa me ya **muzîkê** dest pê dike.
2. Em carinan diçin seyran, şano yan jî sînemayê.
3. Li nêzî mala me heye. Ez û hevalên xwe roja sêşemê li wir hînî avjenîyê dibin.
4. Me koroyek ava kiriye. Em di koroyê dedibêjin.
5. Me bi hinek hevalan re komaava kiriye. Em bi hev re heman pirtûkê dixwînin.
6. Roja çarşemê jî li dibistanê kursa me ya..... heye. Em tê de hînî reqsên herêmi dibin.

Çalakîya 3. Roj û çalakîyên Rojînê hevpek bikin.

1. Rojîn diçe kursa folklorê. () in
2. Ew û hevalên xwe tén cem hev û derbarê pirtûka xwendinê de diaxivin. () çarşem
3. Dersên xwendingehê dest pê dikin. () duşem
4. Rojîn û hevalên xwe hînî avjenîyê dibin. () pêncşem
5. Rojîn diçe tevli koma kişikê dibe û bi hevalên xwe re bi kişikê dilize. () sêşem

DANÊN ROJÊ**Çalakîya 4.**

Derbarê danên rojê de bi hevaleke/hevalekî xwe re bixivin.

BEŞA 4. SAET



Hevpeyvîn

SAETA RAZANÊ

Xetîce: Roj baş mamoste. Biborin ez dereng mam.

Mamoste: Roj baş Xetîce. Tu bi xêr hafî. Gelo tu çima dereng mayî?

Xetîce: Mamoste ji ber ku duh bi şev saet di duwazdehê şevê de yanî dereng raketim, sibehê ez di xew de mam.

Mamoste: Naxwe tu dizanî ji bo ku em ji xwendingehê dereng nemînin divê em çi bikin?

Xetîce: Belê mamoste, ji bo ku em dereng nemînin divê em zû razin.

Mamoste: Sihet xweş Xetîce! Ez hêvî dikim tu careke din dereng namînî.

Xetîce: Înşelah ez êdî dereng ranazim û ez dê biwext bêm dersê.

Mamoste: Zarokino divê hûn herî dereng heta kengî şiyar bimînin?

Ehmed: Mamoste, divê herî dereng em saet di yazdehê şevê de rakevin.

Selma: Mamoste, yazdeh jî dereng e. Divê em berî saet dehê şevê razin.

Kamûran: Eger ez dehê şevê rakevim, roja din sibehê zû şiyar nabim û bê taştê tîm xwendingehê.

Mamoste: Kamûran tiştêkî pir girîng got. Zarokino de ka bibêjin, çima divê hûn bê taştê neyên xwendingehê?


Aram: Mamoste, taştê ji bo tenduristîya me pir girîng e. Eger em bê taştê bîn xwendingehê em nikarin guhê xwe baş bidin dersên xwe.

Mamoste: Naxwe divê herî dereng em kengî razin?

Heyder: Mamoste, divê herî dereng em saet di neh û nivê şevê de razin.

Mamoste: Her bijî Heyder! Te rast got. Tu ji ku derê hîn bûyî?

Heyder: Ez ji mamosteyên xwe û hişyarîyên ekrana televîzyonê hîn bûm.



Çalakiya 1.

Hevokên jêrîn û navan li gor hevpeyvînê hevpek bikin.

1. Belê mamoste, divê herî dereng em saet di yazdehê şevê de rakevin. () Kamûran
2. Ez ji mamosteyên xwe û hişyarîyên ekrana televîzyonê hîn bûm. () Selma
3. Mamoste, taştê ji bo tenduristîya me pir girîng e. () Ehmed
4. Eger ez dehê şevê rakevim, roja din sibehê zû şiyar nabim. () Aram
5. Mamoste, yazdeh jî dereng e. Divê em berî saet dehê şevê razin. () Heyder
6. Kamûran tiştêkî pir girîng got. () Xetice
7. Roj baş mamoste. Biborin ez dereng mam. () mamoste

Çalakiya 2.

Valahîyan li gor agahiyên jorîn dagirin.

xwendingehê / dereng / Biborin / xew / taştê / divê


1. Sibehê ez dide mam.
2. Mamoste,ji bo tenduristîya me pir girîng e.
3. Divê hûn bê taştê neyên
4. Roj baş mamoste. ez dereng mam.
5. Înşelah ez êdî ranazim.
6. Mamoste, em herî dereng saet di neh û nivê şevê de razin.

Çalakiya 3.

Li hemberê hevokên jêrîn nîşaneya "R" (rast) an "Ç"yê (çewt) daynin.

1. Taştê ji bo tenduristîya me pir girîng e. ()
2. Ê ku ji xwendingehê dereng dimine Ehmed e. ()
3. Ji bo ku em dereng nemînin divê em zû razin. ()
4. Divê herî dereng em saet di neh û nivê şevê de razin. ()
5. Heyder agahiyên saeta razanê ji hevalên xwe hîn bûye. ()


SAET ÇEND E?



Saet pênc e.





Saet çar û niv e.




Saet sê û çarkek e.



Saet şeş û pênc deqe ye.

Saet ji heştan re
çarkek maye.
(Saet heşt kêr çarkek e.)Saet ji nehan re
bist deqe maye.
(Saet neh kêr bist deqe ye.)

Saet heşt û niv e.



Saet dehê şevê ye.

Saet neh û bist û
pênc deqe ye.

Çalakiya 4.

Lî gor we çima divê em biwext razin? Binivîsin.

.....

.....

Çalakiya 5. Saetên wêneyên jêrîn li valahiyan binivîsin.



1



2



3

Saet deh û niv e.

12:20

01:55

09:45

4

5

6

11:25

06:52

12:15

7

8

9

Çalakiya 6.

Niha saet çend e? Ji hevaleke/hevalekî xwe bipîrsin.

Calakîva 7. Saetan hevvek bikin.



- | | |
|---------------------|-----------------------|
| 1 Saet sê ye. | 6 Saet neh e. |
| 2 Saet şeş e. | 7 Saet çar e. |
| 3 Saet deh û nîv e. | 8 Saet yazdeh e. |
| 4 Saet çar û nîv e. | 9 Saet yek e. |
| 5 Saet heft e. | 10 Saet pênc û nîv e. |

BEŞA 5. ZARGOTIN



1. Mamik

Tiştêkî min heye. Sar e, bêdeng e, ne xuya ye, nayê girtin, bêreng e.
Ev çi ye?

Hûr hûr barî, hey hey barî, deşt û banî, her çar alî, girt û danî.
Ev çi ye?

Çar bira ne, çar diyar; yek germ e, yek hênîk, yek şîlî ye, yek sar.
Ev çi ne?

Roja navî, şeva navî, heft bira li pey hev direvî. Ev çi ne?

2. Xeberoşkên Mehan

Xwezi bi dehê kanûnê, berê xwe dide sosin û beybûnê.

Sibat tiroviro, adar ma bîst û du ro.

Adar e sibehê sar e, nivro bihar e.

Nisan e, bûka salan e.

Gulan e, şingêna dasan e.

Hezîran e, dema das û taran e.

Temûz e, kakil kete gûz e.

Heyva tebaxê, tirî kete miştaxê.

3. Ji Adetên Me



**BÛKA BARANÊ**

Hin salan baran û şîli kêm dibare. Di van deman de ji bo baran bibare û bereket zêde bibe zarok li hev dicivin û bûka baranê digerin. Zarok ji potikan bûkekê çêdikin û dixemilînin û vê bûkê bi serê darekî dirêj ve dikin. Piştîre vê bûkê di kuçe û kolanan de digerin û diçin mala her kesî. Dema zarok bûka baranê digerin dûrik û stranan jî di ber re dibêjin û kêf û şahiyê dikin. Zarok ji malan jî bo xwe xurekên wekî rûn, savar, birinc didin hev û diçin malekê li hev dicivin. Van tiştên ku berhev kirine li wir bi kebanîya malê didin çêkirin û bi hev re dixwin. Piştîre jî ji bo baran bibare bi hev re diayan dikin. Dema ku bûka baranê digerin hin dûrikan dibêjin. Yek ji wan dûrikan jî ev e:

**DÛRIKA BÛKA
BARANÊ**

Bûka me baran dixwaze
Gofika me gîya dixwaze
Rebî tu baranê bidî
Mal û milkan tu av bidî

BEŞA 6. XAÇEPIRS



BEŞA 7. NIRXANDIN



A) Pirsên jêrîn bibersivînin.

1. Navên demsalan binivîsin.

.....

2. Rojên heftêyê li gor rêzê binivîsin.

.....

3. Demsala herî germ kîjan e? Binivîsin.

.....

4. Navên her sê mehên demsala biharê binivîsin.

.....

5. Rewşên hewayê binivîsin.

.....

B) Li hemberê hevokên jêrîn nîşaneyê “R” (rast) an “Ç”yê (çewt) daynin.

- | | |
|---|-----|
| 1. Salek 52 hefte ye. | () |
| 2. Di biharê de gul û gîya şîn dibin. Dar kulilkan vedikin. | () |
| 3. Rewşa hewayê hîç naguhere. | () |
| 4. Ji bo em zû ji xewê şiyar bibin divê em zû rakevin. | () |
| 5. Heftetek ji heşt rojan pêk tê. | () |

C) Valahîyên jêrîn bi peyvên guncan dagirin.

zivistanê / çar / sê / duşemê / havînê

- Hezîran, tîrmeh û tebax mehên ne.
- Hefte bi roja dest pê dike.
- Mehek hefte ye.
- Di demsala de serma zêde dibe û carinan berf dibare. Dema berf dibare em kalê berfê çêdikin.
- Di her demsalkê de meh hene.

D) Di pirsên jêrîn de vebijêrka rast nişan bikin?**1. Kîjan ng rewşeke hewayê ye?**

- a) teyrok b) sayî c) baran d) demsal

2. Di kîjan vebijêrkê de saet çewt hatiye nivîsandin?

- a) 10.15: Saet deh û çarkek e. b) 08.55: Saet neh kêm pênc deqe ye.
c) 12.45: Saet duwazdeh kêm çarkek e. d) 06.30: Saet şeş û niv e.

3. Di kîjan vebijêrkê de saet çewt hatiye nivîsandin?

- a) 07.12: Saet heft û duwazdeh deqe ye. b) 05.15: Saet pênc kêm çarkek e
c) 09.35: Saet deh kêm bist û pênc deqe ye. d) 08.30: Saet heşt û niv e.

4. Di hefteyê de çend roj hene?

- a) sê b) pênc c) şeş d) heft

5. Kîjan rojê hefteyê ye?

- a) şemal b) payîz c) şemî d) şev

6. Piştî roja pêncşemê kîjan roj tê?

- a) yekşem b) în c) çarşem d) sêşem

7. Kîjan roj wekî dawîya hefteyê tê binavkirin?

- a) duşem b) çarşem c) în d) yekşem

8. Berî roja şemîyê kîjan roj tê?

- a) duşem b) sêşem c) în d) yekşem

9. Di kîjan demsalê de dar kulîlkan vedikin?

- a) havîn b) zivistan c) bihar d) payîz

UNÎTEYA 7.

GEŞTÛGER Û HATÛÇÛ



AMADEHÎYA UNÎTEYÊ


- 1) Hûn dikarin navnîşana xwendîngeha xwe bibêjin?
- 2) Rêzikên hatûçûyê bi kêrî çî tên? Bibêjin.
- 3) Li bajarên we cihên geşlûgerê kîjan in? Bibêjin.

BEŞA 1. CIH Û HÊL

EM CIH Û HÊLAN HÎN BIBIN


Roj ji hêla rojhilat ve hiltê.

Roj ji hêla rojava ve diçe ava.



Dema em destê xwe yê rastê bidin hêla ku roj jê hiltê, destê me yê çepê rojava nişan dide. Berê me dikeve bakur. Piştê me jî dikeve başûr.

LI DERDORA WE ÇI LI KU DERÊ YE?



Çalakiya 1. Valahîyan li gor agahiyên jorîn dagirin.

keçikê / rastê / avahîyê / darê / zer

1. Keçik li bin ye.
2. Pisîk li pişt ye.
3. Kîso li kêleka keçikê, li milê ye.
4. Çûkê şîn li cem çûkê e.
5. Dar li pêşîya ye.

Çalakiya 2.


Li gor wêne hevokên jêrîn bi peyvên li hemberê wan re hevpek bikin.

1. Li pêşîya avahîyê ye.
2. Li pişt keçikê ye.
3. Li rex keçikê, li milê çepê ye.
4. Li ser darê ne.
5. Li kêleka keçikê, li milê rastê ye.

kûçik
kîso
dar
pisîk
çûk

Çalakiya 3.

Li gor wêneyê jêrîn valahlyan bi peyvên guncan dagirin.



li hember / li rex / di bin / li ser / li ber

1. Pirtûk maseyê ye.
2. Kompîtur pirtûkdankê ye.
3. Gog maseyê de ye.
4. Guldank paceyê ye.
5. Kursî maseyê ye.

Çalakiya 4.

Wekî minakên jêrîn hûn ji hevokan çêbikin û li ser tabloyê binivîsin.

şekir	bê	Çaya bê şekir xweştir e.
dar	istan	Dar istan hêlîna ajelan e.
aqil	bi	
gul	dank	
xwarin	ve	
bazar	geh	

Hevpeyvîn



LÎSTIKA HÊLAN

Emîne: Gulnaz, were em bi listika hêlan bilîzin.

Gulnaz: Baş e, em bilîzin lê ev listik çawa tê listin?

Emîne: Ez dê ji nexşeyê bajaran nişanî te bidim. Tu ji dê hêla wan bajaran bibêjî. Piştî çar pirsan vê carê tu dê ji min bipirsî. Ji bo her bersiveke rast du puan tên.

Gulnaz: Kerem bike, tu dest pê bike.

Emîne: Hatay dikeve kîjan hêlê?

Gulnaz: Li başûr e.

Emîne: İzmir dikeve kîjan hêlê?

Gulnaz: Li rojava ye.

Emîne: Sinop dikeve kîjan hêlê?

Gulnaz: Li bakur e.

Emîne: Van dikeve kîjan hêlê?

Gulnaz: Li rojhilat e.

Emîne: Te heşt puan girtin. Vêca tu bipirse.



Çalakiya 5.

Li gor vê hevpeyvînê valahiyên jêrîn dagirin.

kîjan / listika / heşt / dest pê / nexşeyê

1. Kerem bike tu bike.
2. Ez dê ji bajaran nişanî te bidim.
3. Van dikeve hêlê?
4. Te puan girtin.
5. Were em bi hêlan bilîzin.

BEŞA 2. HATÛÇÛ

Hevpeyvîn

PERWERDEHÎYA HATÛÇÛYÊ



Mamosteya me îro jî me re got ku mijara dersa me rêzikên hatûçûyê ye. Ji bo em wan baş hîn bibin mamoste em birin Parka Zarokan a Perwerdehîya Hatûçûyê. Saet di dehan de em gihastin parkê. Mamosteya me agahî dabû rêvebirê parkê. Xebatkarên parkê em pêşwazî kirin û heta em vegehiyan jî bi me re bûn. Xebatkarên serê pêşî em li parkê gerandin. Li parkê rêyên wesayîtan û peyayan, nîşanên hatûçûyê û wesayîtan sîmulator hebûn. Karmendekî em kirin du kom û jî me re got:

-Komek dê tûra xwe bi peyati biavêje, koma din jî dê tûra xwe bi wesayîtan biavêje. Ez di koma peyayan de mam. Piştî ku her du koman tûrên xwe qedandin cihên xwe bi hev guherandin û vê carê ez bûm ajovanê otobûsa sîmulator. Me bi vî awayî tûreke din jî avêt. Piştê mamoste got:

-Zarokino, tev werin, kekê we yê karmend dê tiştinan jî we bipirse.

Karmend: We tûrên xwe qedandin û hûn bi giştî serkeftî bûn. Lê ez dixwazim hin pirsan jî we bikim. Gelo rêzikên girîng jî aliyê her kesî ve tînan zanîn an na. Lambeya sor jî bo çi ye?

Mirad: Ji bo rawestîne ye.

Karmend: Lambeya zer jî bo çi ye?

Leyla: Ji bo amadebûnê ye.

Karmend: Lambeya kesk jî bo çi ye?


Îlyas: Ji bo derbasbûnê ye.

Karmend: Rêwî di otobûsan de çima jî deriyê pêş ve peya nabin?

Berçem: Ji ber ku kesên dixwazin siwar bibin dê tengezar bibin.

Karmend: Li hin cihan lambeyên hatûçûyê nînin. Divê peya li wan cihan di ku derê re derbasî hemberê rê bibin?

Zehra: Divê di peyaboran re derbas bibin.



Karmend: Dema peya derbasî hemberê rê dibin pêşî çima li milê çepê dinêrin?

Siyabend: Dema em tèn ber rêyekê wesayîten ku nêzikê me diçin ji aliyê çepê ve tèn. Loma jî em pêşî li milê çepê dinêrin.

Karmend: Maşelaha, hûn çi ças zîrek in! Pîrsa dawî tê: Kijan wesayît dikarin di lambeya sor de derbas bibin?

Helîme: Dema rewşeke bitalûke hebe ambulans û agirkuj dikarin di lambeya sor de derbas bibin.

Zehra: Biborin, çawa dikarin di lambeya sor de derbas bibin, min fam nekir. Hûn dikarin careke din bibêjin?

Karmend: Tenê ev wesayît dema ku talûkeyeke wekî qeza, şewat hebe dikarin derbas bibin. Mamoste, xwendekarên te gelekî serkeftî ne. Jixwe tişteki ez bipirsim jî nema.

Mamoste: Mala we ava. Em kêfxweş bûn. Bi xatirê we.

Karmend: Oxira we ya xêrê be!

Piştê em bi rê ketin û vegehiyan xwendengeha xwe. Geştê me ya îro pir xweş bû, Me li parkê rêzikên hatûçûyê pêk anîn. Bi vî awayî em baş hîn bûn.

(Komîsyon)

Nêçîra Peyvan



peya



agirkuj



lambeyên hatûçûyê

Çalakiya 1.

Valahyan li gor hevpeyvîna jorin dagirin.

rêzikên / pêşwazî / parkê / tûreke / serkeftî

1. Saet di dehan de em gihastin
2. We tûrên xwe qedandin û hûn bi giştî bûn.
3. Mijara darsa me hatûçûyê ye.
4. Me bi vî awayî din jî avêt.
5. Xebatkarên parkê em kirin.

Çalakiya 2. Pirsên jêrîn li gor hevpeyvînê bibersivînin.

1. Mamoste çima xwendekar birin Parka Zarokan a Perwerdehiya Hatûçûyê?

.....

2. Rêwî di otobûsan de çima di deriyê pêş ve peya nabin?

.....

3. Lambeya sor ji bo çi ye?

.....

4. Lambeya zer ji bo çi ye?

.....

5. Lambeya kesk ji bo çi ye?

.....

6. Kîjan wesayît hin caran dikarin di lambeya sor de derbas bibin?

.....

Çalakiya 3.

"Biborin, çawa dikarin di lambeya sor de derbas bibin, min fam nekir. Hûn dikarin careke din bibêjin?"

Wekî mînaka jorîn dema meseleyek nehat famkirin hûn çawa dipirsin?

Lî ser vê bî hevalekî/ hevaleke xwe re hevpeyvînekê çêbikin.

DERBASBÛNA ALÎYÊ DIN

Dema ez dixwazim derbasi hemberê rê bibim pêşî li milê çepê, piştê li milê rastê û dîsa li milê çepê dinêrim. Eger wesayît tune bin derbas dibim.



Ez di peyaborê re derbasi hemberê rê dibim.

BEŞA 3. CIHÊN GEŞTÛGERÊ

Çalakiya 1.

Li gor sernav û wêneyan, mijara çiroka jêrîn dibe ku çi be? Bibêjin. Piştê devê pirtûkên xwe bigirin û çirokê ji mamosteyê xwe guhdarî bikin.

GEŞTÛGEREKE HAVÎNÊ

Vê havînê meta min û keça wê Sosin ji Îstanbulê hatin, bûn mêvanên me. Êvarî Sosinê qala Îstanbulê ji me re kir. Li gor wê li Îstanbulê gelek deverên geştûgerê yên heja hene. Di nav wan cihên ku jimartin de Mizgefta Sultanahmet, Birca Galatayê, Kendava Haliçê û gelek cihên din hebûn.

Min ji xwest ku ez wan li cihên geştûgerê yên herêma me bigerinim. Min ev fikra xwe ji bavê xwe re got û me bi hev re bernameyêke geştûgerê amade kir. Roja pêşî em li bajarê me gerîyan. Sosinê û meta min sûrên kevin, Bexçeyên Hewselê, Pira Dehderî û Pira Malabadê pir ecibandin. Piştê em li bajarên derdorê gerîyan.

Di geştûgera xwe de me gelek cihên balkêş û kevnar dîtîn. Li Mardinê Xerabeyên Darayê, keleh, dêr, mizgeftên kevnar û muze hebûn.

Li Batmanê bi taybetî keleha Hasankeyfê û pira wê ya kevnar pir xweşik û balkêş bûn. Ji ber ku dê Hasankeyf di bin avê de bimîne cihê Qubeya Zeynel Bey hatibû veguhestin.

Me li Vanê jî gelek cihên balkêş dîtîn. Meta min û Sosinê, Gol û Keleha Vanê û Girava Akdamarê pir ecibandin. Hewaya Vanê pir xweş û hênîk bû. Me berê xwe ji Vanê da Qesra Îshakpaşa û Gora Ehmedê Xanî.

Li ser gora wî bavê min helbesteke Ehmedê Xanî xwend. Em bi vê helbestê pir hestiyar bûn.

Meta min û Sosinê ji bo vê gerê kêfxweşîya xwe anî ziman û spasîyên xwe ji me re pêşkêş kirin.



(Komîsyon)

Çalakiya 2.

Navên wêneyên çiroka "Geştûgereke Havînê" ku we guhdarî kir li binê wan binivîsin.



1) 2) 3)

Nêçîra Peyvan



birc



kendav



qesr

Çalakiya 3.

Tiştên ku ji çiroka jorîn di hişê we de man bi pola xwe re parve bikin.

Çalakiya 4.

Binê peyvên demê yên ku di çiroka "Geştûgereke Havînê" de derbas bûne xêz bikin.

Çalakiya 5.


Valahiyên jêrîn li gor hevpeyvîna jorîn dagirin.

herêma / derdorê / Îstanbulê / Vanê / balkêş û kevnar

- Sosinê êvarî qala kir.
- Di geştûgera xwe de me gelek cihên dîtîn.
- Mîn ji xwest ku ez wan li cihên geştûgerê yên me bigerînim.
- Hewayaya pîr xweş û hênîk bû.
- Piştî em li bajarê gerîyan.

Çalakiya 6. Bersivên pîrsên jêrîn di nexşeya çîrokê de bi cih bikin.

1. **Kî** û kî derketin geştûgerê?
2. Sosinê **kengî** qala Îstanbulê kir?
3. Roja pêşî **li ku** gerîyan?
4. Piştî gera li Vanê **çi** kirin?



Çalakiya 7. Li gor agahiyên jorîn cihên geştûgerê û bajarên wan hevyekek bikin.

1. Mizgefta Sultanahmet, Birca Galatayê, Kendava Haliçê () Batman
2. Xerabeyên Darayê () İstanbul
3. Keleha Hasankeyfê û Qubeya Zeynel Bey () Van
4. Girava Akdamarê () Mardin

Çalakiya 8. Peyvên jêrîn di nava hevokên guncan de bi cih bikin.

lê / an / lewra / û

1. Sosinê û meta min sûrên kevin, Bexçeyên Hewselê, Pira Dehderî Pira Malabadê pir ecibandin.
2. Van bajarekî xweş e cihên geştûgerê li Vanê pir in.
3. Wesayît di lambeya sor de derbas nabin ambulans û agirkuj carinan derbas dibin.
4. Pêşî em herin Mizgefta Sultanahmet Birca Galatayê?

Çalakiya 9.

Nivîsa jêrîn bixwînin û pirsên li jêr li gor wê nivîsê bibersivînin.

Cihê Qubeya Zeynel Bey di 12ê Gulana 2017an de hat guhertin. Lewra dema ku Bendava Ilisuyê hat temamkirin dê di bin avê de mabûna. Ev guhertin bi platformeke xwedî sed û pêncî tekel pêk hat. Cara yekem bû ku ev teknoloji li Tûrkiyeyê hat bikaranîn. Bi wê tîknolojîyê ev qube ji cihê xwe yê berê du kîlometreyan hat dûrxistin û li cihê wê yê nû hat danîn. Wê veguhestinê çar saetan dewam kir. Karê bicihkirina wê qubeyê jî sê rojan dewam kir.

1. Çima cihê Qubeya Zeynel Bey hat guherandin?
2. Veguhestinê çend saetan dewam kir?
3. Ev veguhestin kengî pêk hatiye?
4. Li gor we sernavê wê nûçeyê divê çi be?
Li valahîya jorîn binivîsin.

Çalakiya 10.

Nivîsa jêrîn ji mamosteyê xwe guhdarî bikin û peyvên mîqdarê yên ku derbas dibin li lénûska xwe binivîsin.

QEWÎTÎYA DÊYA MIN

Îro dema ez hatim malê min nişeyek bi derîyê pêjgehê ve daleqandî dît. Xûya bû dêya min hin tişt xwestibûn. Di nişeyê de ev nivîsandî bûn:

“Kurê min, niha saet tê duduyan. Ez diçim xwendîngeha xwişka te. Min pere danîn ser maseya li pêjgehê. Here mêwefiroşê nêzik, ji me re hinek sebze û mêweyan bikire. Du kîlo firingî bikire û hinek jî pîvazên hişk... Îsot jî pir lazim in. Hêj hinek mêwe li malê mane, gelean nekire û barê xwe pir giran neke. Bi bihayê pênc lireyan sêv û hinaran bikire. Dê pere ji ber wan bimînin. Dilê te biçe çi ji xwe re ji mêwefiroş bikire. Mêweyên cûrbicûr li dikana wî hene. Piştê jî nesekine û vegere malê. Jixwe ez dê jî heta hingî bêm.”

Ez derketim û çim mêwefiroş. Ev, dikana Xalê Zibeyr e. Hem nêzikî mala me ye û hem jî mêwe û sebzeyên wê teze û xweş in. Bi ser de jî ji yên dikanên din erzantir in. Em gelek pêdiviyên xwe ji cem Xalê Zibeyr peyda dikin.

BEŞA 4. ZARGOTIN



1. Mamik

Sindoqa çar ling, dibeze mîna piling. Ev çi ye?

Or or dike, bor bor dike, qesta bajarana dike. Ev çi ye?

Çiyayê bêkevir, deryaya bêav, daristana bêdar, bajarê bêmirov...
Ev çi ye?

Diçim naçim dirêj e, dişom naşom qirêj e. Ev çi ye?

2. Gotinên Pêşîyan

Pira Batmanê, Medreseya Gomeydanê, Mizgefta Hîzanê, xirab nabin
heta axirzemanê.

Ne mirovê bêbiryar û ne rêwiyê bêheval.

Rovîyekî gerok, ji şerekî xewar çêtir e.

3. Pêkenok

RÊWÎ

Du heval li benda trêne bûn. Ketibûn meseleyên kûr. Di wê navberê de trêna derbas bû. Li pey trêne bazdan lê negihaştinê. Yekî ji wan got:

-Qe nebe em ji trêna duyemîn nemînin.

Dîsa vegehiyan meseleya xwe. Trêna dîsa derbas bû û dîsa negihaştinê. Yekî dîsa got:

-Em ji vê trêne ji nemînin, lewra ev a dawî ye. Wan dîsa dest bi axaftinê kir. Trêna çû.

Li pey bazdan û bazdan. Vê carê yek ji wan siwar bû. Lê yê din negihaştîyê. Yê ku jê mayî kenîya. Zilamekî ku di wir re derbas dibû jê pirsî:

-Ê ku ji trêne ma tu yî, hevalê te siwar bû, ma tu çima dikenî?



Wî ji bersiv da:

-Ê ne xalo tu nizanî. Ez dê biçûma, ew hatibû ku min bi rê bike.

Çalakiya 1.

Pêkenoka jorin li lîstika xwe binivîsin û dû re nivîsa xwe kontrol bikin.

BEŞA 5. XAÇEPIRS



BEŞA 6. NIRXANDIN



A) Pirsên jêrîn bibersivînin.

1. Navên her çar hêlan binivîsin.

.....

2. Li Îstanbulê cihên geştûgerê kîjan in? Binivîsin.

.....

3. Dema peya derbasî hemberê rê dibin pêşî çima li milê çepê dinêrin? Binivîsin.

.....

4. Li Vanê cihên geştûgerê kîjan in? Binivîsin.

.....

5. Li bajarê we cihên geştûgerê kîjan in? Binivîsin.

.....

B) Li hemberê hevokên jêrîn nîşaneyên “R” (rast) an “Ç”yê (çewt) daynin.

1. Roj di rojhilat re diçe ava. ()
2. Wesayît di lambeya sor de radiwestin. ()
3. Divê rêwî di otobûsan de ji deriyê pêş ve peya bibin. ()
4. Hêlên sereke başûr, bakur, rojhilat û rojava ne. ()
5. Sinop dikeve hêla rojava. ()

C) Valahîyên jêrîn bi peyvên guncan dagirin.

rojava / peyaboran / rojhilat / kesk / agirkuj

1. Di lambeya..... de wesayît derbas dibin.
2. Dema rewşeke bitalûke hebe ambûlans û dikarin di lambeya sor de derbas bibin.
3. Cihên ku lambeyên hatûçûyê lê tune bin divê peya di re derbas bibin.
4. Roj ji hêla..... ve diçe ava.
5. Dema em destê xwe yê rastê bidin hêla..... destê me yê çepê rojava nîşan dide.

D) Di pirsên jêrîn de vebijêrka rast nîşan bikin?

1. Li gor cih û alîyan kîjan çewt e?

a)



Guldank li ser maseyê ye.

b)



Xwendîgeh li rex mizgeftê ye.

c)



Pisîk li bin televîzyonê ye.

d)



Mamoste li ber dep e.

2. Kîjan cihê geştuşê li Îstanbulê ye?

a) Mizgefta Sultanahmet b) Bexçeyên Hewselê c) Pira Dehderî d) Pira Malabadê

3. Kîjan wesayît dikare di lambeya sor de derbas bibe?

a) ambulans b) kamyon c) otobûs d) otomobîl


4. Xerabeyên Darayê li kîjan bajari ne?

a) Erzurum b) Van c) Batman d) Mardin

5. Di kîjan lambeya hatûçuyê de wesayît ji bo derbasbûnê amade dibin?

a) sor b) zer c) şîn d) kesk

UNÎTEYA 8. LÎSTIK Û ÇÎROK



AMADEHÎYA UNÎTEYÊ

- 1) Hûn kîjan lîstikan dizanin? Bibêjin.
- 2) Li taxa we herî zêde kîjan lîstik tên lîstin? Bibêjin.
- 3) Hûn kîjan çîrokan dizanin? Bibêjin.

BEŞA 1. LÎSTIKÊN ME

Hevpeyvîn



EM ÇI BILÎZIN?

Elî: Hevalino, werin em listikekê bilizin.

Dîlan: Em çi bilizin?

Bêrîvan: Em bi teytokê bilizin.

Mistefa: Na, na! Em bi xaran bilizin.

Mîhrîban: Em bi pêncokê bilizin.

Mesûd: Werin em bi tepê bilizin.

Sinan: Bi ya min darqîtik xweştir e.

Dîlan: Hevalino, veşartok çawa ye?

Elî: Lîstikên ku we gotin tev jî xweş in. Lê bi ya min jî veşartok baştir e.

Zarok tev bi hev re: De naxwe em bi veşartokê bilizin.

Dîlan: Em pîra holikê bi bizdim-badimê yan bi lêhatinokê diyar bikin?

Elî: Bila Derya lêhatinokê bibêje.

Derya:

Yekê yekê

Yekaneke

Dabistanê

Ezîzanê

Gula çepo

Çep li mijo

Arê gijo

Heba tirî

Vegîndirî


Bar û dey e

Şam û şe ye

Gul hine ye

Yek li min e

Bîst li te ye



Çalakîya 1.

Hûn ji hevpeyvîneke wekî ya jorîn bi hevalên xwe re pêk bînin. Di axaftinên xwe de peyvên wekî "û, jî, lê, naxwe"yê jî bi kar bînin.

Çalakîya 2.

Valahiyên lêhatinoka jêrîn dagirin.

Yekê yekê

(3)

(1)

Bar û dey e

Dabistanê

Şam û şe ye

Ezîzanê

(4)

(2)

Yek li min e

Çep li mijo

(5)

Arê gijo

Heba tirî

Çalakîya 3.

Kî dixwaze kîjan lîstik bê lîstin? Hevyek bikin.

1. tepê

() Sînan

2. veşartok

() Mistefa

3. xar

(1) Mesûd

4. teytok

() Mihriban

5. pêncok

() Dîlan

6. darqîtik

() Bêrivan

Çalakîya 4.

Hûn ji navên sê lîstikên din binivîsin.

1.

2.

3.

Çalakîya 5.

Helbesta jêrîn ji mamosteyê xwe guhdarî bikin. Bala xwe bidin derbandinê. Piştê hûn bixwînin.

Helbest



LÛSTIK

Hevalino bilezînin	Navê listikê xar e	Yek, dido, sisê, çar, pênc
Em bi hev re bilizin	Cam, hesin an kevir e	Pênc kevirên gelek qenc
Çi xweş in listikên me	Hin piçûk û hin mezin	Em bilizin bi pêncok
Em têra xwe şa bibin	Xweşik e wekî dur e	Bigre li ser her du penc

Veşartok çiqas xweş e	Ya din jî darqîtik e	-Hop, va li te tepa min!
Yê dilize kêfxweş e	Lê bide da bipeke	-Ez bûm mak, bû dora min
Va ye dijimêre mak	Bijimêre bi pêyan	Hûn baz bidin, çû ji we
Kî xuya be bextreş e	Qaman li ser hev bike	Tepê tine kêfa min

(Komîsyon)

Dor gihîşte **teytokê**
 Bi xêzik û kevirokê
 Qet pê li xêzê neke
 Li çûn û veqerokê

Çalakiya 6.

Binê hejmar û gihanekên (peyvên ku gotinan bi hev ve dikin) ku di helbestê de derbas dibin xêz bikin.

Çalakiya 7.

Ji peyvên jêrîn ên ku hûn wateya wan dizanin nişan bikin. Ji bo yên ku hûn wateya wan nizanin jî li ferhengê binêrin.

1. bazdan ()
2. dor ()
3. xêz ()
4. hesin ()
5. kevir ()
6. şabûn ()
7. dur ()

MIHRÎCANA LÎSTIKAN

Em li fêrgehê bûn. Mamosteyê me afîşek anî û nişanî me da. Di afîşê de dinivisand ku dê mihricaneke listikan ji aliyê Midûriyeta Çandê ya navçeya me ve bê lidarxistin. Li gor vê afîşê mamosteyê me ji pola me xwest ku em listikekê amade bikin. Pêwîst bû ev listik di kolanan de li nav zarokan pir berbelav bûna.

Li gor vê afîşê me ji listikeke ku em li kolanan pir dilîzin hilbijart. Lîstika ku me hilbijart darqîtik bû. Jixwe li taxê, em bi hevalên xwe re her roj bi darqîtikê dilîstin.

Roja mihricanê ji şeş dibistanên navçeyê listikvan hatibûn û her dibistanekê listikek pêşkêş kir. Gelek temaşevan hatibûn. Lîstik pir hatin ecibandin. Ji bilî listika me; veşartok, teytok, pêncok, xar û tepê ji hatin pêşkêşkirin. Dema me pir xweş derbas bû. Dê û bavê me ji vê mihricanê pir memnûn man û em pîroz kirin. Mamosteyê me ji em pîroz kirin û ji me re got:

-Zarokino, listik, hem ji aliyê tenduristiya laşê me ve pir girîng in û hem ji bi listina van listikan em kêfxweş dibin. Divê em ne tenê listikên dijîtal bilîzin, listikên xwe yê gelêrî jî bilîzin û van listikan ji bîr nekin.

Piştî vê mihricanê me ji fam kir ku feydeyên van listikan pir in.



Çalakîya 8. Pirsên jêrîn li gor çiroka jorîn bibersivînin.

1. Mihrîcana listikan ji aliyê kê ve tê lidarxistin?

.....

2. Roja mihrîcanê ji çend dibistanên navçeyê listikvan hatibûn?

.....

3. Di mihrîcanê de kîjan listik hatin pêşkêşkirin?

.....

4. Zarok li taxê bi hevalên xwe re her roj bi kîjan listikê dilistin?

.....

5. Piştî vê mihrîcanê zarokan çi fam kir?

.....

Çalakîya 9. Bi peyvên tevlîhev hevokan çêbikin.

1. temaşevan / hatibûn / Gelek

.....

2. derbas bû / pir / xweş / me / Dema

.....

3. kirin / em / Wan / pîroz

.....

4. pir / Lîstik / ecibandin / hatin

.....

5. van / Feydeyên / pir in / listikan

.....

Çalakîya 10. Li hemberê hevokên jêrîn nîşaneyên "R" (rast) an "Ç"yê (çewt) daynin.

1. Mamosteyê me filmek anî û nîşanî me da. ()


2. Dê û bavê me ji vê mihrîcanê pir memnûn man û em pîroz kirin. ()

3. Lîstik qet nehatin ecibandin. ()

4. Mamosteyê me ji pola me xwest ku em listikekê amade bikin. ()

5. Lîstika ku me hilbijart veşartok bû. ()

LÎSTIK ÇAWA TÊN LÎSTIN?



1 Tepê

Ji bo vê listikê hejmara listikvanan ne girîng e. Maka listikê bi lêhatinokekê tê bijartin. Dema mak diyar dibe zarokên din her yek bi aliyekî ve direvin. Mak jî dide pey wan, xwe bigihîne kê destê xwe didiyê û dibêje: “Tepê!” Bi vî awayî mak tê guhertin û listik didome.

2 Darqîtik

Bi du komên ku hejmara wan wekî hev in tê listin. Ji bo vê listikê darekî bi qasî bostekê û yekî bi qasî milekî hewce ne. Ji yê kin re qîtik, ji yê dirêj re jî dar tê gotin. Li erdê kortikeke piçûk tê kolan û mirov qîtik datîne ser kortikê. Mirov bi dar, qîtik hildide û lê dide, dipekîne. Ji bo listikvan bi ser bikevin divê qîtik dûr bikeve.



3 Xar



Hejmara listikvanan jî bo vê listikê ne girîng e. Bi xarên piçûk ên ku jî kevir, hesin an caman çêbûne tê listin. Gelek cûreyên vê listikê hene. Ji bo ku listikvan xaran qezenc bike divê xara xwe li xareke din bixe.



4

Teytok

Bi du kesan tê listin. Ji bo listikê kevirekî pan hewce ye. Li erdê malikên çargoşe tên xêzkirin. Mirov radibe ser pêyekî û kevir di wan malikan de bi pêyê xwe diajo. Divê di listikê de mirov pê li xêzikan neke û kevir jî li ser xêzikan nesekine.

5

Pêncok

Bi du kesan tê listin. Ji bo vê listikê pênc kevirên şayik hewce ne. Kevir li hewayê tên girtin. Heke kevir bikevin erdê dor digihêje listikvana/listikvanê din.



6

Veşartok

Ji bo vê listikê hejmara listikvanan ne girîng e. Mak bi “bizdim-badimê” tê diyarkirin. Mak berê xwe dide diwar an darekê û heta bîstan dijimêre. Listikvanên din xwe vedişêrin. Mak êdî li wan digere. Berî ku ew vegerin û destê xwe bidin cihê jîmartinê, mak destê xwe didiyê.



BEŞA 2. ÇİROKÊN ME

ÇİROKA APÊ MIN



Duh apê min Cemîl hat li mala me bû mêvan. Çend saet bûn ku ez û birayê xwe û xwişka xwe me li televîzyonê temaşê dikir û paşî jî li ser kompîturê em bi listikan dilîstin. Apê min gazî me kir û wiha got:

-Zarokino, ev çend saet in ku hûn li televîzyonê temaşê dikin û bi listikên kompîturê dilîzin. Eger hûn bixwazin, werin ez ji we re çîrokekê bibêjim.

Em li dora apê xwe civiyan û apê min dest bi çîrokê kir:

“Hebû tunebû. Dibêjin li gundekî rovîyek û kîsoyek hebûn. Piştî hevaltî û cîrantîyeke dûvedirêj rovî û kîso bûn destûbirakên hev. Rojek ji rojên payîzê rovî ji kîso re got:

-Em bi hev re genim biçînin. Em dê debara xwe pê bikin.

Kîso got:

-Bila be, naxwe divê em dest bi karê xwe bikin. Wextê çandiniyê ye.

Roja din dest bi tovavêtinê kirin. Rovî rabû çû, kete ber latekê û got:

-Birayê min, wele ez nikarim alî te tov bireşînim. Ji ber ku vê latê gava din ji min re got: “Ez dikim bikevim. Divê tu nelebitî û min bigirî da ku ez bi ser te de nekevim.”

Kîso jî got:

-Na, na birakê min. Bila lat bi ser te de nekeve, ez dê ji dêvla te ve jî bixebitim.

Wextê cot hat û kîso bi tena serê xwe şuxilî, cotê xwe kir. Heta ku wextê aşêfê hat, eynî wilo... Bû wextê çînîna genim, eynî wilo... Bû wextê gêreyê. Kîso ew jî bi tenê çêkir. Vê rewşê wiha dewam kir heta ku genimê wan bû lod, rovî her car wiha digot:

-Birayê kîso, ez nikarim ji ber vê



latê rabim. Tu jî dizanî ku ez rabim dê ev lat bi ser min de bikeve. Heke na min dê ali te kiribûna.

Her cara ku rovî wiha digot kîso jî lê vedigerand:

-Na, birakê min na. Hema bila bi ser te de nekeve, ez dê îş bikim.

Kar qedîya, bû wextê parvekirinê. Kîso got:

-Em çawa bikin? Gelo em pişkê bavêjin, vî genimî em çawa parve bikin? Jixwe bi nivî ye.

Rovî jî got:

-Hema kî berî kê serê şeveqê bigihêjiyê bila genim ji wî re be.

Xatir ji hev xwestin û her yek çû mala xwe. Rovî ji xwe re digot: "Jixwe ez jêhatî me. Sibeyî ez dê bêjim xirrrr, di demeke kin de xwe bigihînim loda genim." Kîso jî ji xwe re digot: "Wele hema ez dê bi şev bikevim rê. Eger bi şev bikevim rê, heta sibehê jixwe ez dê bigihêjim lodê." Nêta herduyan jî ev bû.

Rovî roja din çû ser vî sergoyî, ser sergoyê din û yê din... Çavê wî lê bû ku hestûyekî an tiştêkî din bibîne û bixwe. Kîsoyê me jî hêj ji şevê ve ketibû ser rê û çûbû.

Rovî hat ber loda genim lê kîso serê xwe ji nav genim hilda û fikand. Genim ji kîso re mabû. Rovî got:

-Bira, ma qey zikat jî lê nakeve?

Kîso got:

-Ê wele libek genim, zikata wî heye.

Rovî got:

-Ma yek-du heb neketine dora benderê jî?

Kîso got:

-Em dê yekê ji dora benderê jî bidin te.



Rovî li derdorê gerîya û libek genim ji wî ji xwe re dît. Bûn sê libên wî. Rahîşt wan her sê libên genim û piştê serê xwe xurand û ji xwe re got:

-Ev yek ji çavbirçîti û tiralîya min hat serê min.

Çiroka me çû diyarên, rehma Xwedê li dê û bavên guhdaran."

Çiroka ku apê min got pir xweş bû û me pir ecibandibû. Piştî wê rojê me girîngiya çirokan bêhtir fam kir û niha em ji çirokan bêhtir hez dikin. Roja din ez çûm pirtûkxaneyê û min hinek pirtûkên çirokan bi emanetî anîn. Bavê min jî ji pirtûkfiroş çend pirtûkên çirokan ji min re kiribûn û êvarê bi xwe re anin. Edî li malê saeta me ya xwendina çirokan heye. Em di wê saetê de bi malbatî çirokan dixwinin û ji hev re dibêjin.

(Komîsyon)



Nêçîra Peyvan



bênder



tov



pirtûkfiroş

Çalakiya 1. Valahiyan li gor hevpeyvîna jorîn dagirin.

1. Zarok berî ku li çîrokê guhdarî bikin çi karî dikin?

.....

2. Kî çîroka Rovî û Kîso ji zarokan re dibêje?

.....

3. Rovî û kîso bi hev re çi karî dikin?

.....

4. Rovî ji bo nexebite her car ji kîso re çi digot?

.....

5. Serê sibehê kî berî kê digihêje ber loda genim?

.....

Çalakiya 2. Li hemberê hevokên jêrîn nişaneya "R" (rast) an "Ç"yê (çewt) daynin.

1. Ji ber çavbirçîti û tiraliyê, rovî bi ser neket. ()

2. Zarokan çîroka apê xwe neecibandibû. ()

3. Piştî ku apê wan çîrokê ji wan re dibêje zarok bêhtir li televîzyonê dinêrin. ()

4. Piştî hevaltî û cîrantîyeke dûvedirêj rovî û kîso dibin destûbirakên hev. ()

5. Kîso ji ber ku bi şev dikeve rê, berî rovî digihêje loda genim. ()

Çalakiya 3. Lîstikek û çîrokeke ku hûn dizanin ji hevalekî/hevaleke xwe re bibêjin. Di axaftinên xwe de hay ji edeba axaftinê, nişanên laş û rû û derbandinê jî hebin.


BEŞA 3. ZARGOTIN



1. Gotinên Pêşyan

Pêşî gotina xwe bipêje û piştire bibêje.

Dilê şivên bixwaze, dikare ji nêrî şîr bidoşe.

Di navbera gotin û kirinê de çiya hene.

Bila hindik be bila rindik be.

2. Mamik

Çûme êş, ecêbek hate pêş, bi şeş lîngan bû ji xeynî yên pêş. Ev çi ye?

Mamikê mino, kir xişt û xişt, çû pişt derî rûnişt. Ev çi ye?

Mamikê mino, bi şev xemilî ne, bi roj vemirî ne. Ev çi ne?

Heyv hebe difire, tav hebe direve. Ev çi ye?

Ser textik e ne dar e, bin textik e, ne dar e, çilo dixwe ne kar e.
Ev çi ye?

3. Zûgotinok

Kerê zer li rizdeyê dizirî.

Rovî li rê zivirî, rê li rovî zivirî.

4. Lêhatinok

Rovî rovî rovî rindik

Serê dûvê rovî bi kincik

Rovî çûye mala xala

Lê kirine barê dara

Bijmêr nejmêr bîst û çar e

Rovîyê me hesabdar e.

4. Pêkenok

WÊNEYÊN WESÎQEYÎ

Reşît ji bo bikeve karekî fermî, serî li sazîyekê dide. Sazî heşt heb wêneyên wesîqeyî jê dixwaze. Lê Reşît nizane ku wêneyên wesîqeyî çi ne. Ew ji diçe ji hevalê xwe Metîn dipirse. Metîn jê re dibêje:

-Tiştê ez dizanim wêneyê wesîqeyî, ew wêneyê ye ku tê de nivê bejina mirov xuya ye. Tu çalekê li vir bikole ez dê herim wênegirê binim û wêneyên te bigirim.

Reşît dest bi kolandina çalê dike. Dema Metîn vedigere dibîne ku Reşît heşt çal kolane. Metîn şaş dimîne û dibêje:

-Kuro Reşît ev çi ne, te çima heşt heb çal kolane?

Reşît:

-Êêê, ma ji min ne heşt heb wêneyê xwestibûn?

Metîn:

-Wîîî! Te çima wisa kir? Jixwe min heşt heb wênegir anîbûn.

(Bî guhertinên piçûk ji Abdulkadîr Bîngol)

5. Stran

ZOZAN ZOZAN

Zozan Zozan Zozan lê lê Zozan lê lê Zozan
Zozan Zozan Zozan lê lê Zozan kewê canê

Firîya serê gazan lê lê Zozan lê lê Zozan
Firîya serê gazan lê lê Zozan kewê canê

Ref tê ji refên qazan lê lê Zozan lê lê Zozan
Ref tê ji refên qazan lê lê Zozan kewê canê

Hûrik hûrik dimeşe lê lê Zozan lê lê Zozan
Hûrik hûrik dimeşe lê lê Zozan kewê canê

(Strana Gelêrî)

Nêçîra Peyvan



kew



gaz



ref

BEŞA 4. XAÇEPIRS



1




2




3




6




4



8



5



9



7



10

BEŞA 5. NIRXANDIN



A) Pirsên jêrîn bibersivînin.

1. Hûn herî zêde ji kîjan listikan hez dikin? Bibêjin.
2. Feydeyên listikan çi ne? Bibêjin.
3. Listikên ku bi keviran tên listin kîjan in? Bibêjin.
4. Navên sê çirokên ku hûn ji wan hez dikin bibêjin.
5. Hûn dikarin listina listikekê tarîf bikin?

B) Li hemberê hevokên jêrîn nîşaneyên "R" (rast) an "Ç"yê (çewt) daynin.

1. Listika pêncokê bi du kesan tê listin. ()
2. Mihrîcan, kolan û çepil navê çend heb listikan in. ()
3. Ji bo listikên wekî tepê, xar û veşartokê hejmara listikvanan girîng e. ()
4. Listik tev bi zûgotinokekê dest pê dikin. ()
5. Listika teytokê bi du kesan tê listin. ()

C) Valahîyên jêrîn bi peyvên guncan dagirin.

maka / qîtik / teytokê / kevirên / xarên

1. Li erdê kortikeke piçûk tê kolan û mirov datîne ser kortikê.
2. Ji bo vê listikê pêncşayik hewce ne.
3. Bipiçûk ên ku ji kevir, hesin an caman çêbûne tê listin.
4.listikê bi zûgotinokekê tê bijartin.
5. Ji bo listika kevirêkî pan hewce ye.

D) Di pirsên jêrîn de vebijêrka rast nîşan bikin?

1. Kîjan listik bi du komên ku hejmara wan wekî hev e tê listin?

- a) tepê b) xar c) darqîtik d) pêncok

2. “Mak bi ‘bizdim-badimê’ tê diyarkirin. Mak berê xwe dide dîwar an darekê û heta bistan dijimêre. Listikvanên din xwe vedişêrin. Mak êdî li wan digere û berî ku ew vegerin û destê xwe bidin darê destê xwe didiyê. Ji bo ku mak ji makbûnê azad bibe divê jêhatî be.”

Li jor behsa kîjan listikê tê kirin?

- a) veşartok b) teytok c) tepê d) xar

3. “Kevir li hewa tèn girtin. Eger kevir bikevin erdê dor digihêje listikvanên din.”

Li jor behsa kîjan listikê tê kirin?

- a) darqîtik b) xar c) tepê d) pêncok

4. “Ji bo listikê kevirêkî pan hewce ye. Li erdê malikên çargoşe tèn xêzkin. Mirov radibe ser pêyekî û kevir di wan malikan de bi pêyê xwe diajo. Divê di listikê de mirov pê li xêzikan neke û kevir ji li ser xêzikan nesekine.”

Li jor behsa kîjan listikê tê kirin?

- a) xar b) teytok c) darqîtik d) pêncok

5. “Ji bo vê listikê darikêkî bi qasî bostekê û yekî bi qasî milekî hewce ne. Ji yê kin re qîtik ji yê dirêj re dar tê gotin. Li erdê kortikeke piçûk tê kolan û mirov qîtik datîne ser kortikê. Mirov bi dar, qîtik hildide û lê dide, wî dipekîne. Ji bo listikvan bi ser bikevin divê qîtik dûr bikeve.”

Li jor behsa kîjan listikê tê kirin?

- a) teytok b) darqîtik c) tepê d) veşartok

UNÎTEYA 9.

ÇALAKÎYÊN SERBEST



AMADEHÎYA UNÎTEYÊ

- 1) Hûn di demên xwe yên serbest de bi çi mijûl dibin? Bibêjin.
- 2) Hûn herî zêde ji kîjan bernameyên televîzyonê hez dikin? Bibêjin.
- 3) Hûn bêhtir kîjan cûreyên werzişê dikin? Bibêjin.

BEŞA 1. ÇALAKÎYÊN HUNERÎ Û HOBÎ

Hevpeyvîn



HOBÎYÊN ME

Roja yekşemê ji kêfan ez zû şiyar bûm. Lewra mamosteya me dê em biribûna seyrane. Êdî min hew karîbû razim. Min bavê xwe şiyar kir û bavê min ez birim cihê hevditîne. Em li dibistanê li hev civiyan. Berî ku em bi rê bikevin mamosteya me derbare cihê seyrane de agahî dan me. Ji bo ewlehiya me jî hin hişyarî dan me û em bi rê ketin.

Em çûn seyrangehê. Me li wir taştê xwar. Em bi topê listin. Hin ji me jî bi benik listin. Em têra xwe li derdora seyrangehê gerîyan. Wextê me pir xweş derbas dibû. Êdî em tev ji ger û listikê pir westiyabûn. Me xwe da ber siyê. Mamosteya me gazî me tevan kir. Em tev li dor wê civiyan. Mamosteyê ji me re got:

-Xuya ye ku seyrana me diqede. De ka bibêjin seyrana me çawa derbas bû? Me tevan bi hev re ji bo vê roja xweş spasîyên xwe jê re gotin. Lezgin ket axaftinê û bi kelecana got:

- Mamoste, careke din em dê kengî werin? Em tev bi hev re kenîyan. Mamosteyê bersiva wî da û jê re got ku ji xeynî seyrane tiştine din jî hene. Ji me pirsî ku em di wextên xwe yên serbest de çi dikin. Di navbera me de ev hevpeyvîn çêbû:

Zeyneb: Ez ji xwendina pirtûkan pir hez dikim. Bi pirtûkên ku ez dixwînim, welat û çand û mirovên cuda nas dikim. Bi vê naskirinê ez pir kêfxweş dibim. Carinan jî bi hevalên xwe re diçim şanoyê. Dema ez listikvanê şanoyê li ser dikê dibînim wekî ku ez jî bi wan re dilizim.

Mistefa: Kêfa min ji sînemayê re tê. Ez bêhtir diçim filmên animasyon. Dema mezin bûm ez jî dixwazim filmên animasyon çêbikim.



Berfîn: Kêfa min ji ji wênekêşiyê re tê. Ez ewqas bi wênekêşiyê re mijûl dibim ku di malbatê de ji min re dibêjin “Wênekêş”.

Ristem: Li malê ajelên min ên kedî hene. Bi wan re diaxivim û guh didim wan. Kuçikekî min heye. Me li bexçe jê re xanîkek çêkiriye. Pisîka min jî li malê ye û ji listikê pir hez dike. Li malê sebra min bi wan tê.

Fatma: Ez ji muzîkê pir hez dikim. Hem guhdarîkirin û hem jî lêxistina kemanê bi min pir xweş e. Ji bilî muzîkê bi orîgamîyê re jî mijûl dibim. Piştî ku dersên xwe dixwînim li muzîkê guhdarî dikim û di ber de jî bi kaxezên rengîn figuran çêdikim. Jûra min bi van tiştan xemilandî ye. Ez carinan wan didim hevalên xwe jî.

Zinê: Kêfa min ji wênesaziyê re tê. Li malê pêñûsên min ên rengîn pir in û ez bi wan, wêneyên gelek tiştan çêdikim. Ji xeynî wêneyan ez jî çêkirina xwarinan jî pir hez dikim. Ez û birayê xwe hînî çêkirina gelek xwarinan bûne.

Elî: Ez pir caran dawîya heftiyê bi kekê xwe re diçim masîyan. Em çadira kampê datînin. Em şewkên xwe diavêjin avê û li benda masîyan dimînin. Piştî ku me şewk avêtin em li dora agirê kampê rûdinin û kekê min ji min re çîrokan dibêje.

Mirza: Ez jî ji listina bi kişikê pir hez dikim û dikarim birayê xwe yê mezin mat bikim.

Mamosteya me jî di dawiyê de wiha got:

-Ez jî ji kişikê pir hez dikim. Min heta niha nizanibû ku tu di kişikê de pêşketî yî. Naxwe em dikarin carinan bi hev re bilizin.

Dû re berê xwe da me hemûyan û wiha got:

- Zarokino, ji van tiştên ku hûn ji wan hez dikin û di demên xwe yên serbest de pêk tinin re hobî tê gotin. Her yek ji me li gor zewqa xwe ji hobîyên cuda hez dike. Hobî jiyana me rengîn dikin û em bi saya van hobîyan hînî gelek tiştan dibin. Hobî nahêlin ku mirov bi tiştên xirab û bêkêr re mijûl bibin. Jiyana me bi hebûna hobîyan xweştir dibe.

(Komîsyon)

Nêçîra Peyvan



seyran



benik



wênekêş



wênegir



ajelên kedi

Çalakiya 1.

Hûn jî derheqê malbat, heval, lîstik û hobîyan de bi hevaleke/ hevalekî xwe re hevpeyvînekê çêbikin.

Çalakiya 2.

Pirsên jêrîn li gor agahiyan bibersivînin.

1. Berî ku zarok ji bo seyranê bi rê bikevin mamosteya wan çi dike?

.....

2. Kî bi listina kişikê dizane?

.....

3. Fatma bi çi û çi mijûl dibe?

.....

4. Hobî çi ye?

.....

Çalakiya 3.

Li hemberê hevokên jêrîn nişaneyên "R" (rast) an "Ç"yê (çewt) daynin.

1. Her kes jî heman hobîyê hez dike. ()
2. Ji yana me bi hebûna hobîyan xweştir dibe. ()
3. Kêfa Zînê ji wênesazîyê re tê. ()

Çalakiya 4.

Hobîyên ku hûn jî wan hez dikin û hez nakin wekî mînakên jêrîn binivîsin û jî pola xwe re bibêjin.

1. Ez jî xwendina pirtûkan hez dikim.

2. Ez jî girtina masîyan hez nakim.

3.

4.

Çalakiya 5.

Hobîyên ku hûn jî wan hez dikin û hez nakin jî hevaleke/hevalekî xwe re bibêjin. Bi hevalên ku mîna we difikirin re hûn dikarin komên hobîyan jî ava bikin.

ÇALAKİYÊN HUNERÎ Û HOBÎ



Xwendina pirtûkan



Temaşekirina şanoyê



Guhdarikirina muzîkê
û lêxistina amûrên wê



Temaşekirina sinemayê



Xêzkirina wêneyan



Kişandina wêneyan



Xwedîkirina ajelan



Girtina masiyan



Lîstina bi kişîkê



Kampvedan



Çêkirina xwarinê



Origami

BEŞA 2. WERZIŞ



Hevpeyvîn

WERZIŞ

Mamoste: Zarokino, dersa me werziş e. Werziş ji bo tenduristiya me pir baş e. Hûn ji kîjan cûreyên werzişê hez dikin, ka bibêjin?

Mehmûd: Ez ji basketbolê pir hez dikim. Ez bi hevalên xwe re li taxê bi basketbolê dilizim.


Gulsîma: Ez jî ji kaşûnê pir hez dikim. Îsal em bi malbatî çûn Erzurumê û me li wir li ser berfê kaşûn kir.

Sumeye: Ez jî ji ajotina patenê pir hez dikim. Cihên ku wesayît di wan de naçin û nayên, ji bo ajotina patenê guncan in. Dema diçim ser patenê ez kaska xwe didim serê xwe.

Hisên: Ez ji listina futbolê pir hez dikim. Me di pola xwe de tîmek ava kiriye. Em bi tîmên wan polên din re bi futbolê dilizin.

Xezal: Ez ji listina pînponê pir hez dikim. Li xwendingeha me di hola werzişê de maseya pînponê heye. Em bi hevalên xwe re li wir bi pînponê dilizin.

Rêzan: Kêfa min jî ji ajotina bisiklêt re tê. Ez di rêyên bisiklêtan de bisiklêtê xwe diajom. Dema diçim ser bisiklêt ez kaska xwe didim serê xwe.



Şanaz: Li gor min voleybol jî listikeke pir xweş e. Em di demên xwe yên serbest de bi hevalên xwe re bi voleybolê dilizin.

Mûsa: Ez jî ji avjeniyê hez dikim. Li taxa me hewzekî avjeniyê heye. Dema hewa xweş be ez li wir avjeniyê dikim.

Evîn: Meş jî werzişeke xweş e. Ji bo tenduristîya me pir baş e. Em bi malbatî her sibeh dimeşin.

Nêçîra Peyvan



werziş



tax



kask

Çalakiya 1.

Li gor hevpeyvîna jorîn gotin û navên li hemberê wan hevkek bikin.

1. Ez bi hevalên xwe re li taxê bi basketbolê dilizim. () Mûsa
2. Îsal em bi malbatî çûn Erzurumê û me li wir li ser berfê kaşûn kir. () Xezal
3. Li xwendingeha me di hola werzişê de maseya pinponê heye. () Gulsîma
4. Ez gelek caran di cihên ewle de patenê diajom. () Sumeye
5. Ez jî ji avjeniyê hez dikim. Li taxa me hewzekî avjeniyê heye. () Mehmûd

Çalakiya 2.

Li hemberê hevokên jêrîn nîşaneya "R" (rast) an "Ç"yê (çewt) daynin.

1. Cihên ku wesayîti di wan de naçin û nayên, ji bo ajotina patenê guncan in. ()
2. Werziş jî bo tenduristîya me pir baş e. ()
3. Dema em çûn ser patenê divê em tiştêkî nedin serê xwe. ()
4. Şanaz bi hevalên xwe re bi voleybolê dilize. ()
5. Dema em biçin ser bisiklêti divê em kaska xwe bidin serê xwe. ()

CÛREYÊN WERZİŞÊ



Basketbol



Futbol



Voleybol



Pınpon



Bisiklêt



Paten



Kaşûn



Avjenî



Meş

BEŞA 3. BERNAMEYÊN TELEVÎZYONÊ

BERNAMEYÊN TELEVÎZYONÊ

Televîzyon amûreke ragihandinê ye. Bernameyên televîzyonê cûrbicûr in. Gelek bûyerên ku li nêzik û dûr diqewimin em ji bernameyên nûçeyan hîn dibin. Bi saya bernameyên geştûgerê em dikarin cihên gelek dûr nas bikin. Em bi temaşekirina bernameyên televîzyonê

carinan hîni tiştên teknolojîk jî dibin. Em agahîyan derbarê ajalên cûrbicûr de jî belgefilmên ajelan hîn dibin. Bi xêzefilman çihana me ya xeyalî bi pêş dikeve. Bi bernameyên pêşbirkan, agahiyên me zêde dibin. Bi filmên sînemayê hem wextê me xweş derbas dibe û hem jî em jiyan û çand û diroka gelên din jî wan filman hîn dibin. Bi bernameyên xwarinê em hîni çêkirina xwarinên herêm û welatan dibin. Carinan jî li gor terîfên van bernameyan li mala xwe em xwarinên nû çêdikin.

Digel van feydeyên televîzyonê divê em di temaşekirina televîzyonê de hay ji xwe hebin. Eger em hay ji xwe nemînin em dê gelek zerera jî jê bibînin. Wexta ku em demeke dirêj li ber televîzyonê xerc bikin hem wextê me diçe û hem jî çavên me û laşê me diwestin û zerere dibînin. Di nav bernameyên televîzyonê de hin bername ne li gor me zarokan in. Ji ber vê ye ku divê em li her bernameyê temaşekirina û bernameyên li gor xwe hilbijêrin. Li ser ekrana televîzyonê hin nîşaneyên

hişyarîyê tînin bikaranîn. Divê di temaşekirina bernameyan de em bala xwe bidin van nîşaneyan û li gor wan hereket bikin. Bi vî awayî em dikarin xwe ji van zerera biparêzin.

(Komîsyon)



Çalakiya 1. Pirsên jêrîn li gor agahiyên jorîn bibersivînin.

1. Feydeya bernameyên nûçeyan çi ye?
.....
2. Em agahiyên derbarê ajelên cûrbicûr de ji kîjan bernameyan hîn dibin?
.....
3. Em jîyan û çand û dîroka gelên din ji çi hîn dibin?
.....
4. Feydeya bernameyên pêşbirkê çi ye?
.....
5. Ji bo parastina ji zererên hin bernameyan, li ser ekrana televîzyonê çi tîn bikaranîn?
.....

Çalakiya 2. Li hemberê hevokên jêrîn nîşaneyên "R" (rast) an "Ç"yê (çewt) daynin.

1. Bi saya bernameyên geştûgerê em dikarin cihên gelek dûr nas bikin. ()
2. Bi filmên sinemayê wextê me xweş derbas nabe û em tiştekî ji wan hîn nabin. ()
3. Zererên televîzyonê hiç tune ne. ()
4. Em bi bernameyên teknolojîk hînî çêkirina xwarinên herêm û welatan dibin. ()
5. Di nav bernameyên televîzyonê de hin bername ne li gor me zarokan in. ()

Çalakiya 3. Valahiyên jêrîn bi peyvên guncan dagirin.

wextê / teknolojîk / ragihandinê / xêzefilman / terîfên

1. Em bi temaşekirina bernameyên televîzyonê carinan hînî tiştên ji dibin.
2. Carinan ji li gor van bernameyan li mala xwe em xwarinên nû çêdikin.
3. Televîzyon amûreke ye.
4. Bi filmên sinemayê me xweş derbas dibe.
5. Bi cihana me ya xeyalî bi pêş dikeve.

Çalakiya 4. Filmekî ku we lê temaşê kiribe yan pirtûkeke ku we xwendibe ji hevake/hevakekî xwe re vebêjin.

BEŞA 4. ZARGOTIN



1. Mamik

Bê dest û bê ling e, lê avjenîyê dike. Ev çi ye?

Qutiyeke min heye, hemû cihan tê de ye. Ev çi ye?

Çûme serê banekî, min lêxist gopalekî, deng çû welatekî. Ev çi ye?

Tiştêkî min heye biqirik e, bêziman e; bidev e, bêdiran e. Dilorîne, ne
însan e. Ev çi ye?

Sindoqa tiji tîl, deng dide pêl bi pêl. Ev çi ye?

2. Lêhatinok

Heft ser re û heft ber re
Û heft jî ji xwe û me re
Hê nû here milek gîya bîne
Ji ker û golikê xwe re

Kurik ê biçê mala xala(n)
Ê barkê ji barê dara(n)
Hat ku berika vala
Kada bigire ji jinxala(n)

Çîrokê çîrvanokê
Rûnê rokê
Berda cokê
Co miçiqî
Rûn biriqî
Golika salê
Li garanê
Şengo mengo
Mi çiqas xweş go


3. Zûgotinok

Şivên Sofî Siso şeş in.

Heft elb mast heft elb şîr.

Heşt hirç her heşt hirç pişt pirç.

4. Pêkenok



HEFT ROJ

Mamoste ji xwendekaran re got:

-Divê hûn nivîseke wisa binivîsin ku navên heft rojan tê de derbas bibin.

Xwendekarekî wisa nivîsî:

-Bavê min roja yekşemê çû nêçirê. Masiyekî ewqas mezin girt û anî malê ku roja duşem, sêşem, çarşem, pêncşem, in û şemiyê me xwar, hêj ji neqediyaye.

(Ji Abdulkadir Bîngol)

BEŞA 5. XAÇEPIRS



1




2




3



4



5



6



7



8

BEŞA 6. NIRXANDIN



A) Pirsên jêrîn bibersivînin.

1. Di televîzyonê de çi cûre bername derdikevin? Navê sê heban binivîsin.

.....

2. Feydeyên hobîyan çi ne? Binivîsin.

.....

3. Navên sê cûreyên werzişê binivîsin.

.....

4. Navên sê cihên çalakîyên hunerî binivîsin.

.....

5. Zererên televîzyonê çi ne? Binivîsin.

.....

B) Li hemberê hevokên jêrîn nîşaneyên “R” (rast) an “Ç”yê (çewt) daynin.

1. Divê em li her bernameyê temaşê bikin. ()
2. Meş ji bo tenduristiyê ne baş e. ()
3. Digel feydeyên televîzyonê hin zererên wê jî hene. ()
4. Berî ku em herin seyranekê divê em agahîyan derbarê wê de hîn bibin. ()

C) Valahîyên jêrîn bi peyvên guncan dagirin.

pînponê / avjenîyê / nûçeyan / guhdarî / zarokan

1. Ez li muzîkê dikim.
2. Gelek bûyerên ku li nêzik û dûr diqewimin em ji bernameyên hîn dibin.
3. Li xwendingeha me di hola werzişê de maseya heye.
4. Di nav bernameyên televîzyonê de hin bername ne li gor me in.
5. Li taxa me hewzekî heye.

D) Di pirsên jêrîn de vebijêrka rast nîşan bikin?

1. Em bi saya kîjan bernameyan hîni çêkirina xwarinên herêm û welatan dibin?

- | | |
|------------------------|---------------------------|
| a) bernameyên nûçeyan | b) bernameyên teknolojîk |
| c) bernameyên xwarinan | d) bernameyên belgefilman |

2. Kîjan hobîyek e?

- | | |
|----------------------|---------------------|
| a) serdana mirovan | b) çûna xwendingehê |
| c) lîstina bi kişîkê | d) xebata dersan |

3. Tiştên ku mirov ji wan hez dikin û di demên xwe yên vala de pêk tînin re çi tê gotin?

- | | | | |
|---------|---------|---------|---------|
| a) nûçe | b) hobî | c) wêne | d) ajal |
|---------|---------|---------|---------|

4. Ji bo ajotina patenê cihên guncan ku der in?

- | | |
|---|------------------------|
| a) Cihên ku wesayît di wan de naçin û nayên | b) Zevîyên hişk û ziwa |
| c) Cihên ku mirov lê bêhna xwe vedidin | d) Nava jûra rûniştinê |

5. Em bi saya kîjan bernameyan dikarin cihên gelekî dûr ji nas bikin?

- a) bernameyên pêşbirkê b) bernameyên teknolojik
c) bernameyên nûçeyan d) bernameyên geştûgerê

6. Em agahiyên derbarê ajelên cûrbicûr de ji kîjan bernameyan hîn dibin?

- a) bernameyên belgefilman b) bernameyên geştûgerê
c) bernameyên teknolojik d) bernameyên nûçeyan

7. Kîjan feydeyeke xêzefilman e?

- a) Em derbarê her tiştî de agahdar dibin. b) Em bi temaşekirinê gelekî diwestin.
c) Cihana me ya xeyalî bi pêş dikeve. d) Hiç feydeyên wan tune ne.

8. Divê kîjan bê valahiya jêrîn?

Ez li muzîkêdikim.

- a) guhdarî b) xwedî c) temaşê d) çê

9. Divê kîjan bê valahiya jêrîn?

Ez patenê

- a) temaşê dikim. b) guhdarî dikim. c) diajom. d) li xwe dikim.

10. Ji hevyeckirinan kîjan çewt e?

a) kaşûn

b) meş

c) kişik

d) orîgamî



F E R H E N G O K

A

acizkirin: rahatsız etmek
adar: mart
agahî: bilgi
agir: ateş
agirkuj: itfaiye
ajel: hayvan
ajotin: sürmek
ajovan: sürücü, şoför
alav: araç gereç, edevat
ali: taraf
alikarî: yardım
alıklarıya bilez: ilkyardım
alûtirşk: erik
amadehî: hazırlık
amûr: araç, alet
an...an...: ya...ya...
ap: amca
aşêf: ayırık otu ayıklama
av: su
avahî: yapı, bina
ava sûsê: meyan şerbeti
avakirin: inşa etmek
avdan: sulama
avêtin: atmak, fırlatmak
avjenî: yüzme
avmêwe: meyvesuyu
awaz: ses
axaftin: konuşmak

B

ba: rüzgar
bablisok: rüzgar hortumu
bahoz: kasırga
bajar: şehir
bakur: kuzey
balgeh: yastık
balkêş: ilginç
ban: dam
bapîr: dede
bar: yük

baran: yağmur
barîn: yağma, yağış
bask: kanat
baş: iyi
başûr: güney
bav: baba
bavo: babacığım
bazargeh: alışveriş mekanı
bazdan: koşma
bedew: güzel
behîvterk: badem çağlası
behskirin: bahsetmek
bejindirêj: uzun boylu
bejinkurt: kısa boylu
belavbûn: yayılma
belavkirin: yaymak
belê: evet
belgefilm: belgesel
bendav: baraj
benik: ip
berbelav: yaygın
berê: eskiden
berêvar: ikindi, akşamüstü
berf: kar
berhem: eser
berhevkirin: toplamak
berî ...: ...den önce
berîk: cep
bername: program
bersiv: cevap
bersivandin: cevaplamak
berû: palamut meyvesi
berx: kuzu
bes: yeter
beş: bölüm
betlane: tatil
bexçeyê ajelan: hayvanat bahçesi
bextewarî: mutluluk
bextreş: şanssız
beyanî baş: günaydın

beyar: ekilmemiş tarla
beybûn: papatya
beyt: iki dizeli şiir kıtası
bêav: susuz
bêdeng: sessiz
bêhn: koku
bêkêr: işe yaramaz
bênder: harman yeri
bêr: kütrek
bêreng: renksiz
bi çi: ne ile
bi giştî: genellikle
bi hev re: birlikte
bi malbatî: ailece
bi qasî: ...e kadar
bi saya: sayesinde
bi taybetî: özellikle
bi vî awayî: böylece
bi xêra xwe: lütfen, hayrına
bi ya min: bana göre
biborin: affedersiniz
bicihkirin: yerleştirmek
biha: 1. pahalı 2. fiyat
bihar: bahar
bihistin: iştirmek
bihişt: cennet
bijartin: seçmek
bijîşk: doktor
bikaranîn: kullanmak
bikêrhatin: yaramak
bila be: tamam, olsun
bilez: hızlı
bilind: yüksek
bilûr: kaval
bin: alt
binavkirin: adlandırmak
binavûdeng: meşhur, ünlü
bira: erkek kardeş
birastin: ızgarada pişirmek
birêketin: yola çıkmak
birêkûpêk: düzenli

birin: götürmek
birin: yara
birindar: yaralı
biriqin: parlama
biru: kaş
biryar: karar
bisk: kakül
bitalûke: tehlikeli
biwext: zamanında, vakitli
bizin: keçi
bir: 1.kuyu 2.hatır, hafıza
birkarî: matematik
biyanî: yabancı
bost: karış, el ölçüsü
boz: sarı, açık renkli
bûk: gelin
bûn: olmak
bûyer: olay

C

camêr: mert, delikanlı
car: kere, defa
carinan: bazen
cemidî: soğuk
cenabê nebî: hazreti peygamber
ceng: kavga, savaş
cewahir: mücevher
cêwî: ikiz
cih: yer
cişok: çamaşır makinesi
cilûberg: giysi, üstbaş
civîn: toplanma
ciwan: genç
cihan: dünya
cirantî: komşuluk
co: su arka
cotkar: çiftçi
cotkirin: çift sürmek
cuda: farklı
cudahî: farklılık
cûrbicûr: türlü türlü
cûre: tür, çeşit
cûtin: çiğneme

Ç

çal: derin çukur, kuyu
çalakî: etkinlik
çand: kültür
çandin: ekip biçme
çapûtê pêçanê: sargı bezi
çarşem: çarşamba
çaryek: çeyrek
çav: göz
çavbirçiftî: açgözlülük
çawa: nasıl
çem: akarsu
çend: 1. kaç 2. birkaç
çep: sol
çêj: tat
çewt: yanlış
çêkirin: yapmak
çêlek: inek
çêlî: yavru
çêre: otlak
çêrin: otlama
çêtir: daha iyi
çi: ne
çikîn: suyun kesilmesi
çilo: palamut, meşe dalı
çima: neden
çinîn: yolmak, toplamak
çiqas: ne kadar
çirîya paşin: kasım
çirîya pêşin: ekim ayı
çikspî: bembeyaz
çirok: 1. masal 2. hikaye
çirokbêj: masal anlatıcısı
çok: diz
çopdank: çöp kutusu
çûk: kuş

D

da ku... : ...mesi için
dagirtin: doldurmak
daleqandin: asmak, iliştiirmek
dan: 1. verme 2. öğün

danasîn: tanıtma
danê xwarinê: yemek öğünü
danin: bırakmak, koymak
dapîr: nine
daristan: orman
darqîtik: çelik çomak
das: orak
daşir: tuvalet
dawîya hefteyê: haftasonu
debar: geçim
dehl: sulak bahçe
delal: güzel
dem: zaman
dêm: yanak
demsal: mevsim
dendik: çekirdek
deng: ses
dengbêjî: ozanlık
dep: tahta
der: yer
derbandin: vurgulama
derbarê ... de: ... hakkında
derbasbûn: geçme
derdor: etraf
derengmayîn: geç kalma
derewîn: yalancı
derheqê ... de: ... hakkında
derî: kapı
dermankirin: ilaçlama, tedavi etmek
derve: dışarı
derya: deniz
desmal: 1. mendil 2. yazma
destpêkirin: başlamak
dest: el
destnîşan: imza
destsivikî: el çabukluğu
destşok: lavabo
destûbirak: ahiret kardeşi
destûr: izin
deşt: ova
dev: ağız

deveh: deve
dever: yer
dew: ayran
dewlemendî: zenginlik
dê: anne
dê û bav: ebeveyn
dêr: kilise
din: diğer
dî nav de: içinde
dibistan: okul
dido dido: ikişer ikişer
dijmin: düşman
dikandar: bakkal
dildarî: gönüllük
dilêr: cesur
dilgeş: mutlu
dilsoz: sadık
dilşadî: mutluluk
dilzizî: duygusallık
dimen: manzara
dims: pekmez
diran: diş
dirêj: uzun
divê: ...malı / ...meli
dîsa: yine
dîtin: görmek
dohtin: sağmak
domandin: devam etmek
dor: 1. sıra 2. çevre, civar
duqatî: iki katlı
dubare: tekrar
duh: dün
dur: inci
duşem: pazartesi
duyem: ikinci
dûr: uzak
dûrik: mani
dûrxistin: uzaklaştırmak
dûv: kuyruk

E

ecibandin: beğenme
edeba axaftinê: konuşma

adabı
elb: ölçek çeşidi
em: biz
endam: üye
endamtî: üyelik
endezyar: mühendis
enî: alın
enîşk: dirsek
erd: yer
erê: evet
erk: görev
erzan: ucuz
ev: bu
ew: o, şu
ewlehî: güvenlik
ewrî: bulutlu
ez: ben
ezbenî: efendim

Ê

êdî: artık, bundan sonra
êriş: saldırı
êş: acı
êvar: akşam
êzing: odun

F

famkirin: anlamak
fen: hile
ferheng: sözlük
ferhengok: sözlükçe
fermî: resmi
fermo: buyurun
fêkîfiroş: manav
fêrgeh: derslik
fêrkirin: öğretmek
fıraçşo: bulaşık makinesi
firavîn: öğle yemeği
fırçeya diranan: diş fırçası
fireh: geniş
firingî: domates
firotin: satma
fikandin: ıslık çalmak

G

ga: öküz
garan: sığır sürüsü
gava din: az önce
gavan: sığır çobanı
gaz: tepecik
gazikirin: seslenme,
çağırma
gel: halk
gelek spas: çok teşekkürler
gelekî: çokça
gelêrî: folklorik
gelo: acaba
genim: buğday
gerestêrk: gezegen
germ: sıcak
gerok: gezen
geşbûn: gürlleşme
geşt: gezi
gewr: 1. gri 2. açık renkli
gez: ısırk
gêre: harman dövmek
gihanek: bağlaç
gihaştin: ulaşmak, varmak
gilover: yuvarlak
gilyaz: kiraz
gir: iri
girani: ağırlık
girantir: daha ağır
girav: ada
girêdan: bağlama
giringî: önem
giya: ot
gog: top, küre
golik: buzağı
gopal: baston
gor: mezar
goşt: et
gotinên pêşîyan: atasözleri
guh: kulak
guhan: hayvan memesi
guhdan: bakım, önemseme
guhdar: dinleyici

guhdarikirin: dinlemek
guhêrîn: deęişim
gulan: mayıs
gulberoj: ayçiçeęi
guldank: vazo, saksı
gulfiroş: çiçekçi
gulî: dal
guncan: uygun
gund: köy
gundi: köylü
gur: kurt
gûz: ceviz

H

hatûçû: trafik
havîn: yaz mevsimi
heb: tane
hebû tunebû: bir varmış bir yokmuş
hebûn: var olmak
heçî: her kim ki, her ne ki
hêj: hentz
hejîr: incir
hejmar: sayı
heke: eęer
helbest: şiir
heman: aynı
hember: karşı
hembêz: kucak
hemû: bütün, hepsi
henek: şaka
hênik: serin
her bijî: aferin
her der: her yer
her tim: her zaman, hep
her û her: daima
herdu: ikisi
herêm: yöre, bölge
herî kêr: en az
herî zêde: en çok
herwiha: aynı zamanda
hesabdar: hesabı kuvvetli
hesin: demir

hesp: at
hest: duygu
hestî: kemik
hestiyar: duygusal
heta hingî: o zamana kadar
heta niha: şimdiye kadar
heval: arkadaşı
hevaltî: arkadaşlık
hevîr: hamur
hevnasîn: tanışma
hevok: cümle
hevpeyvîn: diyalog
hevrûkirin: karşılaştırmak
hevyekkirin: eşleştirmek
hew: bundan sonra hiç
hewce: lazım
hewldan: çabalama
hewş: avlu
hewzê avjenîyê: yüzme havuzu
heya: ...e kadar
heyv: ay
hezar: bin
hezîran: haziran
hezkirin: sevmek
hêdî: yavaş
hêja: değerli
hêkerûn: omlet
hêl: yön
hêsanî: kolaylık
hêvî: umut
hêz: güç
hibijartin: seçmek
hilbatin: güneşin, ayın yükselmesi
hin: bazı
hine: kına
hinekî: biraz
hingiv: bal
hingivî: ela renkli
hirç: ayı
hiş: akıl, hafıza
hişk: sert

hişyarî: uyan
hînbûn: öğrenme
hînker: öğretici
hînkirin: öğretmek
hundir: içeri
huner: sanat
hunerî: sanatsal
hûn: siz
hûr: ufak
hûrgulî: ayrıntı

I

incas: erik

Î

îkon: simge, sembol
îlon: eylül
în: cuma
îro: bugün
îsal: bu yıl
îşev: bu gece

J

jehr: zehir
jêbir: silgi
jêbirin: silmek
jêhatî: çalışkan
jêkirin: kesmek
jêr: aşığı
jêrîn: aşığıdaki
ji ber ku: nedeniyle
ji bilî...: ...nin dışında
ji bo: için
ji dêvla: yerine
ji ku: nereden
ji xeynî: hariç
ji ...: ...dan / ...den
jibîrkirin: unutmak
jimartin: saymak
jin: kadın
jinxal: dayının karısı
jixwe: zaten
jî: da / de, bile
jîjo: kirpi

jîn: yaşam
jîngêh: çevre
jîr: akıllı, zeki
jîyan: yaşam
jor: yukarı
gorîn: yukarıdaki
jûr: oda

K

ka: 1.saman 2. haydi
kad: çörek
kadîn: saman deposu
kakîl: ceviziçi, bademiçi vb.
kalê berfê: kardanadam
kalik: dede
kampvedan: kamp kurmak
kanî: kaynak suyu, çeşme
kanûna paşîn: ocak ayı
kanûna pêşîn: aralık ayı
kar: iş
karik: oğlak
karîn: yapabilmek, edebilmek
karker: işçi
karmend: memur
kartol: patates
kaxez: kağıt
keç: kız evlat
ked: emek
kedî: evcil
kek: abi
kelandin: haşlamak
kelecan: heyecan
keleh: kale
kelem: lahana
kelûpel: araç gereç
kendav: körfez
kengî: ne zaman
kenîn: gülme
ker: eşek
kerem bike: buyur
kes: kişi, kimse

kesk: yeşil
kevîr: taş
kevnar: eski
kew: keklik
kezeb: ciğer
kezîzer: sarı örgütlü
kêfxweşbûn: memnun olmak

kêlek: yan
kêm: eksik
kîjan: hangi
kîlam: uzun hava
kin: kısa
kirîn: yapmak, etmek
kirîn: satın almak
kişandin: çekmek
kişik: satranç
kizwan: menengiç
kî: kim
kîso: kaplumbağa
kolan: cadde
kolandin: kazmak
kom: grup
komputer: bilgisayar
kortik: küçük çukur
kuçe: sokak
kuliçe: kuru pasta
kulîk: çiçek
kum: takke
kuncî: susam
kundîr: bal kabağı
kur: erkek evlat
kurm: kurt, solucan
kurt: kısa
kuştin: öldürmek
kutîk: içli köfte
kûr: derin

L

laş: beden
lat: kaya, kayalık
law: oğul
lawaz: zayıf, sıska

legleg: leylek
lewra: çünkü
lezkirin: acele etmek
lê: ama, fakat
lêdan: vurma, çalma
lêhatinok: oyundaki tekerleme
lênûsk: defter
lêv: dudak
lêvegerandin: cevap vermek
li bal: yanında
li ber: önünde
li bin: altında
li cem: yanında
li gor: ...e göre
li hemberê: karşısında
li ku: nerede
li pey: arkasından, izinden
li rex: tarafında
li ser: üstünde
lib: tane
lidarxistin: düzenlemek
lihêf: yorgan
ling: ayak
livdar: hareketli
lixwekirin: giymek
listik: oyun
listikvan: oyuncu
lod: yığın
loma: o yüzden
lorik: lor peyniri
lorîn: ninni söyleme

M

maçîkirin: öpmek
mak: oyundaki ebe
mala te ava: sağolasın
malbat: aile
malik: kutucuk
mamik: bilmece
mamoste: öğretmen
masî: balık

mast: yoğurt
meh: ay
mehîr: ayran çorbası
mela: imam
meş: yürüme
met: hala
meyandin: mayalamak
mezin: büyük
mêvan: misafir
mêwefiroş: manav
mihrican: festival, şölen
mijang: kirpik
mijar: konu
mijîn: emme
mijûlbûn: meşgul olmak
mil: kol
mirov: insan, kişi
miştaxe: meyve kurutma yeri
mizgeft: cami
mizgînî: müjde
mî: koyun
mîna: gibi
morik: boncuk

N

na: hayır, yok
name: mektup
nan: ekmek
nanpêj: fırıncı
nasîn: tanıma
nav: isim
navber: ara
navçe: ilçe
navdar: meşhur
naverok: içerik, içindekiler
navnişan: adres
naxwe: öyleyse
nerm: yumuşak
nevî: torun
nexşe: harita
nexwende: okur yazar olmayan

nexweşi: hastalık
nexweşxane: hastane
neynik: ayna
neynûkbir: tırnak makası
nezanî: bilmeme, cehalet
nêçîr: av
nêrî: erkek keçi, teke
nêrîn: 1. bakma 2. görtüş
nêz: yakın
niha: şimdi
nirxandin: değerlendirme
nivîn: yatak
nivîs: yazı
nivîsandin: yazmak
nivîskarî: yazarlık
nîne: yoktur
nîşandan: gösterme
nîşanên laş û rû: jest ve mimik
nîşe: yazılı not
nîv: yarım
nîvişk: tereyağı
nîvro: öğle
nûçe: haber

O

olan: yankı

P

pace: pencere
paldank: koltuk, kanepa
pan: yassı
panî: topuk
paqij: temiz
paqijkirin: temizlemek
parastin: korumak
parêv: bûryan kebabı
parvekirin: paylaşmak
parza: aşı
paşîv: sahur
paşnav: soyadı
patik: ense
payîz: sonbahar

pekîn: fırlamak
pel: yaprak
pelên pêçayî: sarma yemeği
penc: avuç, el
penîrê bisîrik: otlu peynir
perwerdehî: eğitim
pesn: övgü
petîx: kavun
pevdeng: çok harfli ses (kurmanca için "xw" sesi)
peya: yaya
peyabor: yaya geçidi
peydakirin: temin etmek
peyker: heykel
peyv: kelime
peywîr: görev
pê: ayak
pêçan: sarmak
pêçî: parmak
pêdivî: ihtiyaç
pêhisîn: farkına varma
pêjgeh: mutfak
pêjgir: havlu
pêkenok: fikra
pêkhatin: oluşma
pêl: dalga
pêlav: ayakkabı
pêlistok: oyuncak
pêncem: beşinci
pêncok: beştaş
pêncşem: perşembe
pênûsdank: kalemlik
pênûstraş: kalemtraş
pêşbazî: yarışma
pêşbirk: yarışma
pêşî: önce
pêşkêşkirin: sunmak
pêşketî: gelişmiş
pêşketin: gelişmek
pêşwazîkirin: karşılamak
pêwîst: gerekli
pêxember: peygamber

pêxwarin: kahvaltılık
piçûk: küçük
piling: kaplan
pir: 1. çok 2. köprü
piranî: çoğunluk
pirpel: çok yapraklı
pirs: soru
pirteqalî: turuncu
pirtûkdank: kitaplık
pirtûkfiroş: kitapçı
pirtûkxane: kütüphane
pisik: kedi
pişkavêtin: kura çekmek
piştgir: dayanak, destek
piştguhkirin: kulak ardı etmek
piştî ku: ...den sonra
piştre: sonra
pixêrî: şömine
pîr: yaşlı
pîra holikê: oyundaki ebe
pîrozkirin: kutlamak
pîşe: meslek
pol: sınıf
por: saç
potik: bez
poz: burun

Q

qal: söz, konuşma
qalik: kabuk
qam: 1. boy 2. oyundaki sayı
qazî: kadı, hakim
qe nebe: hiç olmazsa
qedandin: bitirmek
qehweyî: kahverengi
qelandin: kızartmak
qelem: kalem
qelew: şişman
qenc: iyi
qerebalix: kalabalık
qerisandin: dondurmak

qesr: saray
qeşîr: dondurma
qet: hiç
qewet be: kolay gelsin
qewimîn: olma, meydana gelme
qewîtî: tembih, nasihat
qey: 1. acaba 2. sanki
qijik: karga
qîmetgirtin: değer bilmek
qirêj: kir
qirik: boğaz
qube: kubbe, türbe
qul: delik
quling: turna
qurm: kütük, kök

R

rabûn: kalkmak
ragihandin: iletişim
rakirin: kaldırmak
raman: fikir
ran: uyluk, but
rasterast: doğrudan
rastkêş: cetvel
rawestgeh: durak
rawestin: durmak
razan: uyumak
ref: 1. raf 2. kuş sürüsü
reşên herêmî: yöresel halkoyunu
reş: siyahı
reşandin: saçmak, serpmek
revandin: kaçınmak
revîn: kaçmak
rewş: 1. durum 2. parıltı
rez: üzüm bağı
rê: yol
rêvebir: yönetici
rêwî: yolcu
rêz: sıra
rêzik: kural
rihan: reyhan

rindik: güzel, hoş
riz: pirinç
rizgarkirin: kurtarmak
roja te bi xêr: hayırlı günler
rojane: günlük
rojawa: batı
rojbûn: doğumgünü
rojhilat: doğu
ronikirin: aydınlatma
rovî: tilki
rû: yüz
rûken: güleç, güler yüzlü
rûmetdayîn: değer vermek
rûn: yağ
rûniştek: oturak, sandalye
rûniştin: oturmak

S

sako: mont, kaban
sal: yıl
salname: takvim
sar: soğuk
sarinc: buzdolabı
savar: bulgur
sayî: açık hava
sazî: kurum, kuruluş
sazkirin: kurmak
sehkirin: işitmek
seqem: ayaz
ser: baş
ser çavan: başüstüne, hayhay
serdan: ziyaret
sereke: ana, temel, esas olan, başlıca
sererastkirin: düzeltmek
sergirtin: örtmek, kapamak
sergo: çöplük
serilêdan: başvurmak
serjimar: nüfus
serkeftî: başarılı
serkeftin: başarmak

serma: soğuk
sernav: başlık
serşok: banyo
seyda: imam
seyran: piknik
sēnî: tepsi
sêpê: sehpa
sêr: sihir
sêsem: salı
sêv: elma
sibat: şubat
sîr: 1. sır 2. soğuk rüzgar
sîrûd: marş
sîrûşt: doğa, tabiat
siwarbûn: binmek
siwarkirin: bindirmek
sî: gölge
sîng: göğüs
sîwan: şemsiye
sor: kırmızı
sosin: süsen çiçeği
spartek: ödev
spaskirin: teşekkür etmek
spî: beyaz
stêrk: yıldız
stran: şarkı, türkü
stûr: kalm

Ş

şabûn: eğlenmek
şagirt: öğrenci
şahî: eğlence
şandin: göndermek
şaneşîn: balkon
şano: tiyatro
şar: şehir
şaşî: yanlışlık
şaşik: sarık
şaşmayîn: şaşurmak
şayîk: pürüzsüz
şehkirin: taramak
şemalk: mum
şemî: cumartesi

şer: savaş, kavga
şermkirin: utanmak
şev: gece
şevbihêrk: akşam ziyareti
şeveq: sabahın ilk anları
şewat: yangın
şewk: olta
şewqe: şapka
şikestin: kırılmak
şilî: yağış
şimik: terlik
şivan: çoban
şixul: çalışma
şîn: mavi
şînayî: yeşillik, bitki
şîr: süt
şîv: akşam yemeği
şopgerî: izcilik
şûr: kılıç
şûştin: yıkama

T

tar: ahşap çember
taştê: kahvaltı
tav: güneş
tax: mahalle
taybetî: özellik
tebax: ağustos
tahl: kekremsi acı (badem acısı gibi)
têkili: ilişki
temaşekirin: izlemek
temaşevan: izleyici
temen: yaş, ömür
tenduristî: sağlık
teng: dar
tengezarbûn: rahatsız olmak
tenik: ince
tepê: elim sende oyunu
tev: hepsi, tamamı
tevger: hareket
tevlîbûn: katılmak

tevlîhev: karışık
text: tahta
teyrok: dolu yağışı
teytok: sek sek oyunu
têr: 1.tok 2.yeterince
têra xwe: doyasıya
tîlî: parmak
tîm: hep, daima
tîrî: üztüm
tîrkî: Türkçe
tîrş: ekşi
tîrşik: türlü yemeği
tîşt: eşya
tîm: takım
tîpên bêdeng: sessiz harfler
tîpên dengdêr: sesli harfler
tîpên girdek: büyük harfler
tîpên hûrdek: küçük harfler
tîpên nêzdeng: sesleri yakın olan harfler
tîr: 1.ok 2.sıvıdaki yoğunluk
tîrmeh: temmuz
to: yoğurt ve süt kaymağı
tov: tohum
tovavêtin: tohum atmak
tu bi xêr hatî: hoşgeldin
tune ye: yoktur
tû: dut
tûjkirin: sivriltmek
tûreşk: böğürtlen

Û

û: ve, ile

V

valahî: boşluk
vebijêrk: seçenek, şık
vêbûn: açılmak
veger: geri dönüş
vegotin: anlatmak
veguhêstin: nakletmek
vejîn: dirilmek

vekirin: açmak
vemirandin: söndürmek
veşartin: saklamak
veşartok: saklambaç
vexurek: içecek
vexwarin: içmek
vê carê: bu sefer
vêca: artık, bundan sonra
vikûvala: bomboş
vir: 1.bura 2.yalan

W

wanî: öyle
wate: anlam
wekî: gibi
wekî din: ayrıca
welat: vatan, yurt
werzîş: spor
wesayîf: taşıt
weşandin: 1.dökmek
2.yayınılamak
wêne: 1.resim 2.fotoğraf
wênegir: fotoğraf makinesi
wênesazî: ressamlık
wiha: böyle
wilo: öyle
winda: kayıp
wir: ora
wisa: öyle

X

xaçepirs: bulmaca
xal: 1.dayı 2.nokta
xaltî: teyze
xar: misket

xebatkar: çalışan
xeberoşk: kısa masal
xebitîn: çalışmak
xexxecok: gelincik çiçeği
xemgîn: üzgün
xemilandin: süslemek
xeml: süs
xew: uyku
xewar: uykucu
xewn: rüya
xeyal: hayal
xêzkirin: çizmek
xistin: koymak, sokmak
xizanî: fakirlik
xizm: akraba
xort: delikanlı
xurandin: kaşımak
xurek: yiyecek
xuyakirin: görünmek
xwarin: yemek
xwaringeh: lokanta
xwe: kendi
xwê: tuz
xwendekar: öğrenci
xwendin: okumak
xwendingeha navîn:
ortaokul
xwestin: istemek
xweş: güzel, hoş
xweşav: hoşaf
xweştam: tadı güzel
xweştir: daha güzel
xwezî: keşke
xwişk: kızkardeş
xwînşîrîn: sıcakkanlı

Y

yarani: dostluk
yari: şaka
yek bi yek: teker teker
yekem: birinci
yekşem: pazar günü

Z

zana: bilgili, bilgin
zanin: bilmek
zanist: bilim
zargotin: halk edebiyatı
zarok: çocuk
zava: damat
zebeş: karpuz
zela: berrak, duru
zend: el bileği
zengil: zil
zer: sarı
zerdalî: kayısı
zergul: sarı gül
zevî: tarla
zêr: altın
zêrîn: altından olan, altın
renkli
zik: karın
zîlam: adam
zimanê zikmakî: anadil
zirîn: anırma
zivistan: kış
ziwa: kuru
zîrek: zeki, çalışkan
zozan: yayla
zûbizû: çabucak
zûgotinok: tekerleme

BERSIVÊN XAÇEPIRSAN

UNÎTEYA 1.

1.Xwendingeh 2.Name 3.Hejmar 4.Tip
5.Şaşik 6.Kundir 7.Ker 8.Rovî 9.Şêr 10.Karik

UNÎTEYA 2.

1.Bejindirêj 2.Derman 3.Karker 4.Bejinkurt 5.Bijîşk 6.Bizin
7.Avahî 8.Hevaltî 9.Malbat 10. Xanî

UNÎTEYA 3.

1.Perwerdehî 2.Kişik 3.Beybûn 4.Mizgeft
5.Berxik 6.Nexweşxane 7.Kolan 8.Xwendingeh

UNÎTEYA 4.

1.Parza 2.Bijîşk 3.Birêkûpêk 4.Şeh 5.Alikariya bilez 6.Pêlav 7.Paqiji 8.Neynûkbir

UNÎTEYA 5.

1.Xurek 2.Pêxwarin 3.Spî 4.Şopgerî 5.Serûpê 6.Xwaringeh 7.Vexurek 8.Stêrk

UNÎTEYA 6.

1.Petîx 2.Behîvterk 3.Kaşûn 4.Baran 5.Ba 6.Berfemêr 7.Hejîr 8.Teyrok

UNÎTEYA 7.

1.Peyabor 2.Pir 3.Nexşe 4.Mizgeft 5.Peyker 6.Ajovan 7.Girav 8.Keleh

UNÎTEYA 8.

1.Fêrgeh 2.Xêzik 3.Genim 4.Lod 5.Cotkirin
6.Pirtûkxane 7.Lat 8.Kîso 9.Hesin 10.Kompîtur

UNÎTEYA 9.

1.Pêjgeh 2.Werziş 3.Kaxez 4.Ajel 5.Mast 6.Destnîşan 7.Wênegir 8.Xêzefilm

BERSIVÊN MAMIKAN

UNÎTEYA 1.

1.Mamoste 2.Tîpa “m”yê 3.Ziman

UNÎTEYA 3.

1.Çente 2.Pirtûk 3.Nivîn

UNÎTEYA 4.

1.Dev û Diran 2.Guh 3.Çav

UNÎTEYA 5.

1.Hêk 2.Pîvaz 3.Bacana reş 4.Hejîr 5.Hinar

UNÎTEYA 6.

1.Ba 2.Berf 3.Sal 4.Heft rojên hefteyê

UNÎTEYA 7.

1.Erebe 2.Trên 3.Nexşe 4.Rê

UNÎTEYA 8.

1.Kevjal 2.Gezik/melkes 3.Stêrk 4.Şevşevok 5.Kiso

UNÎTEYA 9.

1.Masî 2.Televîzyon 3.Dahol 4.Bilûr 5.Radyo

ÇAVKANÎ

Bingol, Abdulkadir, De Were Nekene!, Weşanxane J&J, İstanbul, 2013.

Gazî, Mustafa, Gurzek ji Zargotina Zarokan, Çapxaneyê Wezaretê Perwerdeyê, Hewlêr, 2006.

Subaşı, Kenan, Ji Bo Zarokan Di Fêrkirina Kurdî De Rola Mamikan, Zanîngeha Mardin Artukluyê Enstitûya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn, 2014.

<https://play.google.com/store/apps/details?id=com.osmanaslanoglu.obirweji> (02/08/2017)